

HELBESTNAME
ANTOLOJIYA HELBESTA KURDÎ
Li Sûrya
amadekirina
Mihemed Şexo

*Qaba pêşî*



Mihemedê Şêxo

# *DIYARÎ....*

Ji bo giyanê torevanê Hêja **Eliyê TEREMAXÎ**
Xwedanê Helbestên winda

**M. ŞÊXO**

**--------------------------**

## *PÊŞGOTIN*

Çima ev bizava nivîsandinê hate afirandin ?
Bi rastî berî çend salan me şên û hêzên xweyî rexneyî bi ser hev de lê dan , daku em xwe ji pirojek rexnyî re amade bikin .

Lê gelek zehmetî beramberî me derketin !

Piştî bêjinkirinekê me dît ku astenga herî giring ew e , ku hîna wêneyek giştî yan panorama helbestî , ji me ve belû ne bû ye .

Loma me girîng dît ku berî em bi piroja xwe de herin , divê em bi awakî tevayî li ser heyîn û rewşa helbestî rawestin .

Wiha , me berê xwe da mijara xwe , tevlû ku em dizanin ku wê karê me , ta tekûz bibe , gerekî têbîn û pêşniyarên xwênerên hêja be .

Vê nivîsandinê ti nav ji xwe re qedexe ne dîtine û , wê jî xiştika sor li bin ti navî ne daniye .

Wê qûnaxa piştî Cegerxwîn û Qedrî can ji xwe re kiriye armanc ,tevlû ku hin navên hevçerxî wan hembêz dike .

Ji bilê vê jî , çi helbestvanê ji vê bizavê bê par be , ev nagihêje wê wateyê ku ew ne helbestvane , lê ev divegere bizava me û , jê re dibe kêmasî , ji ber ew dizane ku kar bê kêmasî kêm in yan tune ne .

Wiha , armanca me ji vê bizavê ew e ku , em karibin wêneyeke rastgo ji heyîna helbestî re çê bikin .

Ev bizav bi hemî heyîn û danên helbestî serbilind e

Di dawî de , ew bi hêviye ku karibe bibe destpêk ji gaveke dî re , gaveke rexne yî û bikêr , da têkliyên xurt bi deqan re çê bike û , bi germî destên helbestvanan bihejî ne .

Xwendevanên hêja :

Her hûn ji pirsa rastgo û ciwan re bijîn

**Mihemed Şêxo**

**Qamişlo**
**1-12-1999**



# *ABBAS ISMAÎL*

Ew di sala 1938 an de , li gudê Sada navçeya Qamişlo ji dayîka xwe re bûye .

Mamosta Abbas di dema xwendin û karê mamostayî yê de . ( wî bîst salan mamostayî kirye ) gelek gotar , çîrok û halbestên şoreşgêrî dinvîsandin .

Lê wek ku ew dibêje . Di sala 1982 an de û piştî hatina Dr . Celîlê Celîl , ez bi xwe haybûm û min hişê xwe berda ser xwendina zimanê bav û kalan .

Pirtûkên wî ev in :

1 – Gula civatê - Çîrokên foloklorî yên civata kurdî - 1995
2 - Çîvanok û pêkenok – 1996
3 – Em beranê ber kêrê ne – kurte çîrok – 1998
4 – Xelata Mandêla – 1999
5 – Pêkenok û pendên dîna – li ber çapê ye .

Her kes dizane ku Mandêla yek ji azadîxwazên bi nav û deng e , wî pirtir ji - 25 - sala di zindanê de bûrandiye .

Tirka xwestibû xelata Ataturk bidnê , wî ew xelat negirt û got sedemê ne girtina min ev e : bila mirov hinekî bibe kurd .........

Ev hestê mirovaniyê hişt ku hezkirina Mandêla li gelê kurd xurtir bibe .

Mamosta Abbas bi riyek taybet , wek torevanekî kurd , dixwaze xelateke ji bihna gul û çîçekên kurdistanê diyarî vî mêrxsî bike :

## XELATA MANDÊLA

(( Banga dilan
Belsema derd û kulan
Hêviya bêhêzan
Awira çavên bindestan
Fenera mişext û maf xwestan
Kenê çavên bêkesan
Rivîna azadiyê
Gurr û bilind her gav û dan
Mandêla
Kirasê xizan û taziyan
Gepa merdal û birçiyan
Rondika berdîwar û sêwiyan
Mandêla
Gelo kî ye ? ji ku hatî ye ?
Peyambere yan nebî - ye
Mûsa ye ew ? yan isa yê behrewî ye
Bo miriyan jîndarî ye
Eger dê be ew zayî ye
Sed eferîn

Bo wê diya ew anî ye
Bo me kurdan bû berevan
Bû dadeyar bû xwedî ye
Ji ku hatî
Ji ku derketî
Ji kanî û solavên Hemrîn û Sîpan
Ji hinava cûdî diya kesan derketiye
Yan dêwên Hoto û Şanîdar
Yan Ehrîman ew aniye
Yan bahoza pêlên deryan
Ew danîne li ser milan
Ji başûrê tev kul û jan
Diyarî kirin
Bo me kurdan
Mandêla
Te firotin kinc û nîşan
Ne xizanî û nabî xizan
Xelata Turko te ne girtî
Tiwî leheng û qehreman
Te dersek da van serokan
Reş û spî rast û çepan
Serî danîn
Te li wan kirî barek giran
Bi çahbazî kete rêza
Wî Beşikçî û mîteran
Wek Qezafî
Weke baba yê mihrevan
Bû dozeyar bû lavekar
Bo me kurdan
Mandêla
Çi hêja ye bikim xelat

Ji te re bînim
Giranbuba bi pejirînim
Ezê rabim bilezînim
Komîtekê li darxînim
Berêz Baba jî Roma bînim
Leyla zana û Beşikçî
Bi kotekî ji zindanê wan derînim
Xandî û cewahirî ji tamarê wan vejînim
Li Amedê li şanişînê bicivînim
Masa Melek Ehmedê Merwanî
Li ber wan dînim
Gurzek kulîlk bi hevgihînim
Ji derdora goristana
Qadî û Berzanî û Şêx Seîd
Bicivînim
Ji herêma Helepçe û Xormal
Ji nav deviyan û diriyan
Çend keziyên gulî soran veçirînim
Çend şaxên zeytûna ji Efrînê bînim
Taca Mîtanî bi nexşînim
Eve xelata Kurdan
Li ber komîtê dînim
Eger ewan gotin ev hindike
Ezê herim dergehê xizna Kerkûkê
Û Kerminşahê Batmanê vekim
Kilêta wan bişikînim
Kinc û cilên Mandêla vegerînim
Qîzekê ji Deşta Mûşê
Yan Şehrezûrê bixemlînim
Mem û Zînê
Siyamend û Xecê

Ferhad û Şêrîn
Bikim xêlî bi dor xînim
Xanê çeng zêrîn û koma peyan
Bikim pêwan û zêrevan
Bi karwanê bûkê re bişînim
Ez dimînim bi kul û derdim ... tev birînim
Ezê derkevim ser kopê Cûdî
Vî karwanî bişopînim
Bi dengê bilûra şivanên Serheda
Bi zûrîna gurêd zozik
Bi awazê stranvanên Reha yê
Sê dengan ji bûka Mandêla re
Bilîlînim . )) .

-------------------------------------



***ALAN OSMAN***

Di helbesta bi navê ( Daxwaz ) de helbestvan ji xwefiroşan re dibêje , li xwe vegerin çiqasî hûn ji dijmin re alîkar bin , di dawî de

Wê dijmin we bavêje :
“Got guh bidin van daxwazan
Haybûn e ji bo keysbazan
Ta dost û keysbaz bizanin
Rêkê xebatê azanin

Daxwaza gel serxwebûn e
Otonomî tunebûne
Tifû li kurdên xwefiroş
Bin barê dijmin dane qoş

jêre noker û rêncberin
Hin jê bi çavan dinerin
Hin bi guhan dibhîzin
Hin di serê gel dilîzin

Tifû l’ tajiyê nêçîrê
Xwarina goşt nayê bîrê
Dijmin goşt dibrêj e
Lê ew hestiyan dikevêj e”

Helbastvan berê xwe dide nexweşiyên gel û tevgera wê ya rizgarîxwaz ji ber ew dibîne , ku çi kesê di nîşanan de raman dibe armanca xwe winda dike . Ew dibin navê ( **Kursî**) de dibêje :

(( Kursîya xewn û metala
Hêvîya her qafên vala
Tovê nezan yê ku heye
ji destê rûnişt yê teye

Çar lingên te pir asê ne
ji mermer û elmasê ne

Tu çiqa spehî çelenge
Rengê te hema xweş renge

Bi mejî tu beyaz bûye
Bi xwînê nexş û saz bûye
Mirin ji te re ey kursî
Ma qey tu ji xwe na pirsî

Her dem li ser te pevçûn e
Kuştin û xeyd û dexs bûn e
Kursîyek bi nav û deng e
Li ser te tim şer û ceng e
Her kes divêt te bigire
Aza ji bo te bimire .)) .

Helbesta kêşsaz ( kilasîk ) li cem gelek helbestvanan , tucarî nikarîbû xwe bi mercên helbestî bixemilîne . niha emê helbesta ( **Ramana serê kurd** ) bixwînin , bê dudilî mirov dikare pêyvên wê li pey hev rêz bike wek gotareke netewî , kîtên malikan
tenê nîşanên helbestî ne :
“ Na ; em ne bindestin
Aza û serbestin

Ji ber ku em hene
Ji xwe em ewlene

Ramana ma heye
Ramana serbixwe ye

Ji kul û derdaye

Ji serê kurdaye

Îro xwe jîrdikin
Xwe rewşenbîr dikin

Dîroka xwe tînin
Em kûr kûr dixwînin

Em xwe kone dikin
Em xwe zane dikin

Zanînê hildigrin
Seriyan dadigrin

Xwe xwedî soz dikin
Mafên xwe doz dikin

Roja baweriyê ,
Roja hevkariyê

Ew hevgirtina xurt
Serpêhatina kurd”

Lê Mamosta Alan helbesta evînî jî , nivîsiye , em ê helbesta ( **Bihişta Durust** ) helbijêrin :

(( Nazikê şox û şepalê
Rû bi şewqê wek şemalê

Birû yarê dû kevanin
Çavên te du nêçîrvanin

Tîrên daxan j’ wan diweşin

Dilê min de ew dikişin

Bi tîna te min dibrijin
Hêdî hêdî min dikujin

Te d’ bînim şahîya cejnê
Çar reng berdane ser bejnê

Ser sale îro nûroze
seyran e şahî w pîroz e

Tu tena tena dimeş e
Alan li ser te bê hiş e

Bi dîtina te yar dilgeş e
Bê mey îro serxweş e

Hêviyek min ji te heye
Xelata nûroza me ye

Mezek ji peyala deve
Hilmek ji bexçê teve

Axîn ji civatên vala
Hawên bapîran û kala

Bihişt mirî qet nabînin
Bihişt ji zendîyar dimînin

Mirin ji bo her bihiştê
Mirin bi saxî negehiştê )) .



# *ARŞEVÊ OSKAN*

Helbestvan Arşevê Oskan li gundê Bîrkenêşê ( herêma Dirbêsiyê ) sala 1967 an hatiye jiyanê . Ew wek kurdekî dilsoz tim dixwaze ku nivîsoka wî di ber berjewendiyên gel de bixebite , loma wî jî , nemerdî ne kiriye ku hînî zimanê xwe bibe û pirtûkên seydayê Ceger-xwîn bixwîne .

Bi rastî , yek ji wan sedemên hişt ku em seydayê Ceger – xwîn dûrkin ji vê pirtûkê ew pirs bû : Gelo ev hebestvanên piştî cegerxwîn hatin û helbsta kêşsaz ( yan kîtan ) hûnandin karîbûn wê devera ku ew gihiştibûyê derbas bikin , yan hîna ew di bin baskên wî de ne ?

Ez behwer im wê bersiv , pîştî em vê pirtûkê bixwînin ronî bibe .

Di helbesta xwe de ya bi navê ( **Dîse kovan nûkirin** ) Arşev dibêje :

(( Sed car dibêm birakujî xizmeta xapê dijmine
Sed car dibêm ev xwîna sor qelenê yara mezine
Çiman dirjî bi destê kurd ya mir rexne ne gazine

Bersiva vê bide min ka çima dirjînin vê xwînê ?

Min divê dermankî peydakin ne ku kûr bikin birinê
Eger kêferatek hebe têde pêşveçûna jînê !

Şev û roj qîr û haware ji ber zora va ketxwaran
Çiman îro gihan dozê dûrketin j’xapên neyaran
M’divê bijin bi biratî nedin hevdû daran

Bimre şerê birakujî çavê li wê xwînê
Destan bidin ji dil û can dîwar deynin li ber kînê
Dijmin nabe dostê merov ji vir bighê ta bi çînê

Kevir sor bûye ji xwîna şehîd û pakrewanên kurd
Hatiye avdan hemû dar ji xwîna mêrxasan û merd
Tev şar û gundên kurdistan dayik mane bi kul û derd

Hêviya dilê pakrewan wê milet soz bidî dozê
Li ser gora wî peydakin hevgirtin û destê sozê
Sûndê bixwin bi axa wî gûrbikin arê newrozê

Lîstik û xapên neyaran vane milet berdane hev
Bi çek û rext û tivingê dijî hevin bi roj û şev
Ne aferîn li vî karî dev li ber dijmin kete hev

Dîsa dibêm bi çi rengî em ê bêjin dost yaran
Wêran dikîn gund û bajar axîn ji destê neyaran
Em hev dikujin dîsa bi hev re dikin van karan

Kurdê welatperwer û jîr divê mejî ji pala bî
Bi bîr û bawerî bî her li ber dijmin ne kola bî
Tu jî wek her merovan bî ne kuştiyê li çola bî

Her nexweşîk derman heye em jî divê derman naskin
Ger em nedin hev milê xwe em her bê pê û bê baskin
Arşev feryade şev û roj welat ji derdan xelaskin ))

Pir helbestvan li hember gula sor rawstiyane û pê re axifîne , hinan ew nîşana berxwedanê dîtiye û hinan ew kirine destpêka evînê , lê Arşev xwe ji , celebê pêşî dibîne :

“ Gula sor “

(( Jir engê xwîna birînê
Nîşana hildan û jînê
Dibarîne ji xwe xwînê
Te gula sor ezê bînkim
Bihna ceng û kêferatê
Ji reh û kokên te hatê
Gula min nayê xebatê

Te gula sor ezê bînkim
Bîhnek dirêj j’te bîstînim
Li qada kurd te biçînim
Rojên dijwar te bibînim
Te gula sor ezê bînkim
Li xebatkaran diyar kim
Pêre awazan hişyarkim
Li her beyaran lê karkim
Te gula sor ezê bînkim
Li sîpanan te şabaşim
Li xelatan car û kaşim
Ava teye xwîna laşim
Te gula sor ezê bînkim
Ezê bînkim ezê dînkim
Feryad ji dil ezê jînkim
Xwe bi Mem kim gul bi Zînkim

Te gula sor ezê bînkim
Rengê xwînê û şoreşim
Rengê arê şeva reşim
Didim bihna gula geşim
Te gula sor ezê bînkim )) .

Li vê dawiyê Arşev dest bi helbesta serbest kiriye : wek nimûne me xwest em hinek durişmê vê helbestê jî ,binasin ji ber vê jî , me helbesta wî ( Newroz ) helbijartiye :

(( Cejne
Zirave bejne
Jî yara min
Silavek ji lêva sor – gulî
Pîrozbe
dîyare min .....
Maçek şêrîn
Pêre kenî û gote min
Are ji jilde
Bûye baweşînek
Li kulîlka newroz
Pîroz dike

* * *

Cejna xebat
Kêferat
Û azadîyê
Cejna .....
Kenînên lêvan
Û hêvîya dilê meravan
Rîhan û çîçek
Sorgul û sêvan
Cejna

Yara birîndar
Û
Dayîka hêsirên xwînê
Xwedana qurbana
Û cotkara tovê jînê....
Cejna .....
Pakrewanê bendewar ..... !
*  *  *
Silav li ser silavê
Li ......
Çavên bê xew û ziwa
Li ........
Ava delavê
Û pêlên avê
Di her gavê
Dişînin û dîyarim
Silavên hejaran
Li .......
Lêvên birçî
Û sêwîyên ber dîwaran
Li ......
Hêvîyêd bendewaran
Li ......
Latê
Bahozê
Û dozê
Rengê kesera kînê
Li xwîna birînê
Arê dilê zînê
Omîda jîn û hebûnê
Li .....

kawa hostayê mezin
Mêrxasê çîroka ciwan
Gûrvanê agirêd zinaran
      *       *       *
Roka azadiyê
Penca bi hêz davêje
Hiltîne tariya şevên reş
Sitema kevn dimêje
Qadê şîndike 6 merovan dilke rugeş
***R – A***
Çîyan didî alî
Dîwaran davêje
Reşen didî bajar û şav
Dûman û dizî
          Dimre û dirzî
Namîne êvar
Ro tê hilat
Cîhan serxweş dibe
***R – A***
Şaxê jîyana min bilind dike
Û sitema neyaran bê çar dike
          *          *          *
Na mirin ......
Roj bi roj jîn têm
Bîna gula min vedide
Kevoka min namîrînin
          Çîqas niçrvan bin
          Li doza min şiyarbin
Wê poşman û ziwabin
Min .......
Xwîn û can kirîye qurban

Ji boyî ciwanîyê
Min çandîye tovêd xwe
Di rûpelê dîrokê de
        Bi hêz dibim
        Ber jor diçim
Di qelêşim çîyayên bilind
Rêça xwe dibînim
Dikevim zozanan
dûr dibim ji rivs û gumanan
Hêvîyêd min jîn tên
Her jî tên hêvîyêd min....
Narawestim
Ji bo çi sistim
Bawer û jîrim
Li dozê mîrim
        Divê ku bimrim
        Ji boyî nemrim
Bidim xwîna dil
        Şîn bibê sorgul
        Çîçek û sinbil
Ro bê hilat
Nû bibe newroz ! )) .

Wiha , helbesta serbest jî , li cem Arşev , nikare xwe ji bandora helbesta kêşsaz azad bike nemaze , ji aliyê hermonî û kêmwêneyî ve .



# *AWAZÊ KALO ..*

Sala 1969 an li gundê Şîyê Çavên xwe .li rûyê dinê vekirin .

Sala 1994 an li zanîngeha Helebê Fakulta bijîşkîyê kutakir û niha li şîyê wek bijîşk kar dike .

Di destpêka xwe de bi zimanê Erebî nivîsand , lê zû - zû fêrî xwendin û nivîsandina kurdî bû û pê nivîsund . Berhemên wî di govarên mîna Pirs . Zanîn û Aso hatine weşandin û niha berhevokek wî bi navê (( toz )) dibin çapê de ye ...

Helbesta Awaz dikare çirûska herî dijwar hembêzke û heyîna helbestî bi vîneke xurt bighîne keçîna pel , mejî û gerdûnê .

Ew bi vê rastiya xwe re tevlî xweşiya evînê dibe û dibêje .

## *NÛ GÎ HAYÊ*

(( Beleteyê keçanî yê
Nuh li te xûyakirî
Mînak :
Memikên te
Di nav veşarên kirasan de

Eşkere
Navê xwe dixwînin
Mînak :
Lêvên te
Di bîra gangilîkan de
Dîroka rengê xwe
Dinivsînin
Mînak :
Gava ku
Ez te dibînim
Çavên xwe misdidim
Û du caran
Xazîyê dadiqirtînim )).

Helbestvan carna li dûv awaza bûyera germ û nêzî dil diçe wekî vê helbesta bi wêneyên hêja xemilandî :

**?**

(( Pirsa birçî şîyar bû
Ji gotinên xav
Ji xewnên meyî
Çavê tivinga xwe
Kilda .....
Ber bang
Di gavên xwe werda ..
Evîna xwe vemalt
Û berê xwe da ...
Sîngê çîyan
Da ku ramûse
Bersiva xwe ya ...
Winda !!...)).

Ew dizane ku helbest û hemî rengê nivîsînê berprisyariyeke , divabû mirov xwe jê re amade bike lê helbestvan li gor vê yekê ye û şîreta wî kalî ji bîr nake :

**PEND**

(( Kalekî got :
Ger te xwest
Helbestek kurdî binivîsê
Bila
Bejin bilind be
Wek çîyayên kurdistanê
Bila
Di dilê wê de lûs be
Wek germî ya jîyanê
Helbestvano ....:
Bila
Wek xwîna cangorîyên wê biçirîsê
Yan yî
Pênûsê xwe bişkîne
Kes ...
Te ...
Nabihîsê ....!! )) .

Helbestvan pencerekê di jiyanê de vedike û ji birîna xwe yî bi xwîn razekê ji yarê re eşkere dike

**PENCER**

(( Birîna
Ku te sîngê mala min de
Vekirî hiştî
Ta niha
Nirînên min

Dilop ....
Dilop .....
Jê diherrikin
Li ser rêya vegera te ...
Dibin gol !!     )) .

----------------------------------------



## *BÊ BIHAR*

Bêbihar , Yûsifê Elî ye , Yûsifê Berazî tê nasîn . Ew di sala 1931 ê de li gundê Tilcircê hatiye dinê .

Di despêka jiyana xwe de ew hînî sazê û zimanê Tirkî bûye .

Di sala 1947 an de mala wî çûbû Minbicê , piştre bi heft salan ; dîse , mala xwe barkirin û hatine Serê Kaniyê .

Di sala 1956 an de naskirina wî bi Cegerxwîn û Reşîdê Kurd re çêbûye û li ser destê wan fêrî Zimanê Kurdî bûye .

Ji ber ew bûbû endamekî ( partî ) ew di sala 1966 an de ketibû zindanê de . Girtina wî dubare bûye û pir eşkence dîtiye , lê wî tim li ber xwe daye û helbesta xwe yî hêja ( Helebest û zindan ) di zindanê de çêkiriye . Bi rastî , Bêbihar xwedan hestekî germ tê diyarkirin , wî dev ji welatê bav û bapîrên xwe bernedida û hertim xwe di rajeya wî de didît . Nemirê hunera kurdî , Mihemed Şêxo , çend helbestên Bêbihar sitirandin û gel bi wan hişyarkir :

**Hebs û Zindan**

(( Hebs û Zindan kûr û tarî xewa min nayê
Ji eşq û evîna gulê , ketme belayê
Gula min vebû û bîn da , li serê çiyayê
Min got gula min were vir , gul bê dem nayê

Gula min kesk û sor , gula min zere
Hebs û zindan da rêzî yam gul bê xebere
Gula min bindeste , bi kul û kesere
Dest ji gulê bernadim can bidim sere.
Gula min rengîne , gula min geşe
Gul bi xelkê tale , bi min pir xweşe
Dinya li ser min rûne dem li min reşe
Dest ji gulê bernadim ku xwîn bimeşe

Hebs û zendan ku rû tarî têda dinalim
Ji eşq û evîna gulê , gelek bê halim
Gula min bindeste , pir dem û salin
Kî bistînê bi xwînê , vê hevalin
Gula min tu xeyidî min guneh çi kir
Te ji min re çi got , min bi can û dil kir,

Min mal û can da ser , dîsa hindik kir
Riya min gelek dûr bû , va eşqê kin kir )) .

Di helbesta ( **karkerên kurd** ) de . helbestvan li êş û derdên miletê kurd xwedî derdikeve , gotinên wî ravekirî û rût,ramanên wî dighînin ta ev tişt dihêle ku yeke weke vê helbesta dirêj ti form tê de peyda nebe , çima ? ji ber amanca wî şiyarkirina gel e !! tevlû vêna , helbest çênabe bibe banga partiyekê û çênabe hebûna wê li ser terazû û kîşê tenê be :

(( Karkerên kurd hûn zane bin.
Çima hûn maf wenda ne
Di welat de hûn nexweşin
Tev bi derd û bela ne
Axa û beg tev dijminin ,
Simsar şêx û mela ne
Hezar sal bûn jana zirav
Derdê we tev ji wa ne
Îro partî we rêbere
Jîrin xwe bidin dorê
Tolê wan mêrxasan hemyan
Rakin bi ceng û zarê
Pîsan li nav xwe mehêlin
Dijmin dimrê li dorê
Segên har li ser rê hebin
Merov bi zor bi borê .)) .

Li gor daxwaz û nêrînên kesekî partîzan û welatperwer, Bêbihar xwestiye di pirtûka xwe de ( ya bi navê Zindan – sala 1988 çap bûyê ) li ser hemî warên jiyana kurdan raweste û bipirse , çima gelo em nezanin ? ji ber wê wî şerê şêx û melan , beg û axan kiriye , û xwestiye ku jina kurd ji akam û gerdîşên reş xwe rizgar bike weke ku di helbesta ( keça kurd ) de hatiye , lê gava ew li ser rastiya di

hindirê xwe de dipeyivî,wî pir guh dida avahiya helbestî hinga bi awazek tenik ji evîna welêt re dîlana xweşiyê girê dida wek ku di
Helbesta ( **şîrîn** ) de xuyaye :

(( Şîrîn tu cînara minî
Armanc û nîşana minî
Rohnî û rewşana minî
Bax û kulistana minî )) .

Carna jî,jiyana Bêbihar bê sûde bû , ta wî pirs dikir ( çi bikim ji can ) yan di helbesteke dî de xwe didît wek yekî derbider ( Ez bûm Ferar ) û ( koçê min barkir ) , lê ev xilmaşî dom nake û ew hêza xwe dizane û dibêje çiqas bar giran be divê em rajinê , wek di helbesta ( pismamo ) û **( rabin ji xewê** ) de hatiye .

Weke tê xuyanî ku Bêbihar pir guh daye awaz û hermûniya helbestê ta evîndarê welat Mihemed Şêxo ew kiribû wek jêderê gotinan , çimkî bi ser bedewiya helbestên wî de mijarên wî jî pir bûn ta mirov dikare bibêje ku wî tabloya jiyana kurdî bi tîpên zêrîn neqişandiye .

(( Rabin ji xewê çavê raketî
Ev dil şewitî agir vêketî
Şêrîna min çû , ev dil pêketî
Lê çibkim îro ji dest derketî
Ji destê min xwînmij neyare
Ez mam hejar û mam ber dîware
Ez bandikim min qîr û heware
Kî ser hilînê ka kî şiyare
Şêrîna min çû ev dil birîne
Ez bandikim bi , gazî qêrîne
Ka dektorê zan derman lê dîne

Bigrê bi destan , ji min ra bîne
Li mi zivistan ka buharê min
Şîrîna min ket , dest neyarê min
Li min qutkirin , ziman zarê min
Wan xopankirin , şûn û warê min
Çi dem bê ser min , buharê dilan
Bên guhê min deng ji van bilbilan
Ez wî hilgirim , li ser herd milan
Ez pê derman kim , derdan û kulan )) .
--------------------------------------



## *DÊRSIM MEMO*

Di sala 1946 a li gundekî kurdistanê , hatiye dinê , ji zû de sêwî dimîne . li ba xwişka mezin ew gewre dibe , her weha ji zû de jî ( DÊRSIM MEMO ) dest avêtiye Qelem û Firçê , çîrok nivîsîne tablo ( Lewhe ) vehandine . lê berê wî bêtir ber bi helbestan çûye , ji bîst û pênc salan bêtir ji helbestnivîsînê , ( DÊRSIM MEMO ) , neh berevokên destnivîs amade kirine – bi EREBÎ jî ne kêmtirî wan amade kirine , berhemek tenê ji yên Erebî di sala 1996

an de belavkirye , bi navê ( MELHAT EL TECEDDUD WEL EYYAM ) .

- Xwendina destpêkê , û dibistanî li bajarê HELEBÊ tewaw dike ,
- Di sala 1972 an de , bi mal û jin dibe .
- Sala 1973 an , dibe karmend li Zanîngeha Helebê .
- Sala 1977an , di ber kar û barên rojane re dîsa li xwendinê vedigere û bi serbestî xelata debîristanî ( beşê Edebî ) distîne .
- Sala 1988 an xwendina zanîngehî , li fakûlta toreya Erebî ya ZANÎNGEHA Helebê tamam dike û xelata wê jî distîne .

Bi çalakî pişkdarî jiyana EDEBÎ û ÇANDÎ ( KURDÎ _- EREBÎ ) dike ....

Berhemên wîyî bi kurdî destnivîs in û dibin van navan de ne :

1 - Êvarê te çikir 2 – Bê evîn û yar 3 – Dîlbera min 4 – Zanav 5 - Dîrok 6 – Pêşmerge 7 - Xanima ronahiyê 8 – Raperîn 9 – Govend .

Helbestên Mamoste Dêrsim Memo Kurt in , lê her kîtek helbestî parçek ji jiyanê hembêz dike . ev jî , dide xuyanî ku helbestvan pir bi heyînê mijûl dibe . Ma gelo helbestvan ne ew e nêçîrvanê kêlîkên xweşiyê ye ?

- Lê xweşî dûr in
- Hest her dûrbûnê dibire
- Ka em binêrin bê Dêrsim çi dibêje :

## ÇILPIKÊN PAYÎZÊ

(( PENABER :

Cîhan tev de
Di dilê min hil tê ,
Tê de cî war dibê ,
Gelo ..çima ez
Cî gorekê
- Li ser kevî . rêkekê –
Bo xwe nabînim .... ?

GULISTAN :

Min – ji wê – pirskir :
Çend kevok gerekin ,
Da ku gulistanekê çêkin ...?
Deng jê nehat ..
Bersiv neda ..
Lê hema çûk firiyan ..
Û di daristanêd porê wê de ..
Pînikêd xwe çêkirin ...

ARAMÎ

Bahozê xwe li rûyê min xist ..
Min jî porê wê girt ..
Dagirî
Hêstir barandin ...
Û aram û bêdeng ..
Di cî de rûnişt .....

OLPEREST :

Govdê laleşe
Kevirê reşe ...
Ez jî olperestim ...

Sofî û dergevanê te me ...
( Ta ûs ) perestim ...

TÎRIKIN :

Ez helbestên xwe
- Ji dil û can -
Jê re dixwînim ..
Ew jî - hêviyên xwe – dicû ..
Û tîrikên kenê xwe
Bi dilekî sar û aram ..
Li min dibarîne ...

BERSIV :

Wî - jî - pirskir :
Tu hej min dikî ..?
Wê bersiv neda . ,
Berken bû ..
Û mîna kevokek sipî . şîn
Li ser sîngê wî venîşt
Û lûs bû ...

PAQIJÎ :

Ez – rojên xwe –
Bi sed salan ..
Di avê de dihêlin ...
Herdem dîşom ,
Paqij dikim ...
Belkîm – mîna porê te –
Qîl reş bibin ...

RAPERÎN :

Memikên xwe
Ji nav teliyên min
Qopirandin ...
Û berve lêvên min
        Hildan ..
Gelo ......
Kî ye ew ..?

PELÊN PAYÎZÊ :
Em mîna pelên payîzê ne..
        Zer . çelmisîne ..
Werg ji şaxan diweşin .....
Deng ji me nayê
Eger – kesek –pêl me nene ..
Yan rêwî sîwarek ..,
Di ser mere nemeşe ...

FÎXAN :
Dema – wî maçên xwe –
Bi ser lêvan de barandin ..
Wê – memikên xwe –
ji paşelan derxistin ..
Berve jor hildan ..
Fîxan û lava kir :
Xuda ..
Her dem maç bibarin ...

PETROL PEREST :
Li qada me ya tijî petrol
Her ku av dibe gol . ,
Asîman dibe dahol .
Xudê – bi xwe –

li jorî me
Dibe ( Qereqol ) ......

MIZGEVT :
Eger – ez –
Di mizgefta çavên te da
Rûniştim ..
Ji min mexweze ku
Ku dengekim
Ma tu nizanî ku
Dengkirin
Nimêjan pûç dike .. ?

-------------------------------------



## *DILAWERÊ ZENGÎ*

Helbestvanê me Dilawerê Zengî li Amûdê sala 1961 ê çêbûye , li ser destên seydayê Tîrêj hînî nivîsandina helbestê bûye , lê dema ew çûye Şamê wî zimanê kurdî li cem Osman Sebrî xweşik naskiriye .
Berhmên wî :
1 – Pêdarî - helbest – 1985

2 – Ji evîna çirayên kevin – helbest – 1991 –Rehman Mizûrî wevgerandin : Dilawer Zengî
3 – Rêzimana kurdî ya Mîr Celadet Bedir – xan û R . lîsko – bi zimanê Erebî
4 – Derbarî mijara kurd – Mîr Celadet – wergerandina Dilawer Zengî
5 - Şerefnameya menzûm – Cegerxwîn - ravekirin û werguhêr : Dilawer Zengî . Dilawerê Zengî di gelek kovar û rojnama de nivîsiye ji wan
Birayêtî - Midya guneş - Niştiman – Armanc – Pirs – Gurzek Gul – Gelawêj – Gulana Erebî - Xebat – Hiwar .

Birastî , Dilawer tevî gelek bizavên toreyî dibe û rola wî di çapkirin û belavkirina toreya kurdî de xurt û balkêş e . Helbestvan jiyaneke xweş , bê şer û kuştin dixwaze , her û her ew ala aştiyê biilind dike :

(( Jîn û Aştî

Min û jînê me dest da hev
Bi bext û peyman û sozê
Ji bo aştî bi dil nermî ,
Bi hev re em bikin dozê

* * *

Min dest digirt wê ez berdam ,
Bi xweşî ew nebû heval
Ev daxwaza jîna bedew ,
Wê bighêzim b'bombê napal

* * *

Dîlanek mezin li darxim ,
Bi aton û bi çekberî
Balafir û top û bombe ,
Cîhan bibhîze vî şerî

* * *

Bê deng û top jînê ne kir
Qelen xwestî ji min xwîne
Gelek caran me himbêz kir
Jîna bê yar , qet ne jîn e
* * *
Dilovanim aştîxwazim ,
Ne mêr kujim , te ez kuştim
Çav mehderî , ne bûn xwedî
Jîna bê jîn te ez hiştim
* * *
Mafxwaz bi şer tê me jînê
Bi kolîtî qet min nekir
Li ser soz û peymana xwe ,
Doza kuştinê min ne kir ...... )) .

Lê dema mafên gel perçiqî bin û dijmin çavsoriyê li wî û gelê wî bike , hinga ew maf dide xwe û gelê xwe ku şer pêxin û venemrênin , çimkî di ber jiyanek rastgo de ye :

(( Pêdar
Pêdar im ez pêdar im
Tev pêt û tev bi ar im
Roja tême meydanê
Birûskan tînim xwarê
* * *
Ev agirê serxwebûn
Ji bo azadî hebûn
Li serê koh û çiyan
Rohî didim zinarê
* * *
Agirekî bi reh e
Berê wî pir fireh e
Va bûye bîst û çar sal

Dikim qîr û hawarê

*    *    *

Êşa wî pir giran e
Şewata wî derman e
Agir vêxim bi agir
Neyar ez bînim xwarê
Her setem û zînat bê
Tim kuştin û şewat bê
Li berxwedan pêdar im
Can gorî me ez yarê )) .

Rast e , Dilawerê Zengî wek helbestvanekî kilasî helbesta xwe dihûne , lê mirov dipelîne ku ew gerdûnê helbestî bi jiyanek nû dixemlîne , û dema ew li wêneya levhatî bigere ew dibîne , guh bidin vê parçehelbsta wî :

(( Ey bira tu binêre
Şax û gulên li darê
Serî hildan ber bi jor
Poşkoj vebûn ji xarê
Li be roja zêr rişand
Pel zêr eniya yarê
Bisk û kezî tev berdan
Zilfên li ser guherê
Li ber bayê sibayê
Sema tê guliyê darê
Por li deşt û geliya
Li ber bayê sibayê
Sema tê guliyê darê
Por li deşt û geliya
Çîn çîna zilfê yarê
Hebrî bi ser xwe wer kir
Ji kulîlkên hinarê

Bejin kada mirovan
Wêne ji geh nîgarê
Dest û mil ezman hildan
Hevpêçana ser barê )) .

Niha mamosta Dilawer li Şamê dimîne , xuya ye ku wî temenê xwe ji bo rajeya pirsa kurdî re kiriye qurban .....

---------------------------------------



## *DILDARÊ MÎDÎ*

Navê wî Mihemedê Ehmed e . di sala 1963 an de li gundê ( Elwankê ) hatiye jiyanê , Niha ew li bajarê Qamişlo dirûne , Ji sala 1983 yan ve wî dest bi nivîsînê kiriye , pirtûka wî ya bi navê ( Kevana Rêş ) di sala 1998 an de hatiye çapkirin

Bi rastî her hevalê Dildar dizane ku ew hertim dev li ken e û ticarî
giriftariyê riya xwe tê re ne dîtiye , lê dema mirov helbestên wî dixwîne hesanî mirov têne der ku toşeyeke pir mezin di

canê xwe de diveşêre . Ango, wî xwestiye ku singa xwe bide ber bayê reş û hêviyên her welatiyên xwe biparêze .
Ew di helbesta ( **Birîn** ) ê de vî tiştî eşkere dike :
(( Birîna min ji ber ez kûr dinalim
Evê janê dikuştim pîr û kal im
Bi ser hevde guvaşt im ez bê halim
Ziwa nabê ji vê xwînê bi carek
* * *
Birîna min gelek têşê ji janê
Dikim qêrîn şev û rojê tu zanê
Evîndarê welat im ji ( Îmanê )
Ji bo min tu ne be qet dil giranek
* * *
Birîn çêbûye çend salin di dil da
Ji kevanan çi tîr avêt li dil da
Kezeb stlî bi ser birîna kul da
Di nav dil min ketî îro çi arek
Ji ber birîna xwe îro çi gêjim
Ku her têşê pêlên xwînê dirêjim
Dinalim ez ser halê xwe dilbêjim
Li dor min qet nemane dost û yarek
* * *
Birîna min tu bes min bi êşîne
Xeman tu bes di gel min bicivîne
Te ez kuştim hinav tev bûne xwîne
Ji ber tim dinalê mal xerabek )) .
* * *

Herwekî sedemê her tiştî heye , sedemê derdê helbestvan jî heye ew jî evîna wi ye , yara wî hatiye revandin , destreşan lepûşkên xwe di hêviyên wî de çikandine , ew maye bê biryar , lê ji ber ku ew bi heyîna

xwe re dilsoz e riya kêferat û berxwedanê li pêşiya wî divebe , li vê tabloya jiyana wî ya bi navê ( **Binêrin** ) meyzekin :

(( Ez çime ez divê jînê ?
Ev çiye jana civînê
Dil tijî bû ji vê xwînê
Ne dîn im ez ne jî har im
Can û ceger gelek jar e
Hemî kul û xem û ar e
Jana evînê dijwar e
Van xem û derdan ez xwarim
Can û ceger hemê kuşt in
Dil û ceger hemî kuşt in
Ruh di canê min ne hiştin
Berxim di nav gurê har im
Ji ber jana evîna dil
Dinalî dil ji eş û kul
Ta kû ji xwînê bûye şil
Ji zûde ez evîndar im
Evîndarê welat im ez
Karkerê rojhilat im ez
Ez Dicla û Ferat im ez
Kelemê çavê neyarim
Baran û birûsk û ba me
Ristvan im kurd im hêja me
Çakûçê destê kawa me
Sirtim pola me dijwar im
Ez pîzot û ar û pêt im
Nalîna Zab û Ferêt im
E bervedêrê welêt im
Kurd im , mîdî me dil dar im ))

Wiha , helbestvan tim serê xwe bi çiya û çemên welat bilind dike , jiyana xwe bi ax û ava wî ve girê dide , ew dibîne ku surişta kurdistanê pir bi xeml û xêz e û ji ber vê bedewiya han , ew têkoşînê pêwist dibîne û sembolê wê dijmêre , Mezlûm Doxan , Leyla Qasim , Rewşen Bedir-xan , Osman sebrî ....

Ew di helbesta xwe de,ya bi navê **( Gazinek ji çemê Dicla** ) dibêje :

(( Ho ... ho çemê dicla bi him him bo çi dinalî ?
Havîn û zivistanê bi ser min de dikalî
Xwîna şehîdên min bi pêlên xwer tu dimalî
Gilî û gazin dikim mi d'go tu hevalî

* * *

Lê îro te xapandin bi pîlan daxwazê min
Tu har dikê dijwar dikê pêlan li bazê min
Tu ser dikê bê sir dikê saz û awazê min
Tu kurt û sist û jar dikê qêrîn û gazê min
Ho ... ho çemê Dicla qenciyên min te jibîr kir
Sed car çika bû min bi hêsran pêlê te tîr kir
Sed carî sist bû min bi hêsran pêlê te jîr kir
Xwestin te bikujin mi didîrokê tu pîr kir

* * *

Ma qey te ji bîrkir min gorî te kir tac û text ?
Ma qey tu nizanê mi girêdaye çek û rext
Çiya bandikê va li min teng bûye dem û wext
Bes tu jî wek min bimîne kurd bê bextê bê bext )) .

* * *

Ji me ve hate xuyanî ku helbestvan xwestiye li ser riya Cegerxwîn şêwazekî hesan bi kar bîne da karibe danasînekê bi gel re çêbike , tevlû ku ev dihêle ku wêneyên hinerî .

Kêm bibin , ji ber vê jî em bi hêvîne ku helbesta kurdî ya Kîtan bi kar tîne wê di pêşerojê de karibe vê kêmasiyê derbas bike .

-------------------------------------



## ***DIYA CIWAN***

Diya Ciwan,di sala 1953 an de li gundekî Cizîrê ji malbateke olperest re bû ye , piştî temenê wê bûye sêzdeh salî ew bûye xanima kurapê xwe û ji sala 1975 an ve ew li şamê dirûne , çar kur û du keçên wê hene . Ew dibêje ku peyama yekemîn ji pîrekê re , perwerdekirina zaroka ye , ji ber zarok hêviya milet û pêşerojê ne .

Diya ciwan , tim ciyê xwe di govar rojname û mehrecanên helbestî de dibîne .

Berevoka wêyî helbestî ya bi navê ( Pêlek ji deryayê kovanên min ) di sala 1992 an de belav kiriye .

(( **Bazbend** )) hin çîrokên wê ne , wergerandina Şêx Tewfîq Huseynî ye 1999 . Berevokek wê dibin çapê de ye , navê wê ( Hêstirên ziwa ) ye .

Diya Ciwan dilsoza kurdîtiya xwe ye , hestê dilpakiyê li her cih û demî hevalpişkê wê ye , her tim ew xemhilgira

welatê xwe ye û jiyanek serfiraz jê re dixwaze , ji ber vê yekê ew dibin navê ( **xwe** ) de dibêje :

(( Çendî ji xewê şiyar dibim .....
Dîsa xwe radizînim ....
Di xewê de ......
Xewnan dibînim ....
Di xewnan de ....
Azadiyê dibênim .....
Di azadiyê de ....
Hêviyan pêk tînim ......
Jiyanê dipelînim ...
Ta razayî me .....
Tiştekî dibînim ....
Dema şiyar dibim ...
Tiştekî dî dibînim .....
Ji lewra dîsa çavan ....
Dimiçinim ....
Bi kotekî wan ....
Dirazînim ......!
Ta ku bijîm .....
divê razim
Şiyar nemînim ....!!! )) .

Osman Sebrî rêzdar û torevanekî kurdî hêja ye , Diya Ciwan wî bi bîr tîne û wî dike sembola omîda gel :

**APO**

(( Apek min heye lê ne yeke
Bi hiş û zanîn mileteke
Navê apê min Osmane
Rêberek jîr û hozane
Barê li milê wî girane
Dil bi hisreta kurdistane

Heftê sale bi kar û xebat
Bi destên pak bi dilek şewat
Ji bo ziman ew bû şivan
Parast ji bin lingê teban
Pir westî ya bi derd û jan
Bi girtin û hebs û zindan
Apê minê hêja Osman ,
Ji bo biçûka bû dibistan
Ji bo gelê kurd û kurdistan
Çira ye li rîya niştiman ..
Bû Apê gel Osman Sebrî
Tê her bijî tucar namrî
Tê şîn bibî li ser rû pelan
Li nav axa kurd û kurdistan
Tê sitiran bê li ser devê qîz û
Lawan ...........))

Helbesta Diya Ciwan , laşê wê ye , xwîna wê ye , heyîn û jiyanê wê ye
Ew bi mêlak û hestên xwe ve tevlî berxwedana ( Leyla Zana ) dibe , Leyla jinek kurdî mêrxas e soz û peymana xwe di hindirê perlemanê Tirkî de bi zimanê kurdî xwend , niha ew di zindanê de ye :

(( Hevala min ......
Cêwiya ramanê min ....
Rêber û zanaya min .....
Kakila Amedê :
Çendî Amed
Li bejna te tê .
Kilê çavê zindana :
Sûnda te
Kumên hesinî qul kir .....

Guhê gîrokê vekir ....
Tirs xiste dilê tirsê .....
Sînga sînora çirand
Û çû
Li ser ehniya rastiyê
Nivîsî :
Ev xak ya min e .....
Zindan be
Ya min e
Gulîstan be
Ya min  e )) .

Helbestvana me , ji ber ew dilşewata gelê xwe ye , dixwaze ew zanibe ku peyvên wê bi sûd in , peyvên wê Qubletnema xebatê ne :

Temînî
(( Temîniya min li we :
Hûn hêdî hêdî
Rahêjin gotinên min ....
Hêdî hêdî .....
Wan hilînin û deynin ,
Da ku nederizin ....
Neşikihin .... neteqin.
Hewa ji destên xwe hebin
Dema win wan dipelînin ......
Rûpelên min î dêm zer
Bi cixarên xwe vênexin
Wan bihêlin ji pîne
Û pispanan re
Yan jî
Ji paqijkirina
Lûlên

Tifingan re )) .

Wiha , hate xuyanî ku Diya Ciwan nivîsoka xwe ji êş û kulên gel , ji hêvî û armancên wî renge reng dike û serê wê bi wan dixemilîne , ew nimûna jina kurdî welatparêz e .

-------------------------------------



***DÎLAN***

Di pirtûka xwe de , Dîlan dixwaze qefdek helbestên serbest , bê kêş bihûne . Herwiha , ew bizav dike ku helbesta wê kurt , hevkutandî û tijî wêneyên ciwan be .

Helbesta wê ( **Ramûsanên sor** ) wêneyên hûr û tenik bela wela dike , da yê xwendevan zanibe ku aso ne bê xwedî ne . Ew dibêje :

(( Gava .....
Rok û aso
Bi ramûsanên sor
Diçin riwê hev
Rojava
Di sorbûnê de
        Vedgevize .
Qoqên çiyan
Wek pêsîrên dayikan

Dikelin
Diçirisînin .
Zarok û lîstik
ji hevdu cihê dibin
Zimanê wistabûnê
Li karkiran dirêj dibe
Şivan
Pezê xwe dijmêre
Û vedgere
Girtî ....
Di zîndanê de
Derdan didrûn
Û bîranînên
(( Kevn û nuh ))
Dibişkivênin . )) .

Bi rastî , ev jî , nîşaneke helbesta nûjen e , ku ew karîbûna xweyî bê sînor dikare bide xuyanî , wekî vê bûyera normal gava bi zanebûn bê bikaranîn , karînek helbestî , çiqas bikêr û bi akam dibe , bûyer dûrketina , dildar e , lê war û xew çidikin , helbesta bi navê ( **Xewn û Bîranîn** ) şirove dike :

(( Ez rêkan û bîranînan
Dipêçim
Û wana dixim bin serê xwe
Tenê ji bo ko ez
Te di xewnê de
Bibînim .
Dema ko ez raman dibim ,
Bi wî ciyê ko
Ez û te bicivin
Herdu

Xwe ji min didizin.
Rêk û bîranîn
Te ji xwe re dibin
Û xew
Min ji xwe re dibe .))

Demên bendewariyê demin dijwar û tund in bi taybetî dema
şev qar bibe û bêdengî ferweriyê bike
Ev jî , rewşa helbestvana meye :

**Kavil**

(( Ro çû ava
Hîn ez xwe bi hatina te
Dixapînim
Şev dirêje ....
Hatin û nehatina te
Wek bihna pûngê ,
Û bihna zeyzefûnê
Têvhev dibin .
Şev dirêje ....
Tariyê
Li ser şiyaran
Barê xwe danî
Hino ..... hino
Piravên bendewariyê
Ziwa dibin
Şev dirêj e ....
Hêvî
Wek bablîsokên avê

Li dora min
Çê dibin , diteqin .
Çê dibin , diteqin
Hatina te
Wek hilatina rokê
Ji min dûrket ,
Lave
Bi qirş û kûmirê re
Bû arî
Serma bû gur - şev şikest
Sipêde ket ber zayinê ,
Kavil û cotek hêsir man )) .

Helbestên Dîlan bi vê şêwazê nêzî dil hatine hûnandin ew kurt in , lê dikarin wateya xwe bi wêneyên ciwan bighînin yê xwendevan .

**Bendewarî**

(( Ger tu niha bihata ,
minê te
li keleha (( Dimdimê ))
bikra padîşah
minê tifing û xefk û bend
ji dora wan awrên te bixista
Emê bibana
du şaxên lavlavê şîn û xweşik
û li kevdû gerandî ,
an du henarên çavekî
mest û xewar ,
an du felqên mêwake
bilind .... li dar
Ger tu niha bihata ,

ezê bibama
pêlek ji pêlên darya
tê biba ba . )) .

---------------------------------------



## *EHMED HUSEYNÎ*

Helbestvanê me Ehmed di sala 1955 an de li bajarê Amûdê ji dayik bû .

Di sala 1983 an de wî ji zanîngeha Şamê Lîsansa Felsefeyê wergirt û ji sala 1989 an û vir de li Swêdê dijî .Berhemên wî ev in :

1 – Mistek ji şîna bêcir – 1990
2 – Bi xewna we pênûsê dilorînim – 1993
3 – Rono û sirûdên bêrîkirinê – 1994
4 – Sîsirkê hasinî ( Selîm Berkat ) Wergerandin – 1997
5 – Bazbend Kewname – 1999

Yek ji sembolên helbesta kurdî ya nûjen Ehmed Huseynî ye . ew dixwaze hevîrekî taybet , ji zimên , bo xwe bistirihe , biyaniyê Jî , canê wî kolaye , riya çûk jî , nedayî yê , rebeno maye destvala , ji bilî zimanê dayîka wîyî şîrîn , bîranînên hevalan û welatekî nîvkuştî , pê ve nediyare .

Wiha , gava tiştek tê bîra wî , ew bi nêrînek tûj rewşa wî bi zanahiya xweyî gûzanî çîvar çîvar dike û wek hozanek rastgo ji giyanê wî difûre .
Amed , Mehabad û Qamişlo gerdûna canê wî dihejînin , ew jî radiweste û ji wan re helbesta ( sê şar in lê digirîn ) dike diyarî :

**DIYAR – BEKIR**

(( Bîranînên te ,
Ji sorekî serhişk in
Çend stêrkên xewrevînê ,
Wek evînê
Bîranînên te
Bi neynûkên matmayînê
Ji kelmoza birînê , der bûbûn
Goristanên xunavgirtî
Di hilma serbazan de ,
Xaniyên hedana te ,
Bagerên reş in ,
Kolanên pirsokî ,
Bi bendemanê serxweşin ,
Bazirganên gerdeniya te
Zirnevan û semageriya pinpinîka te ,
Û qirêja darên hejîrê
Dilê xwe
Esman û niştiman
Di payîza bêrîkirinê de
Zer bûbûn .....
Birûskên te , nimebarana kovanê
Dahola çiriyayî bi cinihê ziriyanê
Qirçe qirçe tîpên te di nav pencên tozê de

Çepkên te yên xav û zelûl
Bi dû termê dozê de
Gava mirin di çaraliyên taristanê de
Li te digeriya !!
Gava behra wanê , bi poşmanî , kefenê te
Li xwe dipêça û digiriya !!
Gava roka ber êvarê radest bûbû
Li hemberî xweşikbûna çiya !!
Û ...... !!
Gava di ser dev re çû ... berû
Tu ji xewna tal rabû
Te biskên rabirdû hûna !!
AMED !! ?
Me tu bi şîr û şekir xwedî kir ...
Me tu di himbêza gulê de kedî kir...
hê me baskên te
Bi binefşên girî venegirtibûn
Tu bûyî wêrangeh û xopana diyarê Bekir
De rahêje agirê nanê xwe ,
Simbêl badana bapîrên xwe !
Raz û mamikên ava xwe !
De bilezîne
Destên xwe rapelîne li zinrên nava xwe !
De bi narmîn şiyar ke ji westanê gava xwe !
De tovên biyê li wî alî sînor şa ke bi silava xwe !

## MEHABAD

(( Tiliyên xwe ,
yên ku
Tirî û kevokên serjêkirî

Nas dikin
Ji paşila dîrokê werîne der ...
Mûristan e ,
Teqiyaye di bişirîna te de
Dil û can e ,
Şîn hatiye di qîrîna te de
Çar çira ye
Çûra gura ye
Xura mila ye
Serdar û sêdar
Û gundên te çirên rojhilata xemgîn
Vedimrînin ....
Penaberên eşqê ne , di simblên xewnê de
Xwe liba kirina te dibînin ....
Giyanan di kefikên demê de , bi alî goristanan
De divirvirînin ...
Ji guhê xwe bipirse :
Bê bi çend zimanan me axîna xwe
Wergerandiye mirina reş !! ?
Ji çavên xwe bipirse :
Bê bi çend keskesoran şil bûbûn
Kêl û kêstekên darbesta geş !! ?
Lêlê sebrê !
Tu bi tenhayî di algûşkên şevê de
Dikulkulî ,
Diterpilî di lingên revê de
Pêşewa yî , leheng û keye yî
(( Di olimpiyada xwedê de ))
De rabe Qazî !
        Wêneyên kevnarî yên veşartî werîne der
Ji qewlika Qur’ana xwe

Li ser dêmên penaberan dawerivîne
Tav û peşkên gumana xwe
Rabe !!
Îro du şev û du roj in
Ku sebrê
Bêyî stêrka sibê
Tî ye
Birçî ye
Buhar li piştê
De rabe !
Hê seqmê evîna te
Di rehên wê de nedîtiye .

## QAMIŞLO

Deng bi deng
Ji tembûra te
Dipijiqe ceng ....
(( Şenga min , penga min ))
Û sor
Bûye heyvanê reng ....
Te em dahijtin çîrokan
Bîrek bê binî bû ,
Kovan û şînî bû ,
Ciwanî pîr duibû
Di gel keziyên pîrebokan ...
Her ku li serê çiyan
Di bû êvar
Te kadiz
Bi dizî dixwar ......!
Her ku kulîlkên nîştiman
Li Toros dibûn bi qurban
Te heyv

Di şeva rêberan de
Bi ser zil û qamirê de dianî xwar .... !
Te piştiyên bendemanê hildigirt
Havînê di xwêdana te de ,
Bîna xwe radigirt
Tirêna ronahiyê
Di hinarkên te re ,dibûhirt
Lê te lêva xwe
Di rûyê maça me de digirt .....
Tu çawan
Xew dikî ?
Tu çawan
Xewnan dibînî ?
Tu çawan
Şevê hew dikî
Tu çawan
Digirî û dikenî
Tu çawan
Guhdar dibî ?
Tu çawan
Bê buhar dibî ?
Ne xem e gula min a qedîfeyî
Sê par ji hebûna te
Nêzîk dikin dûrbûna te
Sê par ji barana te
Nêzîk dikin gulvedana te )) .

Ew li bin navê ( kewname ) şûrê zimanê xwe bi ser hemî aliyên jiyanê de dihejîne û ya ew dixwaze bi pir wêneyên nûjen , wêneyên li hevsiwarkirî , kin û dirêj , dighîne :

(( Eger hat

Û dawiya dawî xencer di kalanê de
Riziya ...
Eger hat
Dawiya dawî hespê ji hişê te
Reviya ...
Eger hat
Û dawiya dawî kevoka cîhanê ji pêxîra te
Firiya ...
Eger hat
Û dawiya dawî nexeşiya ziyanê di çavê te de
Giriya ....
Eger hat
Û Birîna demê di gavên te de
Kûrtir bû ....
Eger hat
Û êşa gemê di bîr û baweriya te de
Pîrtir bû....
Eger hat
Û zixta rimê di şev çirayên dilê te de tîrtir bû
Eger hat
Û renckêşana pênûsê ji zirt fortan şêrîntir bû
Eger hat
Û kewistana
Namûsê
Berê xwe da
Velerezîna te ...
Eger hat
Û xewrevînê serê xwe danî ser balgeha zîna te ...
Eger hat
Û welatekî sed – serî bela xwe firot
Zanîna te ....

Eger hat
Û çar sînorên deyûz xwîna xwe xistin stûyê
Zemîna te ...

-

- ***1*** –

(( Berzûrî hişê diya xwe bû
Berzûrî laşê riya xwe bû
Berzûrî kaşê siya xwe bû
Berzûrî qeraşê bîya xwe bû
Berzûrî kelaşê tîya xwe bû
Hemî berzûriyan rê winda kirin
Toza giriyanê li pey xwe rakirin

-

- ***2*** –

Bîranînên xwe bi komira demê
Dişwitandin
Bîranînên xwe bi diranên poşmaniyê
Dikeritandin
Bîranînên xwe bikêra bêganiyê , têra xwe ,
Dixeritandin
Bîranînên xwe bi tiliyên hesinî yên
Tenhatiyê diperitandin
Bîranîn dibûn dîwar
Dibûn koremar

- ***- 3 –***

Êvara xwe di sînga xwe de diçand
(( Lêlê Edûlî )) bi ser wê de dirijand
Bagera bêrîkirinê li wî alî dilîland
Destê oxirê xwe biser de diçemand
Êvar bû kew

Edûlê bû kew
Bager bû rewrew
Dest bû xew

-

- ***- 4 –***

Girê şermola dinuqitî dilê wî
Girê Mozan dibû sertaca kulên wî
Girê Hemdûnê hildiperikî milên wî
Girê komaliyê diçelmisand gulên wî
Girên xwe bi şevistanê rapêçandin
Alên xwe di kezeba berbangê de
Daçikandin
Gir bûn goristanîn bê çira
Di navbera min û te de jî bûye
Seyrangeha Hirç û Guran

-

- - ***5 –***

Li stokholmê
Em li tovên şîniya xweş digeriyan
Li Moskoyê
Em bi mirovên serxweşya rûreş dikeniyan
Lî Qamişloyê
Em li ser termê xewna laleş diciviyan
Lê li Şamê
Hemî paytext dibûn kaşên Qasiyûn
Pênûsa dildariyê wek laşekî pir mirin ,
Dima bê ser û şûn )) .

-------------------------------------



# *EVÎNDARÊ XEMGÎN*

Navê wî Mehmûdê Sebrî ye . sala 1937 an li gundê Çetelê ( nêzê Dirbesiyê ) hatiye dinê , niha li bajarê Hisiçê dirûne .

Di sala 1986 an , mamosta Evîndar dest bi nivîsînê bi zimanê kurdî kiriye û helbestên xwe di vav govaran de belav kirine : Xunav – Gurzek gul – Zanîn û Gulîstan .

Rolek wî yî xurt di weşandina govara xunav de hebû . pirtûkek wî bi navê ( Nerînek di Terazûya Ristên kurdî de ) heye . Gelek nivîsandinên wî hene , lê ne çapkirî ne , em hêvîdarin wê di pêşerojê de roniyê bibînin .
Bandora bilbilê bax û buhişta Botanê ?. Melayê Cizîrî , li enya dana Evîndar nîşaneke belûye çi ji aliyê bêjeyan be û çi ji aliyê şêwazeriyê be mirov dikare helbesta wî ( **serdara dil û hiş** ) bike nimûne :

(( Vê mihr û evînê dil û canê mebiriştin
Aram û ebora me ji bintar de nehiştin
Xwîna me di laşê me de vêket li rehan tev
Bûn kehreb û ronî , bi dil û can ve gihiştin
Geh noye evîn zirze wekî şêr û pilingan
Geh sinçpers û xoy xweşe , yar têde firiştin
Awir ji çavên te dibarin weke tîran

Pir dil bi birîn mane , tijî derzî û xiştin
Awir weke mûşek li kela dil ket û hat xwar
Çav bigre , hewar yar bese dilhişkî û kuştin .
* * *

Çaxa tu kenî , dil li hisan radiperîn
Hişmendî û zanîn , di seran de ne dihiştin
Ev sur li ruwan , vêre evînê di civînî
Min jê vedixwar , her dil û can tijî û miştin
Razên sipehî , her li ruwan têne xuyanî
Sed heyf û mixabin , ku gelek tê ne gihiştin
Wek neynike rû , têde cîhan bûye xuyanî
Sed şadî û jan , tevde bihev re li tenîştin
Maçek ji rewan , hiş di firînî weke wiskî
Maça gewazî şerm û fedî b'şûnde dihiştin
Ma dêm û dev û lêv , li xurû bûne ji cûrî
Yan rû bi qurinfila hatiye şuştin
Ev rûçik û dîmen , bedewî têde didî der
Jê mane li paş xobû lewendên li buhiştin .
* * *

Hevrîşme por , zêre bi reng daket ser mil
Dêmên te hulên sade ne , bilkên te bi qiştin
Gerden ji kirîstale , didî şewq û çirîskan
Çavên me ji şewqê venebûn , xeste siriştin
Sînga te ji qeşêye , mi lêv lê digerandin
Hênik ne dibûn cerg û hinavên ku heriştin
Hêmbêz kirina wê ten û laşê weke pembo
Dermane ji derdare , ne ber bejn û niviştin
Ma gewde û laşê te gelo hestî û goştin ?
Yan sade isfenc û hevirmêşin , çi tiştin ??!
Ev jîrî û rindî , li ku herdû dighên hev

Nazdarî û hişmendî û xoy tev de li piştin
Ev rindîy û sincen te , xwedê kirine diyarî
Kes tê ne gihişt ew çine , hiş jê di qeliştin
Xatûn te divêt her bibe serdan li dil û hiş
Dest bestane em , bo te li mizgeft û keniştin )) .

Hestê Mamosta Evîndar , hestekî bilind e , bi gerdûnê re hevhesû ye û helbesta wî hertim xwe ji jevketin û sistiyê diparêze ,rûmeta xwe ber jor hildide : Ma gelo ku mijar jev cuda bin , ev hest wek xwe dimîne ? ka em li helbesta wî ( **kevoka devê çeqel** ) vehesin:

(( Cana bi evîna te dilê min qijilî
dijware çi volkane ji dil hildikelî !
Her min bi evînê nuhirand vêr keser
hilbûn ji hinavan , bi kulan dil dihelî
Pir kûre li dil bê sûde ne şîret û pend
peymane li cane evîn , bê dudilî
Dilber çi bi êşkenc û gelek rence li min
tîra ji evîna te di dil de çikilî !
Nêçîra dilê min , te bi çavan kire dîl
pencê te bijangê te ye , çar pênc niçilî
Çifta ji du çavên xwe te berdaye li dil
rast hat , tu çi xwînrêje kejek çav bikilî !

* * *

Çehrê te çi gulzare , bidêmên sipehî
cûrî ne li ber lêv û devê qurnefilî
Rû heyve li çardaye , çi şeng bûye xuya !
ronake çi xweş lê dike pozê nikilî !
Por şêye ji ser herdû milan dakete xwar
zêrîn û bi şewq xweş çirisîn bisk û gulî
Sînga te ji qeşêye hinar tê de gihan
Mêw xoş û pitik sore hinar , bê çuqulî

*                    *                 *

Dilber ji evîna te çi bê rexne ne em
dev nagere bê gazin û bê xeyd û gilî
Gêncî weke xunçaye , evîn evîn kurme , hewar !
kurmî be gulistan , bi gulan na xemilî
Xatûn te giraw girtiye can û dil û hiş
lew bo me çi namîne ji bil vî kivilî
Bû pênci yû heft sal temenê jar û reben
ma qey nebesin , azer û dil bi kulî
Van derd û kulên bûne lehî girtine dil
hêsa ne li ber wan – kuf û derdên(Ebelî )
Di ma ji kulan wek nexweşê ma bi tenê
êşa xwe qe nas nake , ku deng jê di bilî

*                  *                      *

Dilber tu seroka kej û şeng û seriyan
sed ax tu kevoka kete dev wî çeqelî
Rinda mine nazdar û dilovane tu yar
ew pintî yû şindoye ku dil jê dixelî
Sozdare tu bo dilbikulê merd û çeleng
çawa dibe hevbend tu bi wî serbixwelî ?!
Sed wax li te ahoyeke mêrgên bi kulîlk
pir zore li sergo bi beraz re mexelî
Hola te ye şîngah li diyarên bi nefel
hola tene dehlên bi kulîlk deşt û gelî

Hin destreş dixwazin vê rûmeta hayî bilind hilweşînin lê ev yek ji wan dû re , helbestvan di ser hêlemişta jiyanê re ye . Ev e amanca helbesta ( **Xizm Hevalên Keysbaz** ) :

(( Ji nav derdan çi derdê min girane
Ji ber xizm û hevalên wek gurane
Dema ew dil fireh bin , ez di gel wan
Gelek şadim , dilê min kamirane

Neşêm kînê dijî wan ez hilînim
Çi dixsin ew ! bi kîna gawirane
Dixwazin rûmeta min hilweşînin
Wekî cakûc û qazmên zorkera ne.
Ne beed gotin ne bedkarim dijî wan
Bi paşgotin , ziman wek xencerane
Li min kîndar û rikvanin bi xurtî
Li ber lingê neyar wek qundera ne
Zimanên wan li ser min pir dirêjin
Li ber neyar çi hayên naxirane !
Li ser min tûj ziman û peyv dujuinin
Li ber dijmin bi lav û mehderane
Divêm serkefety û rêzdar bijîn xweş
Bi kînê ew li min wek ejderane
Gelek mehr û dilovanim li ser wan
Dil û canim li wan mûm û çirane
Bi tîra têne pişta min bi dixsî
Neşêm tola xwe bistînim , birane !
Divên rêza min daxin jêr bi dixsî
Bi oflazî li min wek efserane
Dizanin nagihên rêzên dilêran
Dijî min ew li rêza sîxurane
Mi dest her dane ber wan da neyên xwar
Mixabin ! çav li jêra axurane
Hevalên payedar çawa ketin xwar !?
Li nik dijmin li rêza nokera ne
Çima kêm rêz xwe dan destên neyaran !?
Di gel zordar , çima ew dest birane !
Mi barên wan bi dilxoşî hilanîn
Xwedî rêzin li ser çav û serane
Bi paşgotin , bi gazin , pir bi peyvin

Durûtî her li ser lêv û deva ne
Di tengayê de , keysbazin , bi layin
Derûn nizmin , ji jarên ber dera ne
Neyarên min dibînin dost ! nizanin
Dijî wan jî , neyarên sengera ne
Li wan bûrîm gelek caran bi merdî
Li min har û gurêx bûn , xwînxurane !
Bi erkên pir bilind ez radibîm ew
Dibêjin : ev ji karên rêncberane
Bira birin dema bê berjewend bin
Neyar parêz û dûrî perwerane
Li nik wan , perestî her rewaye
Ne dadxwazin , ne dostên dadwerane
Li ser xizm û hevalan bargiranin
Di gel mafxwer li rêza hevsera ne .
Çi viftarên sitemxwaz û dijî hiş !
Ne rêbazên heval û destbirane
Bi lêv gestin , bi girçîna dirane!
Birînkûr im li can û dil ji ber wan
Niçû bê toreyên wek niştera ne )).

Wiha , helbestvanê me tûşî bobelatek mezin bûye , lê wî bi comerdî û zanebûn xwe parastiye , aferîn jê re ................!

-------------------------------------



## *EN : FERHAD ÎÇMO*

Helbestvan Ferhad Îbrahîmê Îçmo sala 1961 ê li Qamişlo bûye , wî li Helebê xwendina xwe bi dawî xistiye,sala 1984 an bûye Endazyar , di pêşî de wî dest bi sazvaniyê kiriye ( Tenbûr – Biziq - Ûd - û Gîtar ) , lê dema hunermendê nemir Mihemed Şêxo helbesta wî ( destê mi bigre ) strand wî hino hino xwe bi pêş xist ta di asîmanê helbesta stranî de bûye yek ji navên herî giring û gelek hunermendan helbestên wî strandin mîna : Mihemed Şêxo - Beha Şêxo – Selah Osê – Adil Hiznî - Îmad Fettah - Îsmayîl Cima .....

Çar pirtûkên wî ketine destê xwendevanan de :

1 – Lêmişta Zozan – helbest – 1988
2 – Piştî çi – helbest – 1995
3 – Evîna te helbest – 1998
4 – Landik – helbestên zarokan – 1998

Helbestvan Ferhad Îçmo xwedî hestekî nazik û tenik e sira gotinên wî bi hermoniyek keçîn guhê xwendevanan bi ser xwe de dikşîne , û ji aliyê hindirî ve watên helbestên wî pir ji gel ve nêzîk û pêwist in , weke helbesta wîyî hêja
( **Rabe Helepça** )_

(( Li ser hinarka hêsir man rêwî
Vebû di dil de birînek cêwî
Kes nîne jêke destê vî dêwî
Wilo helebça namîne sêwî

* * *

Rabe helbça ji derya xwînê
Ji nû bihûne çîroka jînê
Bide sêwîya tîna evînê
Hêsrê jin biya dîroka kînê

* * *

Do tu şeherbû bi qîr û gazî
Nesrîn ji pela îro man tazî
Dilê birîndar çawa wê razî
Nalîn û hewar tu çi dixwazî

* * *

Xuşka tey mezin ew aleqemşê
Hate gurandin bêdeng li hewşê
Hate wêrandin bipirs li rewşê
Xwîn xistin xamê ji bona neqşê

* * *

Li kelhe dizê bumbe barandin
Destarê mirnê bê hiş gerandin
Zarok bi topa hatin mirandin
Zikê bûkê nû sivik çirandin

* * *

Agrê li zêwa ma qey vemirî

Gor va çirandin zarokên mirî
Hema dirêsin şalûl û qumrî
Ew jî weke me mane bê perî
* * *

Çavên xwe veke ey cîhana kor
Binêr li xwînê li jêr û li jor
Xistin bin linga gula kesk û sor
Kevoka aştyê nake more mor
* * *

Were bi bhîze ey cîhana ker
Kê gul weşandi ji ser şaxê ter
Kê li helebça vêxist agrê şer
Kevoka aştiyê ket bê ceng û per
* * *

Cîhan bê denge li me nalenal
Bumbe di barin li deşta xormal
Xistin bin axê xort û qîz û kal
Man bê dê û bav kulîlk û mendal
* * *

Kurkirin kezyê serê sêrewan
Buhişta xewna bûka kurdisan
Perwanê mirnê xwe berda ezman
Xerdel û napalm dibare baran
* * *

Hawar û gazî ma kes nabhîze
Leşkerê mirnê bi me dilîze
Pir bûn li me diz şeva me zîze
Bûka nav perda hînakê qîze
* * *

Qêrîna xemê mirya ranake
Keleka mirnê ew xeranake

Xwîn mij bi xweşyê ji vir barnake
Divê gelê dîl serê xwe rake
* * *
Serê xwe rakin roka me hilat
Berê xwe bi din zozanê welat
Gelek buhaye qelen û xelat
Li hêvya wene ax û av û lat )) .

Bi rastî , çiqasî yê helbestvan bixwîne û di jiyanê de bipûnije wilo jî hestê wî xurt dibin û asoyên ramanên wî fireh dibin , ev jî dihêle mirov pêşniyar bike ku ev helbestvan toşî jankêşaneke mezin e ji bo vê jiyana halo dijwar ejokkekî çeleng pêwist e , ew jî helbestvan e ew ji hindirê janê peyamên xwe dişîne , çima ( **Te Ez Hiştim** ) bê war û cî :

(( Carekê ji te nabim razî
Te ez hiştim jar û tazî
Mi kir hawar lê tu nehat
Para min qîr û gazê
* * *
Carek ji te nekim fedî
Birîna dil ma te nedî
Te ez kirim xwedî dijmin
Ezim îro hirçê kedî
* * *
Tirên karbû te ez hiştim
Ji min dûrket te ez kuştim
Dûrket hêvî dûr ket nalîn
Tava sibê va ez şuştim
* * *
Te ez hiştim wilo bê zar
Li min kêmbûn gul û buhar

Li min pirbûn xewn û raman
Çavê zelûl maye şiyar

Te ez kirim dava xema
Ez dijmêrim în û şema
Gazina min çima wilo
Ebora dil êdî nema )) .

Di pirtûka xwe de ya bi navê ( Piştî çi ! ) , Mamosta Ferhad pir li hestê xweyî netewî xwedî derketiye . Ew di rewşa kurdan de û hêviya ( Berzanî ) , ( kurdistan ) dîtiye , û her û her ji jiyana gel axiviye , johî wî xwestiye yek caran xurista kurdistanê weke kesekî bibîne û pêre danûstandinê bike . wekî Feqê Teyran yê bi avê re diaxivî , Ferhadê Îçmo bi çiyê re diaxive û lê dike hewar : **( Çiyako** )

(( Çiyako .....
Bê gundo
Herdem li te , mij û ewre
Tu ji pengên
Berfa sala .....
Por sipîye , serî gewre,
Çima îro .... ?
Ji bo jar û perîşana ,
Bo beytikên basko kirî
Li ber serma zivistana ,
Tu bê çare ......
Tu bê zewre ,
Çima îro ....... ?
Tu dergehê , wan şikefta
Bi guhlokên , berfê digre ,
Ma ne şerme
Di hembêza , te gernasî ,

Evînîka ......
Dilan ...... bimre
Bê gundo ...... çiyako ......
Çiyako
Bê ....... dengo
Çend evîndar ....... ,
Te parastin , ji kuştinê ,
Diz û keleş ,
Te , vedşartin ,
Dema dighan , ber girtinê
Tu bû hêvya .......,
Dost û yara ......,
Roja karê , revandinê .
Çima îro ......?
Tu bê denge ?
Tu nabîne .......,
Hêsrê çavên ... pîr û kala
Tu nabhîze ,
Nalenala , li mendala ,
Bi hezara
Diwan gelê , tenî wêran ,
Va gihane , ber mirinê
Bê dengo......
Çiyako ......

* * *

Çiyako ,
Bê sozo ......
Xelk dilketin ,
Heyva li bin zulfên siya ,
Hin dil ketin ,
Zîv û zêr û , keryên miya ,

Em bi tenê
Dil ketine,
Mirna li ser , pozê çiya ,
Tenê carkê ,
Wek mêrxasa ,
Berfê hilîn , ji ser piya ,
Bê sozo ,
Çiyako )) .

Tevlû ku em dibînin ku nîşana herî balkêş , di dana helbestvanê me de , ew têkliya wîyî xurt bi awaz û mûzîkê re ye, dîse em dibînin ku vê yekê hiştiye ku ew nêzî kelepûr û folklorê gelê xwe yî kurd bibe û berê xwe bide toreya wîyî lêvkî .

Pirtûka wî ( Landik ) qevdek helbstên ji bo zarokan hembêz dike.

Ew tê de li ser stranên gelêrî û gerdîşên kurdan rawestyaye
Û xwestiye li ser xurista welat biaxive .
Çem , Baran , Dîk , Rovî , Rok , Heyv , Silêmanê dunikil , Kew .Wiha , ew bi hevokek pir navdêr dest bi helbesta ( Çûko çûko ) dike :

(( Çûko çûko sefarî
Mi j’tere got sed carî
Veger li hêlîna xwe
Vaye baran dibarî

Îro berf û barane
Roja xewa girane
Agir bûka çileye
Tim li dor wî seyrane

Çûko veger hêlînê
Guh ned qîr û nalînê
Heger rokê bihar hat
Derkev ji bin kulînê

Derkev nav kulîlkên geş
Ji bîr bik wa rojê reş
Piştî zor û taliyê
Wê diyar be demek xweş

Çûkê li nav tehtika
Her bicivîn darika
Hêlînek nû avabik
Ji perî û qirşika )) .

Ma ku em bêjîn ku helbestvanê me Ferhadê Îçmo ber bi tekûziya rêveçûna xweyî hinerî ve diçe û em bi hêvîne ku wê pêşeroja toreya me pê zengîn bibe .

---------------------------------------



***FERHAD ÇELEBÎ***

Mamosta Ferhad di sala 1961 ê de li bajarê Amûdê ji dayîka xwe re çebûye . Bekeloryos û diblom di Bazirganiyê de wergirtiye .

Rola wî di çapemeniya kurdî de xurt e , nemaze di weşandina govarên mîna Gulistan , Zanîn , Bihar , û gelek pirtûkan .

Nivîsoka wî rengîn e , ew gelek cûrên toreyî dinvîse wekî : Çîrok , Helbest , Lêkolîn , rojnamegerî û wergerandin

Mamosta Ferhad di helbesta ( **dayîka min** ) de hestên xwe derbarî dayîka xwe , ya wek sembola xak û welat bikarhatiye , rave dike :

(( Ji ber ku dibhîzim
Dengê Tiving û bomban
Dizanim çend dîlan û govendan
Mafê min heye
Ez ji te bim ...!
Ji ber ku evindarim
Xwedî hestên Tenig û jarim
Mafê min heye
Ez ji te bim
Ji ber ku ez mirovim
Aştîxwazim ne hovim
Xwedî dîrok û dozim
Mafê min heye
Ez ji te bim
Dayîka min
Hêstira ne barîne ..
Gul bi hemdî xwe
Dibişkivin
Şax di dara xwe de
Zîl bidin

Çemê buharê rawestin
Giha pêre têr av bibin
Aso bi xweşî dakeve xwar
Ji nûve ..
Şefaq der bê
Şevên reş bêne çirandin
Yeko .. yeko girêkan vekîn
Bo ku em binêrin û
Bibînin bê çawa gulek
Dibe gulîstanek ... )) .

Yara Torevanê me bi hemî aliyên jiyana wî ve girêdayî ye , ta ev yar jiyanê dorpêç dike û ew bi xwe dibe jiyan .

Mamosta Ferhad di helbesta ( **Yara min** ) de dibêje:
((  Li min digerin .... , yara min..
De bela çavên te girtîbin ..
Lê ku ez girtim û çavê min rijandin ...
Dikarim bi guhê xwe
Li dengê KAWÎS AXA ,
Guhdarbim ... dilê xwe pê xweş bikim ...
Û eger guhê min jêkirin
Û avêtin ber sehên xwe ...
Wê çaxê ez dikarim
Kulke zêrînê bibînim
Û rengekî ji çavên yara xwe re bi serhevdim
Eger destê min jêkirin
Û avêtin newalên bê binî
Ezê karibim bi ramûsanên evînê ..
Te himbêz bikim .. bigvêşim ..
Û eger piyên min şikandin û ..
Nema karibim bilivim

Ezê , di wan çavên te yê mêşinî de ...
Dîlan û şahiya xwe .. li darxim ..
Mem û Zînê li hev mehirkim ...
Lê .... yara min ku hatin
Û tu kuştin ...
Ezê di himbêza kê de ...
Cendekê xweyî pepûk
Veşêrim .... ?

## YARA MIN *2*

Hey yara min
Di wan çavên teyî
reş de
Heyvên dûr dibînim
xweş dibînim
Destan dipelînim ....
.......
Ez dirim , hey dirim
Carna jê li ber lehiya
Şîniyê de ....
Û carna li ber ... helbestekê ..
Hey yara min :
Bi sedê caran
te digvêşim
Te dihêwînim .... te maç dikim
Bi sedê caran .... ; tême kuştin
Tême sotin ... kovan dibim ....
Û ew kovanên min kûr dibin
kûr dibin ....
Destên xwe li min , dorpêç dikin ....
asê dikin ....

Dikim bankim : Hoy yara min ;
Di deryayên çavan digerim
Li heyvên xwe ...
Lê mixabin hey yara min
ji pêlên çavan pir bi tirsim ..
Ji wê aso ya dûr her dipirsim ....
Li rojên bên
Û biskê , reş bêne dizîn
Pêlên çava rawestin
Gelo : Ezê heyvên xwe bibînim ....?
Wan birînan derman bikim ?
Ew birînên ku bûne welat ?
Wê demê ezê bibêjim :
Nêzîk bibe ..... nêzîk bibe ...
Ey qada şêrîn
Bela evê perîşan
Canê xwe bi ser te de birêje ....
Bela evê perîşan te himbêz bike ...
Û bibêje :
yara min ....! )) .
--------------------------------------



# *FETHULA HUSEYNÎ*

Helbestvan Fethula Huseynî sala 1970 î li bajarê Dirbêsiyê çavên wî ronî dîtine .

Di sala 1985 an de wî dest bi nivîsandina helbestê kiriye .

Çar berevokên helbestî jê re hatine çapkirin , ew jî ev in :

1 – Kişwera şehîdan – helbest – 1992
2 – Firyada li hevdayî bi mizgîniya reş - helbest – 1994
3 – Ne wisa Ayetên Dojehê têne xwendin – helbest – 1998
4 – Xera’t – helbest bi zimanê Erebî - 1998

Di pirtuka ( Kişwera şehîdan ) de , helbestvan nemerdiya gelê kurd daye nasîn . Çawa ew bê dudilî berxwedanê dike û jê re qurbanan pêşkêş dike .

Li bin navê ( **Rêça min** ) , helbestvan rê û nêrîna dide xuyanî :

(( Min rêçek girt dûr û dirêj
Ha meşiyam bi cegersoz
    Latek dijwar hate pêş
    Bûye kelem hember doz
Doz bû xelasî û felat
Li her kenar û devera
    Bê te carek xweşî welat
    Berdin evan hov û gura
Ji zerî tanî ber – delîv
Min derbaskir bo te ey xak
    B'vîna dil nebûme zeîf
    Dicle , Ferat du kezyên pak
Dan û hîn kir ji dil û can
di êvarkê de ez jî mam

Qet kes li min nebû mêvan
pişt negirtin bira , pismam
Va dem û sal di çin û tên
Ez jî rêwî me ji bo te
Ger şêrîn bî , ger tu tal bî
Buhişta min , ez gorî te
Rê dirêje tû ji xwîne
Ta ku saxbim çendî li jîn
Bi te ronakê dibînim
Her kesê wenda û xemgîn
Ger sitrî û hem gwîzan be
Rêça te tev de kurdistan
Ji bo te wê dil rêzan be
Rawest nakim , ax û eman )) .

Wiha , hate diyarkirin ku helbestvan tevna xwe bi awakî kevn û kilasî ristibû . Lê di pey vê re ew dixwaze destê helbestê bi germî bihejîne , loma wî dev ji wî warê kevn berda û xwe tevlî nûjeniyê kiriye .

Ew di helbesta ( **Lav – lav** ) de pesnê yareke gerdûnî dide :

(({ Xwedîya xewna minî nîvço }
Kezeb bi ahînê
Ne be tobedara evînê .....
Li ser xapê evîndaran jî

Negrî ....
Hezar .....
Xwedî pênûs û
Gerefêt ......
Li ber soriya
Du lêvên te

Digerin
Û bi bûriyê ji xeftanê
te dixwazin .....
De .....
Nîv xewna mayî navêje ......
Qene bibî
Stranek nazik û
Li ser bexçê welatê min
Bête gotin ...
Hem .....
Piçekî bihêle
Bê nîgar
Di dergûşa zîçekî çav sist
de
Bi – lore
Û
benê mayî jî bernede .....
Eger xewn revîya nayê girtin ....
....Ji xwerte bi xelatî bibe ....
Qene ji tere bibî
Yarekî
Dilsoz )) .

Di pirtûka siyemîn de , durfetên helbesta nûjen balkêştir dibin û helbestvan ber bi wêneyên hêja ve diçe .

Ew di helbesta ( **Nêzîkbûn** ) ê de vî tiştî nîşanî me dike :

(( Ji hev nêzîk dibin
Nêzîkbûna qazî ji dardakirinê
Di wêneyan de nêzîk dibin
Nêzîkbûna pirekî dilfireh ji sînga evê ,
Naghêjê ramûsanên masîyan .

Ji hev nêzîk dibin
Gava awazên te yî fedyok di gindirin
Bi lingên min
Û ji ser dêmên zozanên reş , min
Hildipekînin bangên te .
Ji hev nêzîk dibin û sazin teyî çimakî bi
Şewşena gavên te min dikêşin ku pesnê
Xwedê bidim bi – tiştê – mayî , ji hezkirinê .
Em nêzîkî hevdibin
Nêzîkbûna :
Helbestvanan ji mirinê ....
Bêtir nêzîk dibim
Li pey bosila dilê te têm , çav
Li nexşa te me
( mîna tu zîndanek be piştî bîna şewatê
xwe lê digrim , dibin destmalên rokê )
Serê xwe ji te re dihejînim
( Mîna tu pirtûkek qedexekirî be navê xwe
Bidizî derdixîne ) .
Te di bîra xwe de tînim
Mîna tu ji min hezdike bêhtir
Ji xwe !
Li te guhdarî dikim
Mîna tu zumînîya mûsîqeke hêdî be ,
Kurdekî dilsoz – wê li menfa di afirîne
berê xwe didim te ..........
Mîna tu tabloyeke , bi memikên xwe yên
Eşkerekirî li min dinêre .
Bang – mindik
Li ser derewên dîrokê min
Di sincirîne )) .

Helbest li cem helbestvan , gereke bê dawî ye , çawa demên
Jiyanê wekî tabloyan li rex her rêz dibin :
(( De qedexe be

**Hevalo**

(( Kenê serbest , gava me
Berdida , nedinuxumî
Em bi herkesî
Dikeniyan ,
Tevî koşên westandinê
Dimeşiyan ,
Direviyan ,
Di cilên zendîyên
Xemsar de dilivîyan
Bê durv
Her sibeh , mîna serxweşan
Li hevdû digerîyan
Bê mebest )) .

---------------------------------------



***HEYDERÊ OMER***

Li gundê Qizilbaşa , li kurdaxê ew hatiye dinyayê . Dibêjin bûna wî ji dayikê di sala 1950 î de bû , lê ji ber nebûna dibistanê li gundê wî , bavê wî her kurek ji kurên xwe du sal ji temenê wan kêm kir , da karibin çetiniyên çûn û hatina dibistana ku li gundê kotana , ji gundê wî dûr e , hebû , hilgirin .
Ji ber vê yekê sala bûna wî 1952 tomar kiribû .

Wî xwendina xwe li gundê kotana , û bajarên Efrîn , Heleb û Şamê domand ta ku wî lisansa tore û zimanê Erebî sala 1974 an ji zangoya Helebê . û diplom ji Şamê wergirt .Diploma perwerdeyê sala 1978 an ji zangoya şamê wergirt
Ew bi her du zimanan kurdî û Erebî dinvîsîne , nivîsên wî gelekî nêzî rexne û lêkolînê nin . Lê hin caran helbestê jî dihûne û dirêse .
Du pirtûkê wî bi zimanê Erebî çap bûne :
yek ; Ehmedê Xanî di destana Mem û zînê de .
Dido Feqê Tîran , jiyan , helbest û nirxê wî yê hinerî . Ev herdu pirtûk lêkolînin .
Du pirtûkên dîtir ji çapê amade ne , ew jî ev in :
yek : Ehmedê Xanî , Roman û huner .
Dido : Cegerxwîn ê çîroknivîs , nimûne :Reşowê Darî . Ev herdu jî dîsan lêkolîn in , lê bi zimanê kurdî nin .
ji kurdî û Erebî de , li der û hinderê welêt weşandine .

Mamosta Heyder omer bi navê Hawarê Gundî hatiye nasîn .

Ew yek ji endamên damezrandina Mehrecana helbesta kurdî li Sûriyê ye

Helbestvan jiyana xwe bi armancekê ve girêdide , temenê xwe bi hemî çirûskên demê ji bo jiyanek tekûz û bi

sûde gur dikirin helbesta ( Ger ne ji bo te ba ) bo vî tiştî levhatiye:

**GER NE JI BO TE BA**

(( Ger ne ji bo te ba ,
Ma qe şîn di bûn bi çîçekan lêvên çeman ?
An kenarên rêkan di xemilîn bi gulan ?....
Ger ne ji bo te ba ,
Ma dilerzîn fedî - fedî çav mijany ?
An nazik di bûn bi carekê deng û bang ?
Ger ne ji bo te ba ,
Ma dilivin di sîngan de dil û ceger ?
An dicivîn li min derd û kul û keder ? ..
Ger ne ji bo te ba ,
Ma stêrk û heyvê didan şevan ticar ronahî ?
An radibû di çavan de kela şîn û şahî ?
Ger ne ji bo te ba ,
Ma geş dibûn baver û hêvî û evîn ?
ken û birîn radizan di yek derûn !?
Ger ne ji bo te ba ,
Ma tehlî dibû li min şêrîn û xunav ?
An jehra neyar di bû bimin gulav ?
Ger ne ji bo te ba ,
Ma bobelad û bêtar qels û pûç dibûn ?
An stirî li pêş çavan gul xuya dibûn ?
Ger ne ji bo te ba ,
Ma kanî li deşt û çiyan qet derdibûn ?
An lat û zinar qet ti car avzê dibûn ....?
Ger ne ji bo te ba ,
Ma gelo perdan û têlan , wê bidan awaz ?
An ava dibûn li bal şînê sema û saz ??
Ger ne ji bo te ba ,

Ma xweş dibû bi min hulma jiyan ?
An vedijî li min hergav giyan ?!
Ger ne ji bo te ba ,
Ma jar dibû zora evan mûyên sipî ?
An xurt û bi hêz diman ji min çang û pî ?

Ev helbest di kovara Gelewêjê de , hej 4 sal 1992 an de belavbûye

Li hember sitema nîrê bêbext helbestvan lebat û xebata ku giyanê wî jiwan re bûye jêder . çimkî , ew her tim xwe li rex gul û çîçekan dibîne . Ango , ew hêvîdar e ........

**LÊ BELÊ .....**

(( Belkî xişim û bêtar li du hev sîwarbin ,
Bi zor û hêz ser mede timî weha bin ,
Şahî bimiçiqin û ken di me de ziwa bin ,
Bikin xwîn – mij ser şînên me de xwe paldin ,
Belkî kulîlik û perwane jî li ba bin ,
Rondik jî belkî hûr hûr û kûr bi barbin ,
Kanî û çem jî belkî hişk û ziwa bin ,
Li her der û gorên tevan belabin ,
Lê belê hêvî , bawerî û viyan
Dê her geş û tûj bikin ji me giyan .

Ev helbest di govara Gelewêjê de , hej 4 , sala 1992 an de , belav bûye .



## *JAN DOST*

Helbestvan Jan Dost di sala 1966 an de li kobanî çêbû ye . Ew jî , wek gelek hevçerxên xwe pêşî bî zimanê Erebî dinivîsand , piştre bi Kurddî .

Berhemên wî yîn helbestî ev in :

1 – Kela Dimdimê – Almanya – 1991

2 – Sazek ji çavên kurdistan re- 1994

Di pirtûka ( Kela Dimdimê ) de ew dixwaze bi nêrînek giştî li ser rewşa kelehê raweste , lê mijara sereke dimîne evîna Dosto û Sînemê , ya ku ew pir wistandine .

Ka em binêrin bê ew çi li ser ( **avakirina kelê** ) dibêje :

(( Sibê rohilat rojeke pir sar
Xelkê kela me tev bûne şiyar

Keç û jin û pîr , xort û mêr û kal
Alîhev dikin , tevde wek heval

Dîwar û burcan bilind lê dikin
Di kelê de pir cihan çêdikin

Ji kaniya jêr riyek veşartî
Dikşandin kelê , da nemînin tî

Li ser hespê xwey boz û zeng û zêr
Pesnê wan dida Mîrxanê dilêr

Digot : Lêbikin vê kela mezin
Da ku em têde serbest rabezin

Da nebin armanc ji dijmin re
Hem bi ser mede sitem nebare

Di çûn , dihatin xort bi çalakî
Tev dixebitîn her yek hawakî

Dostê evîndar ew jî li kar bû
Rewşa wî nexweş gêj û hejar bû

Evîna sînem ketye dilê wî
Lewra gelek bûn derd û kulên wî

Bavê wî digot : ka xebata te ?
Ka li ku maye xweş lebata te ?

Tu wek nexweşa îro dimeşî
Ma qey tu gêjî yan tu serxweşî ?

Dostê evîndar rû sor bû ji şerm
Dixwest veşêre evîna xwey germ

Lê evîna wî nayê veşartin
Kulên dilê wî nayên jimartin

Neçare got : Ez qet ne serxweş im
Lê ez girtiyê keça çavreş im

Gerek aniha herî cem bavê
Ji bil vê yekê min tiştek navê

Sînem ji bo divê bixwazî
Dilê min î jar da bikî razî

Ji nuh ez karim vê kelê ji dil
Bi hevalan re lêkim mil bi mil )) .

Di helbesta xwe de ( sazek ji çavên kurdistan re ) ew li ser xalên ronîdayî , ji dîroka kurdistanê , diaxive . Navên wekî ( **Mem û Zîn** ) , Erarat , Evista , Laleş , Siyamendo , Botan , û Babegurgur pir bikartîne :

(( Westiyame
Weke deryavanekî , pêla şikandî
Gemiya wî
Ez dixwazim
Le peravên herdu çavên te vewestim
Ez di çavên te de yê xemgîn de dibînim
Bi seda qeykên şikestî
Ez buharên şewitî
Bê ji mar tê de dibûnim
Bi hezara
Ez stêrên vemirî tê de dibînim
“ Herdu çavên te du dîwanê evînin
Ez bi xemgînî dixwînim “
Ez di xewnên xwe de çavên te dibînim
Du siwarin
Di rêyên dil de li işqê digerin
Du kevokin
Tên di ezmanê birînên
Minî kûr de difirin . .

Da ku bê hêsir du çavên te bibînim
Dê ( Erarat ) bihejînim
Dê ( Evista ) yê li ber
Dergehên ( Laleş ) bixwînim
Li newalê
Bi ( Siyamend ) re bi nalim
Bi ( Memo ) re
Dê li ser ( Bozê Rewan )
Çav li ( Botan ) bi gerînim
Kevirên ( Bêstûn ) bi ( Ferhad ) re bikolim
Dê bi cotkaran re cot kim
Herme zozana di gel wan koçera
Têkevim govend û dîlan û semaya
Bistirêm
Dê bi pêşmerga re navê te li ser
Reşzinara binivîsim
Ji rehên dil
Ji tere tacê birêsim
Ta ku çavên te bibînim
Wek du dîwanê evînê
Pel bi pel wana bixwînin
Dê bi pêlan re bi bahozan re şerkim
Bi du destên xwe yê tazî
Ar bilind kim
Bo di tarîka şevê de
Herdu çavên te bibînim .
pirr hene
Doza işqa herdu çavên te dikin
Jêre helbesta dixwînin
Lê weke min
Aşiqê çavên te nînin )) .

Piştî van herdu bizavên helbestî , Jan Dost berê xwe daye lêkolîn û wergerandinê û ji helbestê dûr ketiye .



## ***Dr . KAMÎRAN BÊKES***

Kamîran Bêkes sala 1966 an , li çiyayê kurmênc qêrîna yekem bi xwe xist û çav li dinyayê vekirin . Xwendina xwe di dibistanên Helebê de bi ser kir . Dûre , di kolîja tenduristiyê li Hivatistanê ( Yogoslaviya ) xwendina xwe berdewam kir û di sala 1993 an Dîblom wergirt .
Berhemên wî yên çapkirî ev in :
1 – Kurd – miletekî bê dewlet – 1992 bi zimanê yogoslavî
2 – Berhevokek helbestan bi navê **( kelek** ) – bi zimanê yogoslavî -1994
3 – Di baweşa bagerê de – helbest – 1995

Ji bilî van , hindek berhemên xwe , yên wêjeyî û rojnamegerî di govar û rojnameyên kurdî de weşandine .

Helbestvan xwedî evînek kûr e , lê evîna wî mîna rewrewkê sawîran dişîne dîtingehê da helbestvan matmayî bimîne .

**EVÎNA MIN**

(( Ronahî û tariyê

Bi hev , lêv bi lêv
Hatine girêdan
Ev şana vejîna te ye .

Destê'm bibe bi dest
Û matmayî nenêre !
Agirên te pîroz in .

Ger tu nebiwa
Ma dê ji kesekî din bihata hezkirin ? !
Lê , ger ez nebûma
Kesekî din dê , helbet , hebûya
Bi dilketin û evînê
Porê te
Henebikra ;
Kesekî din dê amojgarî wergirta
Ûşopa Bêdawiyê – wa keça bedew
Vexwandina awirên te
Û pêlên wê yên hêç û har
Amade ne .
Emroj
Ji mêj berî îro
Pir dereng bû  îro
Dê em her pêrgî hev werin

Veguhartî
Bo xwîna buharê ,
Bêwestan
Vedigerî
Di hêmeniyê şevê de
Bi baskên meqesokên dilsoz

Ji demê kevnartir î
Ji asoyan jî dûrtir
Ji ezmên bilindtir î
Ji bin kûraniyê jî kûrtir
Li her çatreyeke nû
Durvên te yên cihêreng
Çavdêr in.
Hergavê digihêm te
Dest dirêjî hevrişma nazenîn ,
Piyala hunguv
Û herdu sêvên kûvî dikim
Dibînim
Tenê LEYLAN e !!
Leylan !
Hêşta dûrî
        Bilindî
                Kûrî
Hîç ne hêsan e hevjîna te
Divê carekê
Bo min salixdî :
Tu çi jindarî ?!
Ji te dawî dizê
Û destpêk .
Ji xwe re makî
Hem jî zêç !      )) .

Helbestvan pêjna helbestê dike , dilebite , dijene û bihna janek kûr jê difûre lê zû bizû ew xwe nasipêre jiyanê :

**BILA LAL BIMÎNE**

Tu hem helbest î
Hem jî na
Di heyameke bêxew de
Ji dayik dibû ;
Olan didan
Di guhên min de
Peyvên te
Hingê
Di giyana min de
Xwedî can û lebat bû

Ev çi ye
Nahêle bibî helbest ?
Gava di min de veşartî
Hêç û har ;
Gava hîn nenivîsandî
Dilkêş û ferîbend
Heyv bû di hembêza ezmên de ,
Mey bû di piyala jînê de .
Ronî dida şeva bêxew ,
Serxwaş dikir dilê bêbext ...
Di min de
Bi liv bû
Hîç nedigirt hêmenî
Vir de – wê de,
Li ser kêndirên dengî
Te xwe hêldikir
Ji xema şêrîn zîldida
Min haydarî ji rindiya te
Hebû ....
Ev çi ye

Nahêle bibî Helbest ?
Xewke , nûhelbestê ,
Di nav çarşefa lalî û bêdengiyê de !
Xwedyan jî nexwestine
Em hertiştî bibhîsin
Zemîn jî napeyive
Ne jî şêrînî ...
Bila lal bimînî !
Bila nediyar bimînî !
Wilo
Tenê ez
Te dinasim
Di Giyana min de jidayik bû
Têde jî mezin dibî ,
Gewre û şêrîn – derdek ....)) .

Dildar ji kodika evînê dipeyive , lê hezkirin wekî pêlên deryayê ye , bilinbûn û daketin tevlî hev e helbestvan ji ber vê yekê xemgîr e :

**HEZKIRIN**

(( Derya û stêrk jî
Dipdaro ,
Dilketiyê hev in :
Li hev dinêrin
Hevdu hêvîdikin ..
Bi dûriyê pev hatine girêdan .

Xeml û xêzê , herşev
Girêdide
Perwîna evîndar
Û porê tarî ,

Bi hesreta hevdîtinê
Sedike
Derya jê re neynike

Derya jî
Bi tiliyên , şevê ku henekirine
Sîng û memikên evîna li ezman
Dinazîne
Ta beyanî meyê dinoşe
Ji ber ;
Di baweş û hunava xwe de jî
Dipejirîne ,
Dike xew
Lê, tu carî têkilî hev nabin ... !

Çira , Xwedêyo ,
Mirov jî
Bi evîneke wilo
Dilxwaş nabe ?!)) .

rast e , dem weke hespê rewan dibûre , gava mirov pêrgî evîndarekî dibe û ew derê gencîna razên xwe , dîtin bi dîtin maç bi maç ...... , wekî despêka filmekî sînemê ji mirov re veke .
Ev jî , rewşa xwendevanê helbestên hêja kamîran e .



# *KASÎ*

Navê wî Ebdilhemîdê Mihemedê Yûsif e , li gundê Cirnikê sala 1969 an ji diya xwe re bû ye .
Kasî pir ji helbestên Cizîrî hez dike . Ioma , dema mirov helbestên wî dixwîne , mirov dipelîne ku bandora klasîkên Kurd pir lê bûye lê ya herî balkêş ew e , ku akama Mele Ehmedê Palo lê xuya ye,çi bi şêwazê xweyî hişk be , û çi bi bêjeyên xweyî gij be . Helbet , ev jî, ji jiyana helbestvan ya ji êş û kulan tije tê .

Ev yek bi hemî alav û pergalên xwe di helbesta ( **Kasî - name** ) de diyar e :

(( Li min barîne tîrên hejarî
Rêçik parîne revîn û avî
Şev pur tarîne divî bajarî

Bajarekî reş bê rûmet û ol
Bê hoş û bêheş şûna tacê sol
Roja xweş û geş kê girtî bê tol

Serê min tewa li ber nanê min
Ez ketim xewa birin danê min
Di çeênîn dewa mal û xanê min

Tasa min ji zîv nanê min ceyî
Şev ku dibê nîv wek se direyî

Leqa dil bi pîv tev ax û ayî

Ax û mixabin ji vê jîna pîs
Çi dilxerabin serokê wesîs
Lê wek kulabin li hev nabin lîs

Dil bûye çeper ji bo berê tîz
Lew bûye reper ew lîstik û lîz
Weşan por û per keder dibûn dîz

Li xan û xergan serê civîn cot
kî bû bazirgan yê tevger firot
Agir kir cergan germ bû not û not

Xweska , orojîn dîse vegerê
Li hev kevê jîn ser wê tevgerê
Şewat û sojîn bixwê lengerê

Tozek ji zengê werbe li ferat
Di asitengê şewat û perat
Werbin di cengê kuçê Ererat

Rojek ji xerbê xwiya bibê sor
Aso ku zer bê ferat bibê şor
Ev her û her bê mirin û nezor

Zanim tu kurde rengê vê xakê
Kasî pujmurde lê tim dibakê
Şivan li gurde alî te nakê

Kasî çeme çem Ferat û xabûr

Yek kul û yek xem du birînê kûr
Ser danaxin em ger ser bidin şûr )) .

Vê rewşa dijawar hiştiye ku kasî di evîna xwe de jî , bi lerz û tirs be . Ew xwe kêm dibîne , kole dibîne . Gelo , ma ev ne nîşana kilasîkeke cîgirtî ye ? .

Helbesta ( **Ez ditirsim** ) ji bo vê yekê nimûneke hêja ye :

(( Ez ditirsim ev buhara renge rengî zû herê
Ez ditirsim payiza reş di icacê vegerê
Xem û derda bi neyarî êrîşî dilêmi dan
Dil tijî girî û hêsir bûye ser wê esmerê

Sal ketin kerwanekî weke tirênek dûvdirêj
Ez di rêde bûme mestreng xwîl û xwar manende gêj
Tev ji derdê te jiyanê mû sipî bûne bilez
Ax ji bo yezdanê banî bo çi wilqa dinerê

Rengê lempê pêketî bû esmera min di semê
Enber û rîhan û misk û gul dişax û cîcemê
Nexweş û bêhêle ( kasî ) bo xwedê derman bikê
Carekê keysê bide bême tewafa kemberê

Gul hemî xunçe û pelê xwe jinû pişkiftine
Weke tizbîkê mi derd û elemê xwe suftine
Ma ku çare qet nemînî pêre carek bikenim
Ma heye mestir ji vê êş û elem û kederê

Her ku navê wê dibûrê serguhê min cenge ceng
Lerz û ta û kêferatim ser buhara renge reng
Min digo belkî bibêjî ey xebînet kasiyo
Bendewarim ew devê şêrîn bibêjî min erê

Ger yeqîn nakî tu ez sotiyê wan çavê te me
Tu yî derya û ez im winda di nav avê te me
Ma nizanî ku dil sotiyê ewê xalê me ez
Ne firyada min gihaye ta bi Rom û Mecerê

Xewn û sawêrê evînî ez birim nava reşê
Mest û serxweş kenê teyî şêrîn im mehweşê
Sewesî bûme ji ber te gunehê min ku çiye
Vê buharê li mi dîse neke çaxê zecerê ))

Ahengeke levhatî di helbesta kasî de peyda dibe , nemaze , çaxê ew bi serbilindî ji hest û giyanê xwe daxive .

Ev rûmetiya keçîn li cem helbestvanên rastgo , bitenê heye .

Li helbesta ( **Ez Ristevanim .... Tiştekî min tine** ) binêrin û bi vî pesnê ciwan şa bibin :
(( Dilber eger dûrî mibê
Çibikim ji lêva wek şekir

Piştî gurî keçel nebû
Xurha serî tobe nekir

Pîne çine çibkim jiwa
Vaye herîr min li xwe kir

Destê xwe di qelşa meke
Kesê bi hiş wisa nekir

Piştî we gul daye kerê
Xunçe bi zîtirka vekir

Her gotinê erzan nede
Weke dizê bangî sekir

Bê çek neçe dest û çiya
Belkî gura berzî te kir

Dil nekeve qîzê bedew
Yek qîzekê fedî nekir

Bawer nekî meger ji min
Tuyî pezê gur xewlekir

Çi fêde da mirî kesê
Hat û serê mirî şekir

Qiloç ji wî re çê dibin
Wek mezinan yê ku nekir

Her kes bi zêra daketin
Hinka xwe di warê sekir

Her kes bi dest çarek heye
Tenha mi xame peydekir

Can û dirav mi li ser kirin
Bûme weke  Aba Bekir

Lew me di ristevaniyê
Li herkesî me zêdekir )) .

Helbestvanê me kasî bi xurtî xwe tevlî gêra kilasiyê kiriye , durf û sincên wê jî , hebmêz kirine , ew jî bi hêviye ku karibe , li gor karînên xwe , toreya kurd, bi pêş de bide .

Ma ku em bêjin ku kasî dîwana xweyî pêşî sala 1998 an bi navê ( Ferat wilo peyivî ) belav kiriye .



## *KEÇA KURD*

Navê wê Emîna Mehmûd e , di sala 1944 an de li gundê Til xelîl hatiye dinyayê .

Bi rastî keça kurd hişzengîn e , bi kûrbînî xwe ava kiriye û çavkaniyên toreya kurdî ji xwe re kirine berbejn , ew bi hêviye ku wê ev dana wê ya bê sînor li valahiyê têk neçe .

Di sêsedsaliya Mem û Zîna Ehmedê Xanî de torevana hêja keça kurd xwe dibîne dilsoz ji riya Xanî re surişt û sincên wî dide xuyakirin . Navê helbesta wê ( **Dilopek ji Derya Xanî** ) ye :

(( Li koçka Ehemedê Xanî
Çira gotin ezê pêxim
Li dîwarê Mem û Zîn ê hilawêşim
Şevê ez pê bikim rehnî

Ji rengê gulşen û reyhan
Sepolên reng û awazan
Li ser dêma ciwanî tev
Nizanim ka çi awayî bihîvêzim
Ji reng û rûçikê îro
Dilê min ku dirêjê xwîn,
Birîndarim ,
Weşim bêjim
Li vê derya pesidarî ne soba û ne hişyarim
Çikû Zanim ,
Ku robarek neqişbazî
Ji bejna Ehemedê Xanî
Li bejna min ne ew borê
Ku ez lêdim
Weşim bêjim
Ji goranî li vê bestê ne serbestim
Çilo karim li fincana xwe ez deynim ,
Bi hêsanî bidim hevdû ,
Bi hejmêrim ,
Hemî peşkên di barane ....?
Çilo karim ,
Dilê derya bi mista xwe biçirkênim ?
Erê Xanî piçûkim ez .
Li awêna te ez demê xwe nabînim
Li rû heyvan çiraya ber Gelawêjan
Çilo pêxim ?
Çirîsoke li destê min
Erê hêja ...!
Bi mûmek dê çi rehnîkim
Rûye roja
Li " Botan " û li ser " Cûdî "

Te rehnî da bilindhî rûwê tarî
Erê Xanî !
Te Xanî bo me avakir
Bi kurmancî te diwarê ziman lêkir .
Li hevrîşmê ziman zanî
Gelêrî bo me nîşankir .
Zevî hişka biharek nû te kêlabû
Li dîrokê berî her kes
Gula pêşî li vîna gel .
Welat û xak
Li ser sînga xwe danîbû
Erê Xanî !
Çivîkên bawerî lavan
Ji nav turra delavên dil te berdabûn
Li banî jor pelê hewran kirin hêlîn
Ji dosava Qesaran û
Ji lêlava sipîberfa dilovanî
Bi tehnêt vexwarin av
Ji tîrêjên hemî rengan
Ji bo taca Mem û Zînê
Çinîbûn xweş
Kevane pelke – zerînê ...
Erê Xanî ...!
Te kolabû çemê vînê , cihok û şop
Lehî avên welatê min
Li hevk û tev çîrokî
Vexwarin tev delavên dil , çemê vînê
Evîndarî Mem û Zînê
Ji ava dil , ji xuhdan û
Ji rengê simbilê bê nav
Ji aha nav dilê Dicle

Wekî sazek li dest pêla
Bilûra bilbilê xemgîn
Evîn û jîn .....
Hejêkirin û xweşî û kîn
Sirûdek bû li ser têla
Mûsîqarî du dildaran te hûna bû
Mem û Zîna ji kevnarî
Li dîdarê welat û gel te anî rû
Welatnasî
Li helbest neqşkêşa Bi dîrokî te kola bû
li dîwarê zeman danî
Erê xanî!
Erê xanî ! )) .

Helbestvana me rola zana û nemirên welêt dizane , ji ber nifşên nû hertim gerekî xalên ronîdayî ji dîroka xwe ne Osman Sebrî yek ji wan nemirên ku temenê xwe kire qurbanî tore û mijara kurdî .

Keça kurd li hember gora wî radiweste û bang dike:
(( Li ser pira xebatkarî
Pêrgî hevbûn
Ez piçûk û
Tû pêşewa
Li neynika vîna welat
Dersek te da
Wek perava rûyê rojê
Rehî dida
Rast û rewa
Ew bîr û ar
Bi xwîna dil min ew çinî
Li peey şopa te ez diçûm
Hêjî diçim

Dost û heval
Ez mzin bûm
Tu bû yî kal
Baxê te çand
Roj lê neda
Lê hişk nebû
Bi wê xwîna
Ku me pir da
Wê şîn bibe
Wê şîn bibe    ))

Torevana me , niha li Elmanyayê dijî û hîna ew rêça xwe berdewam dike .



# *KONÊ REŞ*

Konê Reş , nivîskarekî kurdî hêja ye , navê wî di pişt qonaxa cegerxwîn , Osman Sebrî , Namî bi xurtî ketiye çapemenî û pirtûkên kurdî de .

Navê wî Selman Osman e , di sala 1953 an de li gundê Doda nêzî Qamişlo hatiye dinê .

Wî di gelek govarên kurdî de nivîsiye mîna : Riya Taze , Hêvî - Serwe – Armanc – Welat – Metîn û Raman .

Di sala 1998 an de dezgehê herêma kurdistanê ( ya başûr , ango ya Iraqê ) ew bi nîşaneke ji zêr xelat kiriye .

Pirtûkên konê Reş yên çapkirî ev in :

1 – Serpêhatiyên mîran – 1991
2 – Sîpan û jînê – helbestên zarokan – 1993
3 - Şagirtê Bedirxan – helbestên zarokan – 1996
4 – Osman Sebrî - 1997
5 – Welato – helbest – 1998
6 – Mîr Celadet Bedir xan – 1992 bi Erebî - 1997 bi kurdî
7 – Raperîna Sasûnê – 1995 bi Erebî .

Nivîskar konê Reş bê tebat gera xwe di kelepûra kurdî de didûmîne , lê xala herî balkêş li cem wî ew e , ew bi xurtî xwe tevlî taybetiyên netewa kurd dike . Helbet ev jî bi zimanê kurdî ve girêgdayî ye , Yê ku Bedir–xaniyan ala wî hildane jor .têkliya Mamosta Konê Reş bê sînor bi kelepûra Bedirxaniyan re heye , lê tiştê herî giring li cem wî dilsoziya bi zimanê bav û kalan re ye .Ji ber vê jî , wî di sala 1989an de , bi nivîskar Ebidelbaqî Elhuseynî re , govara ( **Gurzek Gul** ) derxistiye .

Ew di helbestên xwe de , pir nêzî dilê zarokan dibe , riya zanîn û pêşketinê şanî wan dike .

Ew di helbesta ( şagirtên Dibistanê ) de dibêje :

***1***

(( Rê bigre “ sîpan “
Şagirtê dibistan

Yek , dido, sisê
Rab ji xew sibê

Bişo ser û çav
Bik tevger û gav

Porê xwe bişkîn
L'xwek berdilka şîn

Pak û paqiz be
Rind û dilgeş be

Rê bigre “ sîpan “
Şagirtê dibistan

-

-

- ***2-***

Çar û pênc û şeş
Li rê xweş bi meş

Tev dost û heval
Bê ziyan û qal

Dibistan pir xweş
Lê hîn be rûgeş

L'mamoste binêr
Ser ber nede jêr

Bi bîr û bawer
Nas dibe cewher

Rê bigre “ sîpan “
Şagirtê dibistan

- ***3 –***

Heft û heşt û neh
Sal diwanzdeh meh

Her sê dem salek
Her yek bi rengek

Demsalek havîn
Têd bilîz bikîn

Dû de tê payîz
Ba di lîze fîz

Yek xweşe buhar
Gula salê adar )) .

Ew dilsozê hevpişka jiyana xwe ye , piştî çar salan ji koçkirina wê ew wê bi bîr tîne û bang dike : Sê Helbest

-
- ***1*** –

Jiyan xweristî derbas dibe ....
Her tişt wek xwe
Bê destan maye
Baholên di ser dûlaba kuncan re ,
Tabloyên bi hêt ve daliqandî,
Kulîna livînan û
Makîneya dirûnê ...
Her tişt bê destan
Wek xwe maye
Lê darên di hewşa me de
Mezin bûne
“ Jîn “ fistanê te li xwe dike ,
“ Nalîn “ bilûz û “ celadet “ jî
Li – biskilêt – siwar dibe
Tevî ku tişt wek xwe maye
Gelek tişt jî ,
Xweristî mezin bûn û hatin guhartin
Erê xweristî
Mane jiyan xweristî derbas
Dibe ?

- ***2*** –

Gulîstanê !
Gulîstanê !
Gelo tu zanî
Navê vê kelehê çiye ?
Ev keleha ku du mîr
Li ser şer dikin
Hev diwestînin

Her yek ji wan dixwaze
Vê kelehê ji xwe re
Rizgar bike ......
Ev keleh cîranê
Ba , bagoz û lerezîna ye
Gelo te navê vê kelehê
Naskir an na ?!
Ev kelek ,
Navê wê Gulîstanê ye.

- ***3*** –

Çawa te dergehê dilê min vekir
Va çar sal derbas bûn
Û hêj bayê evînê dilê min
Derbas nekir
Dil dergehê xwe
Ji evîna tukesî re
Venekir
Gelekan li dergehê dil dan ,
Hewildan ku dil
Derê xwe ji wan re veke

Lê dil xwe keroke kir ...
Gelekan xwe şêrîn kirin ,
Gotin û şorên evîndariyê
Bi ser min de werkirin
Dîsa dil li wan nevegerand
Û xwe laloke kir....
Gelekan xwestin
Bi awirên çavan
Dergehê dil vekin
Û tevî ku dil jenya , ponijî û
Milalekir
Lê tu akama xwe li dil nekir
Û dil xwe keroke kir.....
Gulîstanê !
Bi tenê te dergehê dilê min
Vekir
Ez dibêjim qey tu sêhirdarî !
Bi xwedêkî bêje min :
Çima te vekir , çawa te vekir.)) .

Mamosta konê Reş , wek rawşenbîrekî kurd hîna li ser soza xwe ye , dana wî pirtir û zengîntir dibe .



## *KOVÎ*

Navê wî Hefîz Ebdurehman e , Mamosta Kovî pir di çapemeniya kurdî de xebitiye , û roleke wî yî giring di derxistina govara Aso de hebû .

Ji bilî karê wî yî rojnamevanî wî gelek helbestên hêja nivîsîne .

Helbesta wî ( **Xêzin ne birînpêç kirî** ) nimûneke hêja ye .

((  Sojiyeke ,
Tehlîşka qermîçokê vê tariyê
Nayê qurpandin
Keziyên riswakirinê
Bi ser tazîbûna termê min de
Ber dide ,
Kêmasîyên
Bedewiya xwedayetî tewa dike .
Birînên min
Kalanin naveser in
Bi sarî şûra diçûn ,
Û şûr
Ne pêçê " Mesîh" in

Birînên min
Rûpelin dîrokêyî tirşbûyî
Her dem di “ bêlimêjiya” de ne
Nûtîvanên min
Ji xaleke dilbijandinê
Di navrana xwe de
Nerînên min ,
Ramanên min di xesînin
Gerdûnê min li xwe mehr dikin
Li hev par dikin
Şabaş .......şabaş
Ji mêraniya mêran re
Şabaş ........şabaş
Ji mêraniya nêran re
Şabaş ...........
Ji qezinckirina leylaneke
Bedrw re
Ji bedewîkirina kevzeke
Demûşî re !
Ji demûşkirina re
Min di pîvin
kohê abrûdariyê
Di bin pîkola simê wan de
Kol dobe !
Û ez dimînim “ bihnokeke”
Ne bikêr hatî di hevokeke kirêt de
Yan “ pirsnîşanek”
Dawiya hevokekê stewrÎ
îne dikim
Ji nûçkê mirinekê
Dinivîsim .

Di fîşekeke xilmetkirî de
Bang dikim .
Ev lavija min e ,
di guhê “ Cûdî” de di xwînim .
Ev zorîna min e ,
Bi kîn ,
Li ruwê “ Zagros” dixim .
Ho “ Nemrûd” ê mezin
Te hay jê heye ?
Cînişînên “ Heştê”
Li kerê “ Lût “ siwar in
Xwe lê girtine ,
Ji dergehê peytextan
Pars dikin .
Û paşiya wan
Bi muhrê “ bi der kirin” ê
Hatiye xemilandin .
Lê tîpên “ dengdar”
Digewriya “ Nemrûd” de
Miçiqîne ,
Û “ bêdeng” di dawa wî de ,
Bi riya wî şa dibin ,
Rûmeta xilmaş
Li şûna segê “ Ehlilkhf”
Li ber dergehê
Windabûna qotîkkirî
Di lorînin
Di nivînin .
Û
ji mêj .... ve
Kerwanê “ Medyanî” buhirtiye

Lê hîn jî
“ Yûsif “ê bendewar
Di binê “ çalê de
Bi Ayetil kongres”
Bi xapînin .      ))  .

-------------------------------------

## *LAWKÊ HACÎ*

Di pirtûka xwe de ya bi navê ( wiha ji Dîrokê re dinivîsînim ) 1998 an , helbestvan Lawkê Hacî bi du awayan helbestên xwe
dihûne : Awayê kêşsaz : yê helbestvan tê de germtir û jêhatîtir tê xuyanî . Awayê serbest : Ew jî kêm wêne ye , Helbesta ( **jarê jînê** ) kêşsaz e rewşa kurdan tê de hatiye berçav kirin :

(( Dil nake govend û sema
jarim ez her çax û dema
jîyan mi diberêje çima
Ez im derya kul û xema
Dileriz im ji berfa pûk
ji fîz fîza bayê çirûk
Dayî şevê şewqa xwe kûp
li ser cara mame pepûk
Pirên jîrên me çile
lewra go çavên me şile
Cejnê me tev bi kule
Dewla kurda moxile
Ez im evîna welat
kewa li zinar û lat
Qeyîka zab û ferat

ji kê re bûme xelat
Ez pêlê Ehmedê xan
helbesta Feqê Teyran
Xwîna hemû pakrewan
bo mi ev ceng û lêdan
Vaye ewr û asîman
şîn bûye terhê daran
Deryê xweş daye pêlan
ka dastê mîy niştiman ."

Di helbesta ( **Mala min** ) de, ew dixwaze li ser mala xwe biaxife , lê dema ew dibîne ku rewşa mala wî tevlî hev bûye rewşa welatê wî ya şepirze jî tê bîra wî :

(( Bandikim bi dengê bilind
Kanî av ?
Kanî nav ?
Kanî cilê mi ?
Kes guh nade gotinê mi !
Bavo çibûye disan li mala mi
Dengê qerebalix û pevçûnê tê
Wax ....hawar ......hawar
Çi xulîyê li serê xwe bikim
Bira bi sînga birê girtîye ?
Çi şerî bi hev rex dikin
Dê xebera ji keça xwe re dide - keç bê şerm li dayîka vedgerîne
Hundir tar û mare
Her firaxek li cîyekî ye
Zarok digrîn ser çav qilêrîne
Ev çi jiyane
Aştîxwazna
Rewşa mala min wek rewşa

welatê mine )) .
Em bihêvîne ku di pêşerojê de wê helbestvan karibe bi awakî bilindtir ji jankêşana xwe û ya gelê xwe biaxife , lê weke ew dibêje her tişt bi qelen e :
(( Ezê xwe bişewitînim , weke findekê
Û tu jî weke mûmekê
Û bi hev re
Ronî bidin welatê xwe )) .



## *LEWENDÊ DALÎNÎ*

Navê wî Sêf Daoud de , sala 1958 an li Qamişlo ji dayîka xwe re bûye . Bekaloryos di ciyûfîzya û gera li petrolê sitandiye .
Gelek lêkolîn di warê petrol , gaz û avê de çêkirine .

Mamosta Lewend li ser destê seydayê Cegerxwîn hînî Abêya kûrdî bûye , Berhemên wî ( helbest û çîrok ) di van kovaran de belav bûne :
Armanc – Nûdem – Pirs – Almuseqef Elteqadumî - Bihar – pirtûka ( Agahiya netewî di Mem û Zîna Ehmedê Xanî ) de wergerand û belav kiriye , sala 1995 an .

Dîwanek wî yî helbestî binavê ( Hêwa ) di bin çapê de ye .

Bibûrîna sêsed salî di ser dastana Mem û Zînê re .
Helbestvan dixwaze li ser sincên xwedanê wê Ehmedê Xanî raweste :

**Ehmedê Xanî**

(( Ey suxteyê jar û reben , çima wilo mestane ye
Li pêşberî Mîrê mezin , ser tewandî bi şermeye
L'zanîngeh û hicrên mela , xwendî te ((Îlmê )) mîm û la
Rûnanî tû l'birc û sera , l'ber dîwara şerpezeye

* * *

Ez di (( Nezmê )) de çi deynim , ew bi sistî û kêmî ye
Kû di pesnê de çi bêjim , ne bûhayê xanî ye
Zar û ferhernga m'gelse , şermedar ne yîvî
Xameya min jî nikarî , pêşte qet ew bilivî
Elfeba min nakê pîvan , navê giran Ehmedî
Gotinê pîvanê çêkê , bo te seyda sermedî
Navê te l' nêk kurd bilinde , giştî ber textê mûbîn
Ew dijî nêv wan bi rengê , (( **nûbûharê** )) û (( **Mem û Zîn** ))
Sêsedê sala qedabû , tevna warê me te rist
Lê mixabin her me hûnî , xav di hatî yan jî sist
Ew çiyayê çanda asê , rê kola j'mer pêpelûk
Hîn di gava yekemîn de , dikne pîkol wek pepûk
Ez di (( Mihraba )) te mîrî , tême sucdê gav bi gav
Pê hewesa xwe di bînim , her di borin çax û gav
Ger bi sohtim laş seranser , pêş te nadî ronîyek
Lê di wan baxên te çandin , belkî bibme çuqlîyek

* * *

Milletim va dîsa dijmin ted gerînê çerx û aş
Tanî kengî jêre aş bî , ew li dergeh te qeraş
Sed gelên wek me bi cihbûn , bê xwedî em tenha man .
Kevr û ber tevda birîbûn , carrekê em neghane dam

Tim li cenga rojhilatê , em dibin nîşan û kêl
Rast û çep wêran dibin em , .ar ûû gund û mal û êl
Arê xasuma me gurr bû , me nema yek ( ÎTÎFAQ )
Dest bidest êş dabû canî , laş wezakir çerm û laq
Bû brînek kûr di dil de , ketbû nêva wî pereng
Min dixwest ez wê veşêrim , kêferat bimrî bê deng
Xwîna dil rijîbû xakê , lê carkê din wê derbê der
Wê bi rengê sing û pîjan , çavê dijmin bînê der

*            *            *

Dest bidin hev bibne banî , doza xanî a ji mêj
Ber bibê Ferzak xwedanî , rengê parêz û limêj
Wek bahoz û berq û bayê , bidne dûv wê bermedin
Mane şerme tanî îro , rêncberê tim bê kedin
Av bidin xakê seranser , tim bi xwîna germ û sor
Qada xwe em pê cuda kin , sênc û bendan bidne dor
Kuştim û talanîya hev , ko bibin ew bome doz
Xweş bi bawer bin kû dîsa , dê bidin pey kerê boz
Pir wekî min ew di vê rê , mane diljan û geda
Bû sedem kû hîn b'ciwanî , rih ji canêm bû cuda))

Helbestvan li biyaniyê , Hêwa bi bîr tîne û bi dîrokê sermest dibe li heyîna xwe dipirse ? lê riwê nîran reş be , bêwelatî nexweş e !

**HÊWA**

Stêra sibehê min dî , di herdû dêmîn Hêwa de
Di enyê de dibînim ez , paytextê Mîd û Mîtana

Dû zab û Decle û Fûrat , di derya çavên Hêwa de
Sipî û kesk û sor û zer , di nêv pêlan de reng dana

Bûhişta ÎREM ê min dî , di tayê bejina Hêwa de

Di nêv deşta Rûb' lXalî , lin min tê bayê Zozana !
Didê min ew BRODKAST ê , ji nêk Zînê di Botan de
Bi xemil û xêzê wê' d bînim , bi hikmê Hîvê Însana
Sîpan û Mazî û Cûdî , di zend û bendê Hêwa de
Ji lêvên Hêwa dibhîzim , dû zarê Zaz û Lorana !

Çikim Îro ji gerdûnê , kû nînim xaka Hêwa yê
Çîhan tevde li min tenge , wekî Sirgûn û Zindana)) .

Tevlî wan nîrên dijwar , evînê kilîlê xwe bi ser hêviyên helbestvan de berdaye û jê re dike piste pist . lê evîna wî jî , xapçî derdikeve :

**DÎSA**

(( Ji NÛRA XALIQÊ Insan , medî hîv bû dicî dîsa
Ji sala çardeha û virde , Bû yek jê dîlberam dîsa!

Ji saz û awazên berê , Li guh tê dengê dîlberê
Ji Tevna destên Esmerê , Li min tor wergerî dîsa

Ji bîna dîlbera gulav , Li min barî hûr hûr xunav
Pêr pêr vebû cerg û hinav , ji nêv dil pişkivî dîsa !

Wey Esmerê tew dîlberê , Ronîya mûma Qederê
Wek çaxên govendên berê , Sed çiv tên bejna wê dîsa !

Hey dîlbera wek sosinê , Xalên di reş li gerdenê
Di derya çavên te' b tenê , Ez keteme nêv pêlan dîsa !

Helbesta jîn û giyanî , belavkir tev li ser canî
Ji zindan derkirim banî , Li min jîn vejinî dîsa !

Ey QAFÎYA çewt û leçek , Wey helbesta xav kêm zemek !
Di pesnê dîlbera Melek , Kengî tê rast bibî dîsa !)) .



## *MELE EHMEDÊ PALO*

Navê wî Ehmed e Kurê Mihemedê Mustefê ye , sala 1920 an li gundê Sêra çûr , koka çiyayê sipî , kurdistana bakur hatiye ser rûyê xakê . wî dê û bavê xwe nedîne , sêwî li cem dapîr û apan xwedî bûye , piştî temenê wî bûye pazdeh salî binxet bûye û li gelek gundan geraye ta li gundê Wêsikê rûniştiye . wî dest bi xwendinê kiriye û di sala 1948 an de bûye mela û di vê salê de yekemîn helbesta xweyî kurdî nivîsî ye .

Di sala 1955 an de ew bûye endamê komela ( Zanistî û alîkariya kurd ) û hevt salan gavantî kiriye , piştre çûye ( Xizna ) û wî melatî li van gandan kiriye : Oslo – Bilê – Xirbê Hisî û bi van zimanan dizane : kurdî , Tirkî , Erebî û Farisî .

Heşt pirtûkên wî hene , lê yeke tenê çap bûye , ew jî , bi navê ( Dewr û gera kurdistanê ) ye .

Di roja nihê gulanê sala 1991 ê de ew ber bi dilovaniya xwedê çûye . Melayê Palo gelekî li nav gund , newal û çiyayên welêt geriya ye û bi zanistî êş û derdê wî

naskiriye , wiha wî xwe dijî xişt û nivîştan dîtiye . Ew di ( Gera welat ) de dibêje :

Carekê hatî gumanim dakevim warê biha
Ka gelo ez sermiyanim ew gula qad û ciha ?
Ya hejar û bê xwedanim mame ber tîrê ziha ?
Raserê çol û çiyanim benda warim nagiha
Dicle û ava Furatê ku diçin warê neyar
Jor û Hevraz û kelatê cîgehê ceng û hewar
Senger û derbend û latê şop û rêçê burc û xar
Merkez û kom û civatê pehlewan û xwendewer
Da bibînim warê bava rind û şêrîn û delal
Ronî daye rengê tava hêrik û deşt û newal
Her dem û dewran û gava jê derin avê zelal
Kungera kar û delava gewher û dur lual
Hêdî hêdî ber bi gundan daketim mame tenê
Her dibînim mar û kundan tu mirov tê nabê hê
Xênê serşaş û qulingan hatine hev xişt û kê
Ber bi dewrbend û zivingan bê gumanê da ye rê
Rengê dîna ez dinêrim dewr û madorê welat
Tu dibê qey ez newêrim xwe bighînim rojhilat ?
Koh û berpal û zinêrim tev dibin ar û şewat
Ger çiqes şêr û dilêrim her divê kar û xebat
Pêlekî ber bi zinara sirt û kendal û devî
Berqef û gor û mezara kort û koncal û kevî
Şitlê bax û dehl û dara tûmê ser erd û zevî
Çir tenê mame di para nîne dad û wek hevî ?
Xulxula avê çemane pel ji dara hilweşîn
Ez dibînim bê xudane bê civat û bê civîn
Colê pez tev colê mane bêrîvan ber derd û vîn
Leşkerê dijmin xuyane tev xudanê zar û kîn
Bêrîvan kanî li kû ye qet xuya nabê şivan ?

Kes tunîne bêjî dûye jar û bindest û nezan
Dewra min burkan vebûye vane em navê diman
Ew dema kevnare çûye ev dema topê giran
Cok û kanî mêrg û zozan bê sewal û koç û kar
Hêrik û derbend û meydan Kungura hov û dewar
Ê ku jê ne mane bê nan par û pişt û tar û mar
Herne kû jar û perîşan dîlê destê koledar
Erdê çolê tev beyarin bê berin bistan û dar
Dijmin û bê cî li karin raserê lat û zinar
Êrîş lêdan û xaran bê hedan û bê qirar
Ejdehak û koremarin bo me kurda bendewar .

Tevna zimanî di helbestên Melayê Palo de hevgirtî ye , tevlû ku di deqna de , bêjeyên bi yekwateyê bikar tîne mîna : çal , Korta û Newal . Wêneyên wî yî hinerî jî , pir kêm in , awarete di wan helbestên ku li ser ger , jarî û kulên dilê xwe peyivye . ji bilî vê nîşanê nîşaneke dî heye , ew jî dubarekirina mijarê ye , wekî em dizanin mijara sereke di helbestên wî de , perîşanî , xizanî û melûli ye . Ew di (cihê min ber dida xwînê ) de dibêje :

Çira ya dewletê pêket cihê min ber dida xwînê
Diva ya rûmetê rê ket gelê min ber dida kînê
Bi xişt û teplik û soza xuya bûye li dîwanê
Bi bend û pîs û tolaza berî daye li xerçînê
Bi hov û bê ked û kara bi dîn û dîl û bin dara
Bi sist û gêj û ser sara berî daye li kadînê
Cihan tevde xudî zare civat û merkez û kare
Tenê warim birîndare diçe ber nan û birçîne
Ji binava tête dêranê ne nokaye dide canê
Di sirgum û di fermanê di kêşe û kuştin û şînê
Melûl û jar û bê çare tim û tim ber şek û dare
Hejarê destê bê are qe nagêjî tu mizgînî ?

Serî ber jêr û balaye bi ramana girêda ye
Tenê bê par û tataye qe carê na gî hevdînê ?
Ji bo xwe nakî tevdîrê di rav û seyd nêçîrê
Bi şûr û xencer û kêrê dike dîdar û nêrînê
Ketî ber top û sarûxa kesek na bînî yazûka
Hemî bê rûmet û rûxa didêrin bêndera dîne
Dibêjin em mislimanin ji bo me kûra derdanin
Dinê de em perîşanin dixwînin bendê amînê
Gelê min bê ked û kare belengaz û sitembare
Gelê dewra me huşyare gihişte heyve û perwîzê

Çilo be , Palo dimîne yekî dilsoz ne tenê ji gund , çiya û êlên ku li wan geriya ye û naskirine , lê nêrînek wî yî netewî heye ,ew tê de welatparêzekî hêja tê xuyakirin .

Navên çiyayên kurdistanê dijmêre , surişta wan jî , dide xuya kirin.

Banga wî ji êlên kurdistanê re yên wan çêl dike nêzî şêst û şeş ( 66 ) êla ye , ewe , ku destên xwe bidin hev , li rex hevbin û hertim hestê netewî divê ji bîr nekin .

Ji ber ( Dûrkirina çend mezinên Bedlîsê ) Palo pir xemgîn e , hestê wî yî netewî diherike û di vê helbestê de dibêjê :

(( Ji te sergûm kirin pir mela û şêx û begler
Kirin qefle , kirin bir edîb û mîr û serwer
Didane ber gem û dar berî dane Anadol
Birin bê çek sera ser di dane ber pî yû sol
Di gel bav û keçê û dê kur û ap û birader
Bi agir hin kirin kê ji cî tevde kirin der
Di gel lêdan û kuştin birçî bûn û hejarî
Li ber sator û xiştin jev kirin parî parî
Binê Sadûn û Gulşen di Asparta dinalin
Kirin hebsê , kirin ben ji çavan xwîn dimalin

Mele se'îd efendî — di Aspata nexwşe
Di bê Hemdî efendî — di dilda xem dinoşe
Were cem min birader — navê xwe têxe lîstê
Da em hemî bera ber — herin baxê buhîştê
Ji berdora were derbi — min ra her binale
Binê yarê dilawer — kekê te pîr û kale
Efîf kanî li kû ye — şehîdê heyderanî
Xortê çeleng û nû ye — wekî şêr û beranî
Xwe da kuştin ji bo me — ji bona dîn û dewlet
Di da hiştin ji bo me — welat û nav û rûmet
Reşîd axa di gorê — nexweş û dilbirîne
Civatek dane dorê — dibê qê ejnebîne
Ji nesredîn bi pirse — çima tu pir dinalî
Gelo ew dil bi tirse — we ya ma bê hevalî ?
Di bê ez dilbirînim — ji ber doza welatê
Nexweş û mest û dînim — ji ber gel û felatê
Nizanim ev çi derde — tenê li ser me kare ?
Bûye zinar û perde — ronî ne kar û bare
Çilo xelkê cîhanê — xudî zar û zimanin ?
Berî dane jiyanê — em bê hiş û nezanin
Eve ku ez dinalim — nexweş û dilbirînim
Çiko bê zar û lalim — bê xwendin û bê hînim
Xebat û berlemanim — kitêb û tîp û name
Civîn û xwendevanim — felat û çep û xame )).



## *MELE NÛRÎYÊ HESARÎ*

Navê wî Nûriyê mele Yûsiv e , di sala 1934 an de li gundê Hesarê hatiye dinê , di heştsaliya xwe de bavê wî ew hînî Quranê kiriye .
Piştre ew çûye Tilme'rûf û deh salan xwendiye . Ew bûye mela û melatî li van gundan kiriye: ( Mehmûdiye ) , Letîfa , Til hisin hisêbn , û Eerade .

Di sihsaliya xwe de wî dest bi nivîsna helbestan kiriye û xwestiye li ser pir cûreyên torê raweste lê mixabin ji hemî nivîsarên wî dido tenê hatine çapkirin , ew jî ev in :
1 - Şoreşa Berzanî - helbest – 1995
2 – Zevîyek Gazîndan – helbest – 1999

Mele Nûrî ji sala 1967 an ve li Qamişlo dirûne , lê rûyê demê reş be lingê wî pûçbûne , lê vê jî nikarîbû wî ji armanca wî dûr bike .
Ew bi sê zimanan dizane , kurdî , Erebî û Farisî . Xwênerê helbestên mele Nûrî dizane ku ew helbestvanekî mezin e şopa yên berî xwe , mîna Cizîrî , Teyra , û Xanî girtiye , tevlû ku ew dixwaze ku taybetiyên xwe eşkere bike .

Di pirtûka yekemîn de , helbestvan xwestiye li ser jiyana Berzaniyê nemir raweste , ew dixwaze wî û kurdîtiyê hevsûyê hevke , Ango wan bi yek wateyê bibîne .

Ew di helbesta ( Hisxuta Berzanî ..... zend û bendê vî welatî ? ) dibêje :

(( Zend û bendê vî welatî Mustefa serkanê knrd
Peyrewê sûbar û Madî hinder û talanê kurd
Lez û bahoza neyara padîşahê min tiwî
Tu li ber top û firoka perde û sîwanê kurd
Restem û Gurgîn û Kawa keyqebadê Mîdiya
Tev dibêjin Mustefa ye şûr û hem kalanê kurd
Agî û Cûdî û Toros tev li Sîpanê xelat
Tev li ber bendê ewîne ta biçî Îran ê kurd
Tev bi wî em serfirazin hêviya kurda ewe
Şêrgelê roja qewamê qad û hem esman ê kurd
Awirê şêr û pilingan kû di dî hêzê neyar
Wek pelê daran diraxî ew li ber nîşanê kurd
Sed hezar pêşmerge ê kurd her li dergahê tene
wek birûska asîmanî şewq didin cîhanê kurd
Kurd û kurdistan seraser tev li ber ala te ne
Tu bilez hatî hewar û gazî û halanê kurd
Şewq li Berzanê bela kir pêtiya wî da welat
Hem di nîv cerg û şerade her tiwî şapanê kurd
Ez bi heyrana serê te şehriyarê qehreman
Serewer û şahê Gelale her tiwî xaqanê kurd
Her bijî bavê me kurda ta cîhan ava hebî
Her çaxan hebî tu Restem û hem Xanê kurd )) .

Di helbesta ( Teplinge bo Berzanî Mustefa her hebî ) ew têkliya vî pêşewayê netewî bi gel re şirove dike . Ew her û her dibîne ku dilsozî xurtirîn pêwendiye di navbera wande:

(( Her bijî Mustefa ew li pişta me ye
Vê dema dil bi kul ew buhişta me ye
Êş di çav ger hebî ew nivişta me ye

Bûye rewşa welat ew surişta me ye
Mnstefa her hebî serwer û qehreman
Rêberê kurd ewe bo welat her deman
Bûne serbest bi te şargeh û germiyan
Bû buhişt ev welat lê naman her ziyan
Çêtir tu li ba min ji bav û diyan
Kuştiyê kurd hemû bûn bi çav û giyan
Mustafa ....
Bo me hey Mustefa her tiwî top û teng
Va li cîhan bela bû ji bona te deng
Kû ti hatî çiya bûn gulê renge reng
Mustefa....
Deng li kurda bike ew li bendê te ne
Kurd hemû vê demê zend û pendê te ne
Bo te em bê çekin kolemendê te ne
Leşkerê lek bi lek peyrewendê te ne
Mustefa ... )) .

Wiha tê xuyanî ku seydayê mele Nûrî di avakirina helbestî de pir jêhatiye , nemaze kît û pêlawazên wî tekûz û hevgirtîn e .

Di berhevoka wîyî diwemîn de ev nîşan eşkeretir berz dibe bi taybet dema ew li ser mijarê netewî diaxive , wekî cejna ( **Newroz** ) ê ya ku sernavê vê helbestê ye :

(( Oîza ciwan û gulperî
Şewq û şemal xweserî
Ger tu dixazî koçerî
Mizgîn didim va bû bihar
Dakev ji wê asêgehê
Adar giha roja nehê
serbest were vê bergehê
Bê tirs li ber çavê neyar

Navê te nûroja meye
Qîza ciwanê kawaye
Tû her li ser benga xweye
Cîhan bibî havîn û sar
Bendî tene pir qehreman
Kom bûn li ber av û çeman
Piştî ti çû ew pey te man
Em tev ji xewnê bûn şiyar
Şelûl û bilbil bûne ref
Hespa cîhan tev kirne kef
Saz û bilûr û ney û def
Cerga dikin serxoş û har
Hawîr ciwan û leşkerin
Bo dijmina xweş hemberin
Bi top û teng û qemberin
Îro hemû hatin hewar
Daniş li vê çola mezin
Av û gulistan û rezin
Kêf û sema cerg û bezin
Windakirin deşt û diyar
Tû guh bide van gaziya
Beske delal û naziya
Pêk bêne van daxwaziya
Kerr ke fîxan û zare – zar
Xortê te bûne serfiraz
Wê bo te deynin hey niyaz
Hildane çeng û herdû baz
Rim nabî winda der kewar
Qîz radijin gurzê gula
Navê te danîn ser mila
Wergirtine rengê cila

Serjêdikin berx û dewar
Zindan di anîna teye
Lêdan di danîna teye
Kuştin di ayîna teye
Em guh li wan nakin ti car
Ger tû bi roj danekevî
Em hem di tar û hem şevê
mêr ji dilber na revî
Ger sêpîya wî bikne kar
Bo te me dîne pir birîn
Bû çem li qadê av û xwîn
Ti li ber devê çem bûye şîn
Ew çem ziwa nabî ti car
Tû di hatî şêrin heşkerî
Îro çima ti li pey derî
Bo te wiha naçî serî
Çû ew dem û ew koledar
Tarî diçû mîm bûye mûm
Diz çûn tixûbê Hind û Rûm
Pey min were ez pey de çûm
Xweş rêbere hey gul hinar
Em pir dikin şerm û fedî
Dem çûn ti mayî bê xwedî
Kalan tû dî min tû nedî
Jîna mi çû bûm yextiyar
Wê te bibînin ê ciwan
Ger wek niha rabin rewan
Her tû bijî tevlû ewan
Hey dil bese ! ez bûme par )) .

Helbestvanê hêja Mele Nûrî nikare helbestekê saz bike ku çavê ( Şemala ) wî di nav de ne belû bin , ew tim ji

bo yara xwe dinale, raman , xebat , xewn û heyîn çine ku ne ji bo yarê bin .... Vê jî hiştye ku yar bibe jêdera jiyanê , çimkî ew ( yextiyar ) jî bûye û ew hîn li pey wê ye, Ma gelo ew kî ye ? bêguman ew (**kurdistan**) a ku gerdûnê Melê pê vejiya ye :

## *KURDISTAN*

((Xuhê bizane bo te birame ji bo te îro ez nû gihame
Di çavê dijmin gelkî xuyame çiku seraser li ser çiyame
Îro dibînim gelkî tû mestî piştî ti geş bû çima ti mestî
Çaxê biçûk bûm neyar ti xwestî Yabo ti da wan ji bo bindestî
Di wê demê de yabo xizan bû destê li ser wî destê dizan bû
Hebû birê min ew jî nezan bû ji bo neyaran li ber pezan bû
Ê kû ti danê gemar û kor bû mehra te nabî çikû bi zor bû
Rûkê te geş bû şemal û sor bû mêrê te pîs bû ti ne li gor bû
Dijmin bi zêra mela kirî bû Melê jî mehrek li te birî bû
Melê di hingî çi serserî bû kengî ti dîbû li te nerî bû
Ezê bi zorê te vegerînim dergistiyê te nûka bibînim
Ji bo te rindê ez dilbirînim li ser neyar lew dil bi kînim

| | |
|---|---|
| Ewe biyanî ez wî dûrim bibûrim | ne lawê ape kû vê |
| Ger tû dibînî peyakî hûrim tûrim | lê tû bizane marê di |
| Çawa tû qîzî tû ser bi zêrî dihêrî | ji bo neyaran distar |
| Ti mal mezin bû îro li jêrî bar bihêrî | hey wax li min bî tû |
| Jin bûne serbest xuşkê de rabe ewabe | ti jî gileh ke tevlî |
| Ne wek berê be rengê niha be be | bêje te navin ji bo aza |
| Hişê mi rakir dengê evînê birînê | qemûş hilanî ji ser |
| Ezê girêdim ji bo te şînê bibînê | Hêta ti rokê xweşî |
| Divê ti hêjî bihnê firehkî şehkî | gulyê xwe î sor dîsa ti |
| Bi şahê cîhan zar û gilehkî cihkî )) . | tenê ew karî derda bi |

Piştî vê rawestandinê bi helbestvanê hêja Mele Nûriyê Hesarî re , ji me ve hate xuyakirin ku ew dixwaze bi şêwazekî kilasîk helbesta xwe ava bike , tevlû ku ew giringiyê dide wateyê û ti wistandinê di ber wêneya hinerî de ji xwe re nake armanc !



## *MIHEMED HEMO*

Li gundekî ji gundên çiyayê Kurmênc , gundê ( Şîtka ) , helbestvan Mihemed Hemo sala 1961ê hatiye jiyanê , piştî temenê wî nêzî bîst salan bûye wî gund berda û niha li bajarê Helebê rûnişti ye .

Karê helbestvanê me pir bandora xwe lê dike çimkî pirtûxana wî ya bi navê Bedir-xan pir pirtûkên cûre cûr hembêz dike , vê jî hişt ku ew bi hemî aliyên rewşa kurdan ve agahdar be , ta niha wî sê pirtûk belavkirine .

1 – Seyrana dil di şîna Evînê de – 1994
2 – Civata kulîlkan - şano – 1994
3 – Di bin dilovaniya jiyanê de – helbest – 1999

Ji helbestên mamusta Mihemed Hemo diyar e ku ew pir hez ji dîroka kurdî dike çimkî tim ew dixwaze ku wan xalên ronîdayî bîne ber çavên me,

Navên mîna Dewrîşê Ebdî - Edûlê – Ehrîman – Ahoramazda , Leyla Zana , Osman Sebrî û Şivan Perwer di helbesta wî de tabloyeke ciwan diafirînin , ji helbesta wî yî xweş ya bi navê ( **Hev mala min** ) tê xuyanî bê çiqasî evîna welat ew birîndar hiştye :

(( Sergovenda xweşiya dil !
Haya te jê heye
Di van rojên mirdar de
Ro li nîvê ezmên
Dide xewê û qet
Danagere ?
Dilê bengîn û bi evîn
Di pir pite
Pêlên xwînê lêdixîne
Co û sulavan diherikîne
Natebite
Di cihên teng û genî de
Xwe lêdixîne li dîwar û bana ;
difire
Wek kevokek teqle
Di ezmanê welat de
Teqle teqle dizîvire ,
Basikan li hev dixîne
Xwe ber dide
Ser bajarê evîna min û te
Ji hêlîna bîrhanîna
Namê li ser namê
Ji min re tîne
û çare nîne
Hev mala min !
Kulîlka jiyanê !
Li vî cihî
Ehreman kenê xwe dike
Ahramazda gazî û hawarên
Xwe dike
Li vî cihî

Dujwarî xemla xwe girê dide
Xweşî biskên xwe qut dike
Her tişt lê bindeste û girîftare
Lê xewnên vir xweş û serbestin
Ne wek xewnên malin .
Hevmala min !
Gava ez li mal bûm
Li ber bihna te
Xewê didam
Bin basikên xwe

* * *

Lê , li vê derê
Li benda şevê dimînim
Ta xewên xweş dibînim
Di kerisim , ji hal dikevim
Ta ro di xewa xwe de
Tol dibe piş deriya
Şev bi ser min de tê
serê xwe
Li ser solên xwe
Datînim
Laşê xwe
Li ser erdê hişk û li hêmî
rêdixînim
Çavên xwe ,
Di katijmêrê de
Di meyînim

* * *

Kurmê xewê
Ber çavên min dikin
Bijangên min

Ji hev dûr disekinin
Dibin , partiyên me
Rû reş dimînin
Berhev nayên
* * *
Berê xwe didim
Çirûska çiya
Bi rê dikevim
Hespê hêvîyan,
        Vedilukume
Jê de dikevim
Pişta min diderize
Dilê min rast dike
Xwîşka Leyla Zana
Dibe teyaqa dilê min
Ji nû ve hişyav dibim
Bê çare dimînim .
* * *
Hevmala min !
Saza civîna dil !
Bila hêvî nemirin
Bi sedan zana û hozan
Siwar bûne li pênûsan
Bila hêvî nemirin
        Hîn tê me
        Dengê perwer şivan
Bila hêvî nemirin
        Nêzîk maye
Bi bin kavilin rûreş
        Ev zîndan .)) .

Wiha ji me ve diyar bû ku helbestvan bi hestek germ helbesta xwe dihûne , lê nîşana herî giring li cem ew e , ku ewî xwestiye avahiya helbestên xwe bi pêş xe û ji forma dirêj here fermên kin ,
yan ji wêneyên ravekirî here ber bi yên hevkutandî û hevgirtî de:

(( Seyrana dil
Dil bi riya seyranê
Ket
Li keviya çavên dîlberê
Konê xwe vegirt
Bi histirên evînê
Destnimeja xwe girt !
Çavên dîlberê kirin
qulbetname !
Qulbê xwe nîşan kir
Li ser nimêjê
Navê xuda ji bîr kir !!
Bûyîn
Ji Teqînniya
Blêça evînê
Û bûm nêçîra
êş û derdan ,
Di gulistana
evînê de .....
Bi giriyê mûma
dilê dildar an re ,
Hişyar bûm
bûm perst û sewda
di baxê ranohiya
Mûmê de

Di kenim û di nalim
Û ta ber bangê
bi mûmê re
di bohirim .....)) .

Hîna helbestvanê me dana xweyî hinerî berdewam dike , ew jî bi hinin dîr e,yên weke wî helbesta nûjen dinvîsin, li formekî yan taybetiyeke helbesta kurdî ya bê kêş digerin .



## *MIHEMED ŞÊXO*

Torevan Mihemed Şêxo sala 1968 an li gundê ( Leylan ) ., başûrî Tirbespiyê buye .

Di sala 1986 an de helbesta xweyî pêşî belavkiriye

Ji sala 1990 î û vir de wî nivîsandin bi zimanê Erebî kêm kir û nivîsandina xweyî kurdî xurtkiriye .

Berevokek wîyî helbestî bi navê ( Maçek ji dil ) sala 1998 an belvbûye .

Di van salên dawî de ew bi rexn û lêkolînên toreyî mijûl dibe .

Berhemên xweyî rexneyî û helbestî bi van: navan belav dike :
Bavê keywan – Rojbe Ahmed – Mihemed Şêxo û sîpan Mihemed .
Û di van govar û rojnaman de dinvîse :
Metîn – Peyv _- Raman – Xebat – Zanîn – Gulistan – Almuseqef Alteqedumî - Edeb Alqediye – Armanc – Dugir – Aso – Deng – Bihar û Elecras .

Pirojekî wîyî rexneyî heye , lê hîna piraniya wî bi awakî teorî ye ? ew hêvîdar e ku wê nêzîk wî tewaw bike .

Ev piroje dixwaze ku li ser helbest , çîrok û Romana kurdî raweste û taybetiyên rexna kurdî xurtir bike .

Helbestvan Mihemed Şêxo di hemî mehrecanên helbesta kurdî de hevparî kiriye û ew yek ji endamên komîta mehrecana helbesta kurdî ya şeş û ya hevta ye , ji helbestên wî me ji . we re ev helbijartin :

**MÎR GIRIFTARO**

(( Li çiyan bîranînek heye
Herdem tilîyên me dixwerîne ...
Ji rû toza xewanan ... diweşînim.
Bûme pêlek kevzê
Çirîskan li ser hev datînim ;
Min ranexistiye şeva bê deng
Gurzên pirsan
Bihane , şûr
Bihna xwe ji wan digre
Û xwe ... vedide

Eger biryarên te mûm bin ?
Berfa kirinê wê ête pişavtin
Tîpên me sazkirin
Hemberî çûnê .....vane
Vane sawîrên keyqubad...... !
Li ber deryê mebestê kanî peyger ..???
Şevê salan vedidim
Di festîvala wî de :
Gewd bûne hempa ji hev re
Mêjî û pergal
Vajî hevin ..
Bê durl û bihane
Alozî li me bûye mîr ....)) .

## LI DÛV ŞEWATA XEWNA

(( Bi hemî xemla periyê
Xweşiyê
Xwe asêkir

### *1*

Şeva destvekirî
Li qefa dil
Wê
digerînim .....
tevneke efsanî
li dora bêjeyan
dorpêç tê
û mestiya xwe
dihûne :
êvarî baş bi te re ne herdû laş !
toza çavan

di masa tariyê de
xwe diveşêre ...
ma kanî ew rû , û
ew bizava teyî bi şewat ?
bi hemî xemla periyê
xewşiyê xwe asêkir ...!

***2***

Ewa sîngşevî hişyar kirim
dema li ser mirna
xwe amadebûm ....!!
ketme ser pêtê du awiran ....!
yekî gurmîçokê min pişaftin
êdî .. têla jiyana min ....
radikşîne ..
ma çi maye ...?
bi hemî xemla periyê
Bi hemî xemla periyê
xweşiyê xwe asê kir .....!

***3***

Similek ji çavê şemalê weriya ...
germa ku di xwînê de
gencîn bû .. tevde dabû
ber nikila ! M ? C
(( Dema ez windabûm
ji dost û bira ....))
li ber dergehê kutkutekê bûme mêvan
wê xwe jibîrkir ku
bidê min kilîta hingûr
mijî ne li dêrî da û

ne pêgehên nû vekirin ....!!
bi hemî xemla periyê
xweşiyê xwe asêkir ....!

*4*

cama horiyan
di noqa hêstran .. şikest
me xwe ji bîrkir
di nameyekê de çû şer
û venegereha .... !
ji xwe dititrse deveran
bi zikreşî vedqurpîne ...!!
Go ez dilê xwe
bi ser çiyan de berdim
çi xurt agirim , ey hewar...!
bi hemî xema periyê
xweşiyê xwe asêkir ......!

*5*

ji xwe ditirsim ku
koçkirinê nû vejînim
bi destekî bê nav û
serdiberde ....!
di wê dehla
bi hêviyan kutandî
pêrgî nebim , ezê
di xewê de xwe veşêrim
çimkî
bi hemî xemla periyê
xweşiyê xwe asê kir .....!

***6***

Niha tu têrbûna dil saz dikî
çûneke bi tevzînok
agirekî ku destê min vedixwe
bi ser sîngeke dilmê de !!!
Bi hemî xemla periyê
xweşiyê xwe asêkir ....

*7*

Ku ez têm
perdeyên bihna te diqijlin !
kengî ezê ji meya destê te vexum ??
li deverê hişyar bûnê
wê ba te nîşan bide
bazareke rût
gihandinek bi lavlav
ma wê vabûn ji perdê re bibe vebûn
û tê xwe têxê
hilçinîna tiliyan
Ey şemalê dîtina te laşê min
daye ber pêleka dasiya ...... !
peyalê cana levxin
bibin ewrekî hêviya û
li ser xaka dil bifirfitin ...
ma ev çi xewne ?!
bi hemî xemla periyê
xweşiyê ...
xwe asêkir .......)) .

((Tu
penayê pirsêyî
li dûv te

wê keskesor pora xwe
jev biwejêre
giraniya dorpêça ramanên me
bi qelişe û
bi tenha xwe
hechecoka xweşiya me , wê
xwe birîndar bihêle !!
gelo
qey hezkirin
di borê xewna de
diçilmise
yan
mijûlankên te
wê diveşêre ?!
demê
min nexwe
ez berê xwe dixum
berê min keftelefta
asoya van çiyan hilgirtiye
gava ji tirsa birînê
simbilên wan
piştxûz bûbûn .....
pê bi pê
berava birçiyê
me dikşîne û
em
mêraniyê li hev dikin
bizava me
rûmetiyê sildike
û dinamên bêdengiya me de
diçikize û

bextê biyaniya me
bê par dihêle ...
ez wek leşkerekî matmayî
ne ji fortaniya xweyî winda
ne ji bêdengiya van rengan
lê
ji bo pirsa teyî xwe di hêstiran de
digevêze.......
ji rojava bê binî
vegere ... vegere dengê mino
di hêviya koçberan de
vegere ....
kulên te
xwe di şewata bajarên min didin ,û
tevî ku lemên çavên te
avê dihûnin
ezê şînkayîya te
biparêzim
bere ez li ber dergehê
kenê te
bimrim   )) .

--------------------------------------

## *D r .MIHEMED BAKRO*

Bi gotinên normal û bi hestekî tenik D r . M Bakro dixwaze helbesta xwe bihûne . Ango , helbesta wî weke piste pista evîndaran , bi nermî dikeve dil de .

Helbesta wî ( **Bûka Ber Êvarê** ) guftûgokirinek hindirîn e , jîyan bi hemî rengên xwe ve tê bikaranîn :

(( Bûka ber êvarê
Me çend mal û mirov
Bi du xwe de hiştin .
Em şevder li ber tava heyvê
Nivistin ,
Di ava çeman de
Me cilên xwe şûştin .
Me nizanîbû :
Ev çiyan ji bo me
Dojeh in yan buhişt in .
Me nizanîbû :
Di van çiyan de
Emê bijîn , yan
Bêne kuştin ,
Bûka ber êvarê :
Em westiyan ,
Li ber devê deryê
Vê şikeftê em rûniştin
Bi tîrêjên derin ava ,
Te porên xwe şikinî ,
Te guliyên xwe hûnan ,
Te li ser milên xwe dahiştin .

Te kirasê xwe li xwe kir ,
Te xeftan bi ser de berda ,
Te zendên xwe hilmiştin ,
Tu bê berkûk û dîlan bû
Du firmêskên gir û ronî
Li ser çavên te veniştin
Bûka ber êvarê :
Kirasên bûkaniya te
Bê girêdan û berpiştin !
Guhezên van deveran
Bê xeml û xêzên ,
Bê xişr û bê tişt in !
Şikeftên van çiyan ,
Ji gazin û gilî ,
Ji taliyên vê jiyanê
Mişt in )) .

Helbestvan ji keçika xwe re dibêje ku qet ew xebata xwe na rawestînin , tevlu ku ( Dîrok ) a gelê kurd tije xwîne :

(( Dîrok
Ji çar aliyan
Em birîndar in ,
Di her cîkî
Di laşê me de
Em bixwîn in .
Em buhaya
Dîrokek bêbext
Îro didin û
Datînin .
Hîn jî ,
Keçka min ,

Em bi hêrsin
Û bi hêz in
Û bi kîn in
Em ristên
Serbestiyê
Li rojhilatê
Dikêşî nin ,
Ti hov û dirinde
Serên me pêlnakin
Û naşkînin )).

---------------------------------------



## *NAMÎ*

Navê wî Mele Ehmedê Mehmûdê Namî ye , di sala 1906 an de li gundê Erbetê nêzî Nisêbînê bûye .
Wî jî weke hevçirxên xwe dibistana olî li gundê Girêsiwêr û Tîlşeîrê xwendiye , bûye Melayê Tilşeîrê û tê de dibistaneke keçan vekir ye , tê de qîzê kurdan hînî kurdîtiyê dibûn û ev sirûdên wî dixwendin ( sirûda niştimanî ) û ( neşîd û gaziya keçan ) .

Namî , pir nivîsar nivîsîne,lê mixabin ji sala despêkê 1935 an de ta sala koçkirina wî 1975 an ew pir caran ketiye

zindanan de , vê jî,hiştiye ku pir nivîsarên wî bêne windakirin pirtûkên Namî yên hatine çapekirin ev in :
1 - Daxwazname – Helbest – 1986 – stokholm
2 - Çîroka Agirê sînema Amûdê – 1987 – Siwêd , Opsala
Sê destnivîsên wî jî hene , em bi hêvîne wê nêzîk bêne çapkirin ew jî ev in :
1 - Çiko li bîrim ( jîndarya Namî )
2 – Rêzimana kurdî
3 – Ferhenga kurd û Erebî ( kozar )

Bandora Cegerxwîn li ser heval û dostê wî Namî pir xuya dike , herkes dikare vê yekê bipelîne .

Namî rola zanîn û xwendinê di avakirina welatan de dizanîbû û ji bo vê yekê ew xebitye û ramanên xwe bi riya helbestan gihandine milet.

Helbesta ( Marşa pêşveçûnê ) ya ku hunermendê nemir Mihemed Şêxo ( Bavê Felek ) ew sitrandiye bandora xwe di hestê netewî de hiştiye :

(( Pêşkevin , em serfirazin miletê kurdî
Yan mirin  em dê bibînin , yan jîna kurd
Wa miletê kurdî
B"xwendevan û xwendegahan , bi al û leşker
Dê bijîn , paşê dikarin rêçê bibin ser
Wa miletê kurdî
Heta kengî em bimînin bin destê dijmin
Gih bi kuştin , gih bi sotin tim tê bîra min
Wa miletê kurdî
Kurdistan êdî menale lawên te hatin
Xwendevanin , xwînfiroşê axa welatin
Wa miletê kurdî
Rûh û can û dil bicarek bo te fidakin
Xwîna xwey paqij dirêjin bendeyê nakin

Wa miletê kurdî
Ala rengî bo te deynim ger ser bi der dim
Ger nekim , paşê bizane kî ez ne kurdim
Wa miletê kurdî
Her bijî ala sê rengî , her bijî xebat
Tev digel Namî bi bêjin : her bijî welat
Wa miletê kurdî )) .

Seydayê Namî kurdperwer û dilsozê mijara kurdî bû loma wî didît ku pir pêwist e dema mirov bobelat û gerdîşên di civakê de çareser bike . û li ser jina kurd sitemek xiniz dihate bûrandin , wî xwestiye ku xwe li aliyê rastiyê bibîne , li aliyê pêşxistina civakê be ev jî di helbesta ( **Neşîd û Gaziya keçan** ) de diyar e :

(( Birayên delal hûn werin xortino
Buhişta welat da'm herin merdino

Eger hûn neyên vane keç em meşîn
Besin koletî , serfiraz da'm bijîn

Welat çav li rê bendewarê me ye
Ciwan herne pêş dewr û dem ya weye

Eger hûn neyên vane keç em meşîn
Besin koletî , serfiraz da'm bijîn

Bibin yek bi lez xort û keç da'm herin
Ji bo serxwebûnê bi ceng û mirin

Eger hûn neyên vane keç em meşîn
Besin koletî , serfiraz da'm bijîn

Keçim , nû gihane , dixwazim xebat
Me canê ciwan daye gorî welat

Eger hûn neyên vane keç em meşîn
Besin koletî , serfiraz da'm bijîn

Dilê me ji polaye gurçik hesin
ji bo tol û doza welat em besin

Eger hûn neyên vane keç em meşîn
Besin koletî , serfiraz da'm bijîn

Ji Namî me zanî ko em bibne yek
Di jîn serbilind al û ol serek

Eger hûn neyên vane keç em meşîn
Besin koletî , serfiraz da'm bijîn )) .

Heskirina welat , li cem Namî , di ser her tiştî re bû . helbestên wî teqez dikin ku ew bandora helbestê dizane nemaze , ku karibe êş û derdên gel hembêz bike .

Yek ji helbestên Namî yên bûne nasnama wî , helbesta ( **Marşa xortê kurda** ) ya ku xwe bi xwe şirove dike :

(( Xortê kurda tevde rabin dilşad û xweşî
Em kurên kurdistanin her bijîn , bijî
Her bijî kurdistan , her bêjin bijî
Ev welatek pir şêrîne , her bijî welat
Rêberê xwîn firoşin bo jîna welat
Her bijî kurdistan , her bêjin bijî
Serbilindî kes nebînê bê rojên dijwar
Wek şêrên birîndarin bo te ne xwîn xwar

Her bijî kurdistan , her bêjin bijî
Roja cengê em tev mêrin , şagirtên restem
Serbestî doza me ye her roj û her dem
Her bijî kurdistan , her bêjin bijî
Welatê me pir hêjaye terka wî nakin
Ger divê rêde îro em can fidakin
Her bijî kurdistan , her bêjin bijî )) .

Û ji ber seydayê Namî berpirsyariya xwe dizanî bû , ew wek rewşenbîrekî kurd , wî nemerdî ne kiriye , hemî karînên xwe ji gel û welêt re kirine qurban .

Ew vê rastiyê wek stêreke geş dibîne ji bo vê yekê ew dibêje : (( Û ez hêvîdarim ji xortekî kurd ko roja welat azad bibî , ew bi lez bê ser tirba min û mizgîniyê ji min re bîne da ko êdî ez bi xweşî li wê Qoristanê razim .

Ji ber vê yekê min xwest ev çend rêzên min nivîsîne bibin arîkar ji min re û riwê min sipî bikin li ber miletê min ..... ))



# *NEZÎR PALO*

Ew Nezîrê Hubo ye , di sala 1960 î de li gundê Hecxelîlê hêla Efrînê hatiye ser rûyê dinê .

Mamusta Nezîr endizyarê çandiniyê ye .

Di sala 1998 wî berê xwe da Elmanya û niha ew li wir dimîne

Berhevoka ( Qîrîn ) ji çil û pênc helbestên nûjen pêkhatiye , hin kin in , hin dirêj in , hestine germ û jankêşanke bê sinor didin xuyanî , lê nîşana herî balkêş ji van helbestan re dimîne ew êş û zehmetkêşa ji dilê helbestvan difûre .

Wêneyên helbestan cûre – cûr in , carna wekî helbesta ( **Helbestvan** ) wêneyeke dirêj û vezîlayî tê dîtin :

(( Helbestvanekî
Pênûsek nedît
Ku helbesta
Evîna xwe
Binivsîne .......
Hema tîp
Ji dil firiyan
Û ramûsan

Li ser lêvên ......
Dilberê danîn
Çavên wê kildan
Û hêlînên xwe
Di enîya wê de
Çêkirin

Dema mirov bi hûrbînî helbestên berevokê dixwîne , mirov dizane ku sedemê êş û dilzariya helbestvan ew e ku ew :

(( Li hev cîwarekî
Ez li evînê
Geriyam
Li dawîyê
Piştî ku bê hêz mam
min zanî ku
Evîn ......
Di sîtava bijangên
Welat de )) .
Raketiye ))

Û ji ber welat bindest û xopan kiriye , hestê xwewindakirinê bel dibe :.

(( Di ferhenga
Jiyanê de
Ez ji bîr bûme ))

Lê carna bêyî ku ew zanibe çima yan çilo ew hatiye afirandin ..... ew li jêderê jiyana xwe dinêre .... gava hêza wî ji sê hîman pêk tê ( welat )  (dayîk ) û ( Yar ) ....
Û çimkî ew dizane ku weke ku ( Nazim Hukmet ) gotiye : ez nabêjim ku ez helbestan dihûnim , lê ez gotinên xweş dibêjim wiha jî helbestvan hişyar e ku ev giryê wî bi sedem e û heyîna wî pê ve girêdayî ye :

((     Girî
Li ser sîngê
Welatê xwe
Min dagirî
Li ser sîngê
dayîka xwe
Min dagirî
Û li ser sîngê
Yara xwe
Min dagirî
Lê herseyan
Bihev re
Helbesteke şîn girêdayî
Ristin
Û ta niha
ew helbesta
Di sîngê min de
Digrî ..... )) .

Rast e , di hemî helbestan de , helbestvan xwestiye dilsozê sernavê pirtûka xwe be , mirov dikare bibêje ku navê pirtûkê ( **Qîrîn** ) pir ji deqan re li hevhatiye û ew kilîta hemiyan e .

((     Qîrîn
Kurd .....
Li pişta qîrînekê
Siwar bûn ....
Û ew qîrîna
Li dora gerdûnê
Geriya ....
Hilperikî bejna
Asîman

Û ji ber dergehê
Xwedê
Bi rûkî kizirî
Vegeriya welatê xwe
Û di guhê
Çiyan de
Xwe veşart
Têde za ....
Û ta niha
digrî ...... )) .

Wiha , ew bi zanebûn nav li deqên xwe dike Ji ber vê jî nîr û atmosfîrê di helbestan de bi hermoniyek dijwar ku dikare yê xwêner kelûgirî bike,hatiye sazkirin .

Vêjî hiştiye ku pir bêjeyên pest û asê li cem wî peyda bibin wekî : Girî - Qîrîn – Hêstir - şîn – Axîn – Xemgîn – Dinale ....

Ev jî dihêle mirov bibêje ( dema mirov bi bîra xwe bîne ku yê helbestvan ji êş û jana gel di peyîve ) ku dîroka gelê kurd ji talan û bobelatan mişt e .



## *NÛJEN*

Navê wî Mihemed Elî Heso ye , sala 1930 î li gundê Moza ji diya xwe re bûye , gelekî bi hestê netewî mijûl bû ye , ew jî hevçerxê Cegerxwîn , N. zaza û Osman Sebrî ye , pirtûka wî ya bi navê ( Nalîn ) sala 1998 an belav bûye .

Kurd dibêjin ( Dil Pîr na be ) , Nûjen tim weke xortekî ku dilê wî tijî hêvî bin li xwe dinêre , ta li ser qapê pirtûka xwe wêneke xweyî ji dema xort aniyê daniye .

Hevaltiya wî bi helbestê re ji mêj de ye , hin ji nivîsînên wî divegerin dîroka 1956 an .

Di van helbestan de wî xwestiye ku bi milet bide zanîn ku ew hene û li ser xaka bav û bapîrên xwe ne , û hertim bang li gêl û kewdanan kiriye ku xwe hînî zanînê bikin ,

Di pirtûka xwe de wî du helbest bi navê ( Sorgul ) nivîsîne , lê mirov ji herdiwan wateyeke tenê wer digre , sorgul hêviya ( Yara) helbestvan e lê asteng dikevin nav navbera wan de , helbesta (sorgul ) a pêşî sala 1960 î hatiye nivîsîn , ew jî deh kît e ,( sorgul ) a diwemîn sala 1977 an hatiye nivîsîn bi bingehek serbestî Nûjen xwe tenê di warê xewn û hêviyan de nabîne , ew bi xurtî berê xwe dide jiyana gelê xwe , li êş û derdê wî xwedî derdikeve , ta carkê di

zindanê de bû di gel hevalê xwe ( Osman sebrî û hinin dî )

wî bobelata agirê (Sînema Amûdê ) bihîst , wî nemerdî nekir zû nivîsoka xwe danî ser birînê :

(( Çardê çirya paşî
Ji sala şêstî
Min ji mezê dî
Li Amûdê agir bi sînemê ket
Dilê min ji tirsa li dîwarê sîngê ket
Kete guhê min qêrîn û girî
Hawar û gazî
Sêsed zarokên biçûk
Şêrî wek gulok
Şaş mane ......
Çav zerdoq
Hawîr dibezin
Hawîr dibezin
Hawîr dibezin
Radibin hawar : Yabo Yadê
Agir ..... agir hawîr agir
Dike vize viz
Dike gure gur
Rengê ziyan
Rengê ejdehan
Li ser hev xwe tavêje wan
Zarokên kurdan
Kesên bê xwedan
Hewar û halan
Hîn xurtir
Xwe tavêje wan
Bihemedê Axê
Wek mêrê çê

Bûye hewar û han
Rengê perwanê
Diçe û tê
Tiştê ko jê tê
Hinek derxistin
Hinek revandin
Haware Hawar
Hesin tewiya
Hesin hate xwar
* * *
Bihna goştê biraştî
Bihna kizûrî
Dest pêkir fûrî
Amûda xopan
Bûye mij û dûman
Hawar û halan
Dikin nakin
Zarokên xwe nasnakin
Hawar e hawar
Riwên xwe talankirin anîne xwar
* * *
Hey dilê xemgîn
Ji mezê birev
Bidizî bişev
Her Amûda şewitî
Binya bajêr
Mezela şermola
Li nav tirbên nuh biger
Li nav axa şil biger
ji goştê biriştî
Ji hestyên kezirî

Bipirs li rêzan û rêber
Silav ji bo tevan
Bêje wan
Bavê we ji bo we
Ji bo kurdistan
Ketiye zindanê
Daketiye meydanê )) .

Roja ( 21 ) ê Avdarê , cejna nûrojê ye , ev roj li cem Nûjen pir bi pesn û bihaye , ji ber ew dibîne ku netenê ewrên tarî difirikin , lê belê
her tişt rewaz û geş dibe , Ango ev roj dibe roja azadiyê .

(( Zivistana sar koça xwe bar kir
Bihara rengîn serê xwe rakir
Ewrên reş û tar xwe dane alî
Roka me derket , berfa me helî
Pezê reş derket ji senc û govan
Gelek dilxeşe , şêrîn e zozan
Ava avgîran bûye wek mermer
Tîrêjên heyvê xwe berdane ser
Beq siyar bûne , dikin qurequr
tava heyvên me bûne wek şekir
Ev dengê beqan hawîr çarkenar
Mizginê didin nêzîke bihev
Çiya şîndikin giya û nefel
Çuqliyên daran bûn çîçek û pel
Hêrik û berqel ji xew bûn şiyar
Kesk û sor bûne gelî û zinar
Tev xemilîne binefş û sorgul
Ji ber kêfa dil ser xoş e bilbil
Dema ku Nîroz tê , dibe mêvan
Kurdistan dibe wek bûka cîhan

Keçê û kortên kurd bi kêf û seyran
Welat kirne govend û dîlan
Şahî di dil de , ken li ser lêvan
Ji bo vê rojê ez dibim qurban))

Nûjen pir di rewşa welat de mijûl dibû , vî tiştî hiştibû ku tim ew rast ramanên xwe bibêje , guh bidin vê helbesta wîyî evînî ( Maça Lêvê ) :

(( Çi bikim ji maça lêvê ku ken li der tune bî
Çi bikim ji dêmê gulî perda reş bi ser de bî
Maçên lêvên yarê melê botî fitû da
Min lêv bi lêvan mêtin , guneh , guneh ji melê re bî
Ji nîro ta roava lêvan hevdu talan kir
Wê got : Lêvê xwe hilneyin , min got : canim herhebî )) .

Niha , nûjen li Qamişlo dijî , dilê vî xortê heftê salî hîna bi germî ji ( sorgulê ) re lê dide .

---------------------------------------



## *QEHAR SILO*

Helbestvan Qehar silo sala 1954 an ji dayika xwe re bûye. Ew pir di zimanê kurdî de mijûl dibe û li gor zanîna min wî gelek pirtûkên rêzimana kurdî xwendine .

Pirtûkek mamosta Qehar bi navê ( Rêzimana kurdî ) di bin çapê de ye berevokek wî yî helbestî bi navê ( Kêlên ji Fermîskên sor ) sala 1999 an hetiye çapkirin .

Helbestvanê me dilsozê toreya kurdî ye , vê yekê hişt ku ew bi hestekî berpirsyar û netewî , rewşa Mehrecana helbesta kurdî ya sala1998 an bi awakî helbestî ji dîrokê re tomar bike :

**MEHRECAN**

(( Êvar îne
Borîza tirênê dilîlîne
Wekî marê belek
Sînga şevê di çirîne
Daxwaz Heleb
Şarê kevnar
Helbesta cizîrî di xwîne
((Rîhan û sunbul tê hene ))
Çend heval bi hevre
Rêwîne
Cot bi cot ......
Pêş berî hev rûnştîne
Qehar û Şêxo
Ferhad û Rezo
Dest bûne yek
Civata navê rêzana
Çavan hev dîtin
Dilan hev girtin
Kenekî veşartî
Di dilê çirûska bijartî de
Li ser lêvên stêra Qamişloyê
Veda bû ?

Ronak dida pelçimên zeytûnî
Li şarê Efrînê civane
Reng raxistin li ser tevna dîrokî
Xal û xêz ..... xaç ......?
Li ser kevanên pirsa vedabûn
Ji biskan dirêstin hêlêna
Kevoka spî ?
Gum – guma deholê dikute
Hêvîyên salê
Rabe .... seyda cegerxwîn rabe
Mêvan hatin ....?
Qeşartin kalanê salê
Xewnan aza dikin ji bendên
Kevnar
Lewra ....
Tîrêjan xwe di pêçandin
Li dengê tîpa
Di bûne li ser lêvên
Nûşîn dibûn li ser lêvên
Zinarî
Mehrecane .....
Helbest der dibûn ji navikên
Dilan
Di civîyan li ser pêlên awazê
M . Ezîz Şakir
Di zîvirîn wekî heyv û rojan
Li ser destên bayê evînîyê
Di bûne xunav
Di barîyan li ser kevanê dem
Salê
Jîn didan dara çinarê

Dem westîya ..... ?
Bang haware ji dilê
Newalê
Pirs bersive ?
Bersiv pirse?
Aso şiyar dibû bê
Deng !! ?
Di nîvê reşka çavê gerdûnê de
Qurmê darê jî , ji xakê
Jîn û reng dida kulîkên
Hinara bê deng
Hînga ....
Em tev bûne xêz
Milan hev girtin bê deng
Silav bo canê nemiran
Û di bê dengîya pêlan de
Sirûda Ey Raqîb .... vaye hat
Reng dida gulên helbestî
Li ser şaxên dara biratîyê
Zîldane
Xwezîyek nêzîk
Li ser pela yekemînî
Nîşane
Pirs binavê diya ciwan
Mirov ji xakê ... ?
Mirov bi xakê ?
Nav li ser kêlan nîşanin
Zanava gela dîroke
Ji xakê hêlîn û
Koke ... !! ?
Pela duyemîn ji darê

Binavê bazê belek
Dirêst kenarê hêlînê
Ji tevna zanînê ber kêşe
Evîndare .....
Dil xemgîne .....
Tîp li ser xêzan nû şîne
Gula zer dilxawaz û doze
Barzanîye
pel li ser şaxan zer boze
Mehrecane ...
Helbest ji dengê kewane
Xweş di xwînin , awaz ji
Dil
Du ta dirêstin ji dilan , pêlên
Nêjên
Du deng ji rista helbesta
Dinoşîn ?
Rista keleş kêş evîne
Soz ji dile
Çav li şopa Cegerxwîne
Dil li ser gula rojanî
Aşîtî
Biratî xala dil boze
Roj westîya !!!
Dengên şalûl û çivîkan
Li ser tevna zîv û zêrîn
Rawestîyan
Sosin û nêrgizên kûvî
Xwe berdan kûrîya dilên
Raketî
Hînga .....

Endamên komîtê civîyan
Ferhad û Şêxo
Û hemo jî biwan re
( Kûvî yû refên kewwan )
Li ser kalanê şûrê zalê
Lûsiyan
Mehrecane .....
Tîp bo helbestan
Dirêstin
Deng ji kêlên dîrokî
Hev dilê rengên
Asone
Tarîya şevê di meyandin !! ?
Spî ji berfa
Zozanî
Keske ji pelên
Zeytûnî
Zer kakile
Sor li ser Enîyê
Nîşanî )) .

---------------------------------------



***REZO***

Navê wî Ebdulrezaqê Eliyê Îsayê Osê ye . Roja 10 – 10 – 1950 li gundê Dekşûrî hatiye jiyanê . Xwendina xwe ya sereteyî li gundê Tenûrî kuta kiriye . Ya navendî û lîse jî li bajarê Qamişlo bi dest xistine . Bi navên Aro , Rezo , Stêr , Azad , Pirs û Rezoyê Osê di gelek govar û rojnaman de nivîsiye , ji wan : Stêr , Armac , Dugir , pirs , Metîn , dengê Azadî , Zanîn ...

Ji havîna sala 1970 î de dest bi nivîsandinê kiriye . Gelek gotar û lêkolîn bela kirine . Wilo jî helbest nivîsiye , şano di kovaran de bela kirine , folrklor û kurteçîrok nivîsîne , Çîrokên zarokan dane hev û du pirtûk bi navê Dîk – Dîko û Libhinarê çap kirine ( wî bi kurdî nivîsîne û Dr M . Nejarî guhertine Erebî û bi hev re di bin navê danehev û pêşkêşkirina herdu navan hatine çapkirin ) . Bi kurtî :

1 – 1972 – 74 Endamê komîta berpirsiyariya kovara “ şoreşgêr “ , ku li bajarê Berlîna Rojava derdiçû , maye .

2 – Di van salan de jî bûye endamê komîta çapderîn ,ko sê pirtûk li Berlîna Rojava çap kirin ( Dîwana S . Hêzanî , bi kurdî . Helperkên kurdî , yên floklorî , bi Elemanî . Miletek berxedanê di ber hebûna xwe de dike , bi Elemanî ) .

3 – 1977 kursê fêrbûna zimanê kurdî li bajarê mosko , ji gurûpek xortên kurd re vekiriye .

4 – 1978 Bûye endamê komcivîna damezrandina “ Hevbenda kawa bo wêjeya kurdî “ ku li Mosko pêk hat .

5 – 1978 – 80 Bûye endamê “ komîta amadekar “ bo pêkanîna yekbûna komeleyên xwendevanên kurd li Ewropa
1980 – 81 Berpirsiyariya belavoka “ Rewşenbîr “ , li Sûriya kiriye .
1982 – 84 Bi Bilûrvan re serkêşiya fêrbûna “ kursê zimamê kurdî” li binekova cizîrê kiriye

1983 – 93 Berpirsiyariya kovara “ Stêr” , bi bilûrvan re , paşê bi dilovan re û hin hevalên din re , kiriye .

û hîna jî nivîsandinên cûr bi cûr dinivîsîne .
Mamosta Rezo , xemhilgirê zimanê kurdîye .Ma gelo tiştek ji zimên şîrîntir heye ? Na . ji ber vê yekê wî girîngî daye zimanzanînê .bê dudilî mirov dikare yê weke Rezo li ser tiliyan bijmêre , eger mirov li pispor û zimanzanan bigere . Yê weke wî , mîna Perwanan yan feneran rê li pêşiya civakê dûz dikin û ziman şîrîn û bi sûde dikin .
Wî di vî warî de helbestek binavê ( **min xwe Nasî** ) hûnandiye .

Di vê helbestê de , bê ku kesekî bi nav bike , qerf û tinazên bi wî mirovê Kurd yê , ku xwe zana dibîne , lê nezan e dike ... bi wî mirovê , ku xwe gernas û Karmend dibîne , lê bêkêr e dike. bi wî mirovê , ku xwe geşbîn dibîne , lê moran e dike .... bi wî mirovê , ku xwe navnas dibîne , lê jar e dike ... û dawî dighe wê behweriyê , ku mirovê hestewer , pêwîst e xwe nexapîne û serê xwe , li gorî zanebûna xwe rake , da ne weku simbila vala serê xwe ber bi jor ve bihejîne .

**MIN XWE NASÎ**

Dizaninm ez zimanê çûk û maran
Û zarên çîçek û gulçîn û daran
Nizanim ez zimanê xwe bi carek
Wilo kî me , eger tu min binasî ?
Ez im dêw û ez im gernasê waran
Ez im hêştir û gayê şixr û baran
Ker û lal im li cîhanê bi carek
Qirik mişt e ji derzî û ji dasî !

*        *        *

Ez im hîm û ez im ew lat û mermer
Ez im heste û ew destarê reşber
Ji bîr nakim li gel vana zinarek
Gelek xav û pexox im , bê xunasî
* * *
Weku şêr û pilingan ez li bax im
Bi hêz û himmet û salox û dax im
Ji daristanê qet min nîne darek
Gelek qels û melûl im , bê finasî
* * *
Ez im heyv û ez im xorşîd û gerdûn
Ez im kîwan û perçîs û terazûn
Mij û moranê da ser min temarek
Felek loma li ba min tu nenasî
* * *
Ez im Xanî , ez im Bêkes û Behrem
Ez im Guhderz , ez im Qadî û Restem
Kesê gêl û ew ê aloz e jarek
Ne bînaye , ne mêrxasî , ne xasî
* * *
Çiqas bêjim , kelêj im , jar û mest im
Gelo ez jî mirav im , can û hest im
Bese bavo , ji min kême hewarek
Evê halo ez im ,, va min xwe nasî )) .

Rezo helbesta xwe bi hestekî germ û paqij dinvîse , lê ku helbest evînî be , ev hest germtir û gurtir dibin , nemaze dema yara wî , wî bê behr bihêle :

## XEMREVÎNÊ

(( Nazik û hem dengenayê
Ber û bihna bax û gul

Tem û çerx û ewr û tavê
Qet li min nake silavê
Bûye dax û êş û kul

Berf û bayê , xweş didayê
Bûme pûş û çît û zil
Hem lehî û pêl û şapê
Ez didam ber kod û çapê
Xweş kirim ez şil û pil

Kok û bingihka belayê
Ew kevoka har û sil
Jîr û geş û lav û gewrê
Kavir û gîska sitewrê
Bûye barê pişt û mil

Ew bi şev hate semayê
Min didayê can û dil
Lale asê , xweş dinasê
Xavik û heprî kirasê
Bûye jana can û dil

Wê dama ku naye rayê
Ez dimînim xav û xil
Bûme dîlê xemrevînê
Nake bo min yek civînê
Mame bê kildan û kil )) .

Cûreyekî helbestî li cem mamosta Rezo peyde dibe , ev cûre ji bilî wî pê ve li cem tukesî dî jî , min ne dît !!

Ew jî , vexwarina wîyî xurt ji kelepûrê kurdî ye , ev yek awayê hevdeqiyê ( întertêkist ) ê distîne , mirov dikare helbesta wî ( Mirîşk ) bike nimûne :

**Mirîşk**

(( Mirîşka me
Xwe kil û neynik
Kir...
bêjna xwe
bi Dîk xweş
kir ....
Qebiçî ,
li lîs gera
Çare ne
kir ....
Me
ew li ser mijankên çavan ,
bi cî
kir ....
Me
hêviya hêka zêrîn
kir ....
lê , ....
Bi qîjqîj
û
qudequd
ji me re
hêkeke çermî
kir .... )) .



# ***RÊNCBER***

Navê wî Emerê Lelê ye . sala 1935 an li gundê ( Qesirdelê ) hatiye dinê , niha ew li gundê ( Mezra xwar ) dimîne .

Rêncber yek ji wî nifşê ku piştî Ceger-xwîn hat û rêça wî ajot , lê taybetiyeke wî yî xuya hebû , ew jî , girêdayî ye bi şêwazê hûnandina helbestan ve , helbestên wî weke ava liherik , gava di hatin sitirandin zû milet ew ezber dikirin , nemaze dema yekî weke hunermendê mezin Mihemed Şêxo ew disitirandin .

Ji helbestên Rêncber tê xuyanî , ku ew kurdekî dilsoz e , dilsozê mijara kurdî ye , Newroza sala 1975 an li cem wî pir bi şewat û girî bû , çimkî xewna wî ne li gor daxwazên wî serê wî êşandibû , ew dibin navê ( **Newroz bi şîn** ) di bêje:

(( Hezar û nihsed û heftî û pêncê
Dikim nakim daxwaz naghê amancê

Cejnê cîhan hemî tevde bi jînin
Yê me kurda tenê fîxan û şînin

Dengê êzgeh roja bîstê avdarê

(( Utlek fenî )) ji nişkî lê diyarî

Dizanê kurdistan tev maye xemgîn
Di got rojê nêzîk lê b'kin guhdar

Ji partî hin ji pêşmergên dilovan
ji bo êzga kurdistan mane zêrevan ))

Rojnamek inglîzî b'navê Gardiyan
Bavê Luqman li Emrîka kir mêvan

Îsmet şerîf êrîş berda cinêvê
Mafê mirof bênkî bid me vê heyvê

Kurdistana belengaz ma şermezar
Newêrek man çeleng jî bûne firar

Kudên hawîr gotinên he bihîstin
Rojnamevan gotin pey hev nivîstin

Rojnama Hurrîyet xeber bi tirkî
Digot serok ji te dixwazim pirskî

Diyare ko cihan bi we dilîz
Koma cîhan neheqyê na bihîzî

Kurdistana Îraqê ji hev belav bo
Bi qêrîn û bi şîn hem helaw bo

Çep û rastî kurdistan windakirin
Bi topa hin dikuştin hin di mirin

Rojên kurda çendî reş û başin
Cîhan tev de li hemberî me şaşin

Vaye çend sal cenga kurda li dare
Koma cîhan nadê bo me biryare

Guhdar dikin hemî tevde bi hîzî
Tu d'bê qey yek vî dengî na bihîzî

Çep û rast tim li cîhanê birane
Rijêma hevpişkî ser me girane

Di bin hevpişkên hev malê girane
Li ber vê hem dixun berx û berane )) .

Rêncber dizane ku ji boyî jiyanê dilekî germ pêwist e Çimkî ew li yara xwe dinêre bê çendî ew sipehî û zengîn e , wilo jî , neyaran lepûşkên xwe li dorê pir kirine , Ew wiha ((pesnê ( **yara pîroz** ) dide :

Xem û xeyalên te ez revandim
Çol û bêlana te ez gihandim
Ji ber te sotim te ez pijandim
Bayê evînya te ez hejandim
Dil darê rûyê du singê teme
B'çeleng û çakî mêvanê teme
Ji ber fermana te heleste me
Sûnd bi serê te ez helandim
Dêrisim û Agrî ji taca tebî
Sîpan û cûdî du birhên tebî
Ormî derya wan du çavên tebî
Rondikê çavên te ez pêlandim

Şingal û Bêxêr du biskên tabî
Sindî û gulî kepîyê tebî
Gelîyê Elî ji devê te bî
Şîrîn zimanê te ez bezandin
Dicla û Ferat du kezê tebî
Kerkok û Hewlêr du singê tebî
Sersing û şeqlaw du lêvên te bî
Du ewrên çavên te ez weşandim
Hemrîn û Metîn du rûye tebî
Zozik û şîrîn du guhên tebî
Berzanî bixwe zimanê te bî
Li dor cîhanê te ez gerandim
Gera cîhan tev hemî j'ber tebî
Pêşmergên dilêr nîşana te bî
Ala kesk û sor singa te bî
Şahî cejna xwe te ez gihandim

Helbestvan berî her kesî dizane ku jiyan bê evîn nabe evîn jî bê viyan nabe , lê dema yar welatekî bindest be , hinga xebatek bê leka di ber de pêwist e : (( **Bingehe jînê** ))

(( Yarek min heye bi navê jîne
Tor û nazenîn ji min bi kîne
Qelenê giran ne b'zêr û deran
Ji min dixwazê tim jî û xwîne
Ma ez çi bêjim ko ez hêdîkim
Li çar birê xwe ezê gazîkim
Ji min jî û xwîn ji bo nîvîkim
Li ber pozê min gulek bi hîne
Va bûm evîndar ne kat û ne gav
Li ser dilê min bû jana zirav
Vegirt hemî can ta dil û hinav
Jîna bê evîn bawer ne jîne

Dermanê jînê divê ez bînim
Ko tim bizanê li pey evîoim
Çendî jê dûr bim divê bi bînim
Ji bo wê bûm Mem hemberî zîne
Yara min yare ma netim yare
Danîşgeha lê nav çar neyare
Gava nebînim dimînim jare
Hêvî ji xwendan ji bo min bîne)). .

---------------------------------------

## *ROYARÊ AMEDÎ*

Pirtûka wî ( xwîna kewan û siwarê rewrewkê ) di sala 1996 an de hatiye çapkirin .

Helbesta mamosta Royar jî , pir bi durfet û nîşan e Ew her û her giringiyê dide wêne û şêwazeya denkirinê .

Mirov dipelîne ku ew bêjeyên xwe bi zanebûn heldibrêje û piştre wan dike tevnek hunerî de .
Ji bo vî tiştî , helbesta wî ( Vedengine Şikestî ) pir balkêş e :
(( Li ser Têlên xanê , Ehmedgeha yekane
Hey lê xanê , Ehmedgeha ji bîrkirî
Qurnifîlên ber kêlan
Awazên demên ne hatîbûn
Tişt û sîtavên wan
Vadeng ên lerzîna şevreşka bûn
Buharên vemirtî
Fixanên aydîlocîyên şemtî bûn
Kî dikare
Hevîrê êgir bistirê û ne şewite ?
Kê dikarîbû
Ji xwîn a kêlan gewde yê xwe
Şuştî bihişta ?

Kî dikare ?
Kî dikare , bibe bînerê ....
Xwe kujiya xwe û bîner ....
bimînê ?
Ji asoyê çîçekan $ çiloyên payîzan $
Razên şivankenêk û balyozgehan
Xwe kiribûn kaşoyên pirrnetewe
Payîzên dem û tiştan , dibûn navên qonaxan
Fîxan û firyad dibûn salname yên pirsan
Mirin ne rojane , dibûn govendine her li dar
Û em dibûn bînerên xwekujiya xwe
Û em diman bînerên xwe kujiya xwe
Bikuje , bikuje , siwaro bikuje
Ger , Tu nikaribî kesî bikuje
Xwe bikuje
Bikuje , bikuje , birayo bikuje
Bavo bikuje
Lawo bikuje
Hîn ,hîn cih bê kêl mane
Hîn , hin kes nebûne ...
Xwîniyên xwînên xwe
Bikuje , bikuje , siwaro , bikuje ...
Bang a ku derbû
Bangeke yekane bû
Hêviya ku berz bû
Hêviyeke yekane bû
Bang a yekane
Hêviya yekane
Bi hevre , bi yek teyî
Hatin Firrandin
Bi demê re , bi dij demê re

Hatin Firrandin
Bi kirtên doh û sibe
Hatin windakirin
Bi xwekujiya îroyîn
Hatin valakirin
Wek , ku firrîn , windakirî man
Wek , ku firrîn valakirî

Firr, Firr, k, firr,
Firr, firr, ni\timan firr,
Firr, firr, k, kirr,
Firr, fir, aso firr,

Payîz nameya xwe negihandina tişta ye
Asonameya giyabo ya , li zevî yên mirinaye
Dengê yekane
Yekane dimîne
Dengê yekane
Ji demê cuda dimîne
Dengê yekane
Nîşana lehiyê ye
Wek xunava li tehtebejê dibarî
Wek gurmîna li bêdengiyê dikarî
Wek ronaka xwe devêje şevên terî
Xwe deng pêça
Û xwe deng berda
Deng yekane bû
Deng yekane ma
Gunehê kêye deng yekane bû ?

Gunehê kê ye dest bê binî bû berfirehbû ?
Gunehê kêye desta bê binî , berfireh kerr û lal bû
Pirs xesandî
Bihn çikandî
Aso çirandî
Kê ew deng bihîst ?
Kê ew deng ne bihîst ?
Mijbû
Baran û fixan bû
Omîdeke xwekuj bû
Ji dervî demê bû
Ji kul û xemê bû

| |
|---|
| Ez mame di hikmeta xwed. de<br>Kurmanc, di dewleta din. da<br>Aya bi `i wech, mane mehr/m<br>Bilcimle ji bo `i b/ne mehk/m |

Erê Xanî xanan " lamie " "necm " a te
Ji kan ya kulan yekane ye dengê te
Bi dengê teve
Me xwe sih dalqand
Bi siha teve
Me xwe dil rijand
Bi dilê teve
Me xwe" Na" hejand
Babet çibû ?
pirs li ku bû ?
Erê Xanê
Ehmedgeha sêwî !

Pîroz bû zikê te
Piroz bû berê te
Yekane ma dengê te
Erê xanê Ehmedgeha yekane
Ji asoyê çiçekan $ çiloyên payîzan $
Razên şivakenêd û balyozgehan
Xwe vemalîne ,
Kûr kûr , dijwar dijwar
Xwe vemalîne
Êstge ne pirrin ,
Ger , em karibin
Ûrên heviyan ji kalanê dem û xweliyê bikşînin
Dem ne alîkare ,
Ger , em karibin
Şînên xwe , - dîsa – , li ser canên xwe biçînin
Erê xanê , Ehmedgeha yekane
Dil valake
Ji her sî deman , dil valake
Ji ber tiştî , dil valake
Ta ku dem , bimîne rêzdarê demê
Ta ku deng , bibe dengdarê mirinê
Ji devê xwedê hatibûn velûkirin
Li qontarên çiyê hatibûn çandin
Bi rojeke sihdare hatibûn meyandin
Xanê paytexta ronaka tiştên negotîn bû
Bi zingargirtina demê re ,
Xanê dibû cîhaneke girtî ji bîrkirî
Xanê dibû leylan ,
Dibû navenda yekane ya ....

Xwe kujştina hêviyan
Erê Xanê , Ehmedgeha yekane ,
Erê Xanê dilê xwe kujştina yekane )) .

---------------------------------------



## *RÛXWEŞÊ ZÎVAR*

Ew tiştek balkêş li ser zayîna xwe dibêje :
Rûxweşê Zîvar bi xwe nizane kengê ew ji diya xwe bûye heya îro wî roja ji dayîkbûna xwe nenasiye û pê şanebûye .

Diya wî jê re dibêje : “ piştî yekîtiya jehra marê reş û marê bin zik zer bi du , sê salan tu li cîhanê bû mêvan .”

Nasnameya wî jî jê re dibêje “ di sala 1963 – yan de tu ji dayîk bûye . “
lê ew baş dizane , çawa ku navê gundê wî di wê nasnamê de hatiye guhertin û ereb kirinê ? wisa dîroka bûyîna wî jî tê de ji rastiyê bêpar e .
Lê belê xweş tête bîra wî ku çawa bi dijwarî di ber şivaniya berxan re çar salan li dibistana gundê xwe ya “ Dargirê “ xwend û piştî wê , dê û bavê wî ew ji ber hejariyê revandin birin bajarê “ Heleb “ ê di zîvarî werkirin .

Erê tête bîra wî , çawa ku wî ji neçarî , ji ber tunebûna dibistan û zankoyên bi zimanê kurdî di nav biyaniyan de û bi zimanê biyanê li bajarê “ Heleb “ ê xwend heya wî di sala 1985 –an de govanama endizyariya werzevaniyê ji zankoya “ Heleb “ ê sitand .

Ew tu carî ji bîr nake , ku çiqas ew kêfxweş bû , gava di sala 1975 an wî tîpên kurdî nasîn , hînî wan bû û hêdî hêdî pişt re bi dilgermî dest bi xwendin û nivîsandina bi zimanê xweyê zikmakî kir .

Û tu carî jî ji bîra wî naçe ku mamosteyê meyê mezin û giranbiha “ Osman Sebrmî “ sal û nîvekê xwe pê re westand û ew hînî rêzmana zimamê kurdî û hînî kurdayetiya dirust kir .

Berhemên wî

1 – Dîwana Goristana bê gor 1991

2 – Di kovarên kurdî helbestên xwe weşandine û hîn berdewame

Ew endamê komîta damezrandina Mehrecana kurdî li Suriyê ye , ya ku cara yekem , roja helbesta kurdî di 22, 10 li Suriyê , li darxistiye .

Rûxweş dikare ê xwendevan matmayî bihêle , ji ber karînên wîyî hinerî pir bilind in .

Helbestavn di helbesta ( **Parsek** ) de bihayê azadiyê dizane ta ew heyînê pê ve girê dide :

**PARSEK**

(( Bêkêrî li xwekir ,
Stûxwarî bi milê xwe xist ,
Hêstirên xwe hişyar kirin,
Li siya xwe siwar bû ,
Û hêdî hêdî ,
Berê xwe da bihişta parsê .

Silavek parskir ,
Pê çavên derdên xwe kildan.
Gulek perskir ,
Pê şînên xwe xemilandin .
Ramanek parskir,
Pê hişê xwe kir xewê .
Xwest azadiyê parske ,
Winda bû . )) .

Yekcaran deqên mamosta Rûxweş gerekî dubarekirinê dibin . Ango , carna deqên wî , hêsanî xwe nasipêrin xwendevanan , wekî helbesta ( **Lê** ) , Helbet ev jî durfetek hinerî yî hêjaye :

**LÊ**

(( Nêrînek berda dilê min ,
Êşên min tevizandin .
Kenek ji min re diyarî kir ,
Şînên min çilmisandin .
Bihnek li min girêda ,
Derdên min stûxwarkirin .
Dengek li guhên min xist ,
Xemên min lal û gêj kirin .
Xewnek li ser min vegirt ,
Birînên min ko kirin .
Gulek di navbera lêvên min de çand ,
Rehênn min serxweş kirin .
Di çavên berbanga min de wêneyek rest ,
Hêviyên min geş û dewlemend kirin .
Di deriyê hişê min de kilîtek bada ,
Hestên min rizgar kirin ,
Lê ....

Gava ku wê di deşta giyanê min de ,
Ev helbest min bişkivand ,
Ji bîr kir ku wê bînke .)) .

Helbestvan bejna helbesta kurdî dixemilîne , wê ber jor hildide û wêneyên nû lê dineqişîne . Ev yek di helbesta ( Bêjinga Gumanan ) de belû dibe :

## BÊJINGA GUMANAN

(( Ji bin simên rojê derket ,
Ket nav diranên şevê .
Tarî şikand ,
Dûyê kuştaran lê der bû
Xwe ji mirinê dizî ,
Di bêzariyê wer bû .
Xwest carekê li xemên xwe siwar be ,
Bihna gumanan ew gezkir .
Guman yek bi yek ,
Girtin ,
Komkirin ,
Di xwe de bêtin ,
Ji nişka ve ,
Kaniyên jan û kovanan ,
Tê de bişkivîn ,
Û bi hêrs ,
Marên sor jê herikîn ,
Herikîn ....
Her û her diherikin ....
Û canê wî ,
Min ,
Te ,
Li pey xwe dixuşîne .))  .



## *SALIHÊ HEYDO*

Hin ji helbestvanan hene , jiyana xwe tev de bi helbestê ve girêdidin. Ango , jiyana xwe jê re dikin qurban .

Yek ji van helbestvanan Salihê Heydo ye !
Helbet , ev tişt ne ji valahiyekê ye , lê ji zanîneke giştî û jankêşaneke taybet e . Gelo Salihê Heydo kî ye ? û çîroka wî çi ye ?

Di roja şeşê adarê sala 1956 an li gundê Hesê Ûso hêla Amûdê ew ji dayika xwe re bûye .

Wî , di bîst û yek saliya xwe de , dest bi xwendin û nivîsandina kurdî kiriye û sala 1979 an û vir de , hertim navê wî bûye sitêrek geş di asîmanê helbesta kurdî de .

Helbestên wî di gelek govaran de belav bûne ji wan : Gelawêj – Gulîstan – Sitêr – Xunav – Zanîn – Roj – Gurzek Gul – Bihar – Pêşeng – Metîn – Armanc – Rewşen – Dugir û Dengê Azadî .

Bizaveke wî yî xurt di warê zargotin û kelepûra kurdî de heye ew vê bizava xwe di govaraên kurdî de belav dike .

Ji berehemên Salihê Heydo yên çapkirî :
1 – Kêferat Dîwana ( 1 ) yekê – 1985 – helbest .
2 – Perîşan û Memê şivan – 1985 – destane .
3 – Birîna kûr dîwana ( 2 ) didiwan – 1988 – helbest
4 – Serpêhatiya Tûmazê kildanî û axa yê şêrwanî - 1996 – pexşan û piroz .

5 – Evîna welêt – Dîwana ( 3 ) sisiyan – 1997 – helbest

Her xwendevanek , piştî xwendina deqên mamosta S Heydo , dikare hesanî bibêje ku deqa wî hevgirtî ye .

Di helbesta ( **Dil Bi Êşim** ) de , ew sedemê halana xwe dizane û li ser navê gelê xwe bersiv dide , wekî hatiye zanîn , tim helbestvan ji lêdana dilê gel dipeyive :

(( Halaneke pir xurte ku îro ez dibînim
lewra dil bi êşim
Jana wê gelek dijwar û kûr û pir yemane
cergê diguvêşim
Xîzîn bi mi ket îro ji caw bir û erînan
wek topê qumêşim
Rengê ard û hevkîngê bi destêr têm hêran
di hndirê êşim
Herdû gawirên kevra li ser min va digêrin
hestî diterêşim
Heyanî bi hêranê de jî hildipekim ez
li rûyê qerêşim
Ev halê min her ku serî rakim ji bo heq
şûrê xwe bikêşim
B'kuştin û bi qirkirnê mi zora herkesî bir
ez tê de li pêşim
Her carekê fermanek li cîhanê ku rabe
tim jê ez bi bêşim
Daza min li dara bi stirî gerya ye îro
rengê hevremêşim
D'nav çavê neyaran de wekî dirrî diyarim
şojin û dirêşim
Doza min li pişta min di tûr de pê digerin
rengê derewêşim
Parsê dikim ez pêpê li her deryî dixînim

daxwazê tewêşim
Dostan qewirandim û ji mir gotin de siktir
qey rengê kelêşim
Berjêr diçim û dîsa li roja xwe dinêrim
yan jî ez li kêşim
Nawestim ebed çavê mi jî qet naşikin jê
b'gavên xwe li pêşim
Çendî jî ku dijwarî bibînim paşde naçim
çimkî xwedî kêşim
Behwer bikî pir nêzîke ku roje bibînim
ewran biqelêşim
Ev dîbek û merwend û zilindara ku min xwar
j'nava xwe verêşim
Da agir û burkanê dil û canê xwe derxim
dijmin bitevêşim
Ez kurdim li kurdistanê şîn hatime îro
nej'erdê hebêşim
Heyanî ku ez neghême encamê di cengim
şerqê di felêşim
Tevna ku neyal' dara min hûnaye îro
ez wê vederêşim ))

Helbestvan nirxê ziman dizane . loma , milet ber bi xwendinê de lê dixe , çimkî bandora bindestiyê pir tund û dijwar e .

Ew di helbesta ( zarê te kanî ? ) de dibêje :
(( Ey keurdê xwende zarê te kanî
Serê xwe rake rengê mêranî
Ku tê pişaftin di vî zemanî
Jêre biwestin ji rengê xanî
Pêşxe hinekî vî zar – zimanî
Ewe şana me , ya niştimanî

Biparêze wî ji hingê neyar
Wî bidin xwendin sibê û êvar
Rojnamên kurdî , pirtûk û kovar
Mijûl bibî pê , bibe agehdar
Eger ziman çû dê bimînî bêwar
Ji bo zimane ev şerrê dijwar

Zimanê kurdî ji me tê xwestin
Divê ji bo wî em pir biwestin
Wî paqij bikin em ranewestin
Divê bi xurtî bidin parastin
Bi bend û mijar , yan jî bi ristin
Gotinêd Heydo , gelkî duristin ))

Rast e , evîna welêt li cem helbestvanê me Salihê Heydo , di ser her tiştî re ye . Lewra , mirov matmayî namîne , ew wê li hevkirina li cem mîrûwan ji gelê xwe re jî; hêvî dike . helbesta wî ( Mûristan ) bi pend û şîret e , lê ew di ,gewdê çîrokeke helbestî de hatiye nivîsîn .

Ev şêwazê hinerî dihêle mirov Ibn Elmuqefe' û (kelîle we Dumne ) a wî bi bîr xwe bîne :

(( Rojek ji yên buharê ez derketim beyarê
Di çim geştê li kevya li nav nêrgiz û giya
Ku xuristê bibînim razê wêna hilînim
Da bikêşim bux û bîn ji wan gulên sor û şîn
Piştî ku hinkî westyam ez li cîkî veniştyam
Qursek giyayê şîn bû wek xalîçek rengîn bû
Tiştek ji min bû nîşan ez kirim lal û heyran
Du kêşwerên mûristan li nav gul û gulîstan
Hemî yek dest û yek dil li rex hev bûn mil bi mil
Mîrwên çalak û reşbûn jêhatî û keleş bûn

Diçin û tên li xêzê li dû hevin bi rêzê
Hinek diçin hinek tên bê deng û his û qirrên
Dibizivin yek lebat dikirne kar û xebat
Hemî li yek rêkxiraw keç û dê û bav û law
Her yek dibin barê xwe xweş radibûn karê xwe
Bi zagonek xurt û jîr li peyhev bûn bi zincîr
Çêtir ji ya dewletan xweştir ji ya milletan
Ez çûm mûristana din min lê nerî serobin
Ew jî hemî yek terez dikoşan b'lez û bez
Bi dev wan genim û ceh bargiranbûn wey guneh
Karwanê wan li rê bû yek xet û yek sirê bû
Kêferata jînê ye tev ji bo heyînê ye
Hinkî mi l'wan dimêzand hişê min tiştek kişand
Ez diçûme kûr û dûr divê ez bikme serbûr
Wek hev bûn herdû kêşwer bi lebt û reng û tevger
Ji min nedbû diyarî ferqa wana tu carî
Min xwest ez bikime taqî tev ku min kir neheqî
Min çav berda mîrokê ku ez têxim dîrokê
Rahişte wê hêdîka ew kire nav tilîka
Ji rêze wê biderkir di rêza din mi werkir
Çawa ketî riya wa mîro hemî lê civyan
Hin ji pêş û hin ji paş laşê wê kirne telaş
Kirin du perçe û ker ji riya xwe kirin der
Ez ramiyam kûr û dûr li qanûna kêz û mûr
Ew jî bi hev dizanin bi destûr û rêzanin
Destûra wan azadî kar û xebat û şadî
Qebûl nakin xeşm û zor heye ji wan re sînor
Em jî weke mûristan bibana yek dil û can
Emê zû de serbest ban bi kêşwer û dewlet ban
Dijminê hov û xwînxawe meyê ji rê kirba der)).

Wiha , ji me ve hate xuyanî , ku bihna taybetiyên helbesta kurdî ya kilasîk û rastgo ji deqên mamosta Salihê Heydo difûre .

Bi nêrîna min ewê di pêşerojê de cihê xweyî normal , di dîroka meyî toreyî de bigre . û her pêwist e ku lêkolînên rexneyî hey jê hebin .

---------------------------------------



# *SE'ÎD YÛSIF*

Mamosta Se'îd Yûsif , di sala 1947 an de li kolana Qudûrbeg bakurî Qamişlo ji dayika xwe re bû ye ..

Piştî ew hînî sazkirina tenbûrê bû , nêzî sala 1965 an wî xwest sitranan ji xwe re binivîse.

Di helbestên xwe de , wî bizav kiriye ku awayê kêş û hermûniyê bi serkeve.

Her kes dizane ku mamosta se'îd sazvanekî çeleng e Helbestên wî hatine sitirandin û di nav gel de belavbûne.

Du pirtûkên helbesta ji hunermend Se'îd Ûsif re hatine çap kirin :

1 – Govenda dilan – Hebest – 1995

2 – Rewşen – Helbest

Helbestên wî yên seranserî welêt deng dan e welêt helbesta

( **Kurdistan yan neman** ) , nayê jibîrkirin ku gelek , hunermendan ew sitirandiye :

(( Kurdistan yan neman
Em kurd li ser ya xwe man
Bo kurdistana rengîn
Em tevde jêre bi qurban

Na tirsin ji top û ber
Em singa xwe diddin ber
Roja ku em dikin şer
Weke em bikin dîlan

Lo lo kurd bik xebat
Va îro roja me hat
Em bostek erda welat
Nadin bi malê cîhan

Em ev kurdê dîne mêr
D'meydanê de bûne şêr
Bo erda mey zîv û zêr
Em dikin şerê giran

Pêşde diçin naçin paş
Me dijmin tevde kir kelaş
B'yekîtî ya kurdê baş
Bi şiwr û raye merdan )) .

Wiha , dema mirov helbestên M . Se'îd dixwîne , mirov dizane ku evîneke pir mezin û dijwar ji dilê wî difûre , û wê rast be ku mirov nav lê ke evîndarê sipehîtiyê .

Helbestên wî , bi taybet yên evînî , yên kêlîkan e , kêlîkên hêrz û dilgermbûnê helbesta ( **Mala we** ) vî tiştî eşkere dike :

(( Mala me l'cem mala weye
Ti b'tenê sebra mi b' tetê
Dilê m' gelek di te heye
Wa gezoka l'dara ketê
Dawet îro l'gundê meye
Rabe de m'herin dawetê

Bejna te j' dara xêzeran
Ti l' xweke wî xişrê giran
Destê min bigre û bike dîlan
Delelê şêrîn şerbetê

Go yekî weke mi b'tere bê
Ti xwe b'hejîne j'kezebê
Û xeftanê b'qeseb li te bê
T'nizanê çiqas li te tê

Tê qîz û xorta dîn bikê
Û dilê kalo pir şa bikê
Tê dîlanê ruhnî bikê
Hey stêra j'ezmana daketê )) .

Çend helbestên bi şêwazê lihevegerandinê navbera ( Kur û keç ) de ji wan ( Bêje eman ) , ( Ez te nadim ) , ( Çav kilke ) û ( **Yek bin**) di helbesta dawî de M . Se'îd doza wekheviya jin û mêran dike :

(( Keç : Yekbin bi hev re
Bidin soz û peyman
Bese bindestî

Ev qa sal û zeman
Kur : Bi xwendin û top tep de bikin xebat
ji bo dengê we herê koma cîhan

Keç : Em keç di cengê de
Şer dikin wek mêran
Wek gura em dadin
Dijmin dibe wêran
Mistek axa welat
Bihatir j' zêran

Kur : Kurd tevde bibin yek
Bi hev re bidin soz
Em li dijmin bikin
Tim dûman û bahoz
Azadiya welat
Bo me armanc û doz
Welat bi parêzin
L'dijmin bikin ferman )) .

Rewşen , navê pirtûka M. Se'îd Yûsif ya diwemîn e , ev jî dilsoziya wî di gel mîra kurdî hêja Rewşen Bedirxan dide xuyanî .

Di vê pirtûkê de têkliyên helbestvan bi hewîrdor re fireh û kûr dibin , ta ew xwe nemir û canfida yê amancê dibîne Helbesta ( **Derba li mi xe** ) nîşana vê rewşê ye .

(( Derba li mixe
Bere z' birîndarê te bim
Min bi êşîn
Heme ku ez li cem te bim
Ne şerme ez
Bimrim ji derdê evînê

Min bikuje
Bere z' miriyê bejna te bim
* * *
Ker û gêj im
Ma kî heye bi halê min
Ez pir dêşim
Te agir berda rihê min
Dil û sewdan
B'teve mane girêdayî
J'kêre bêjim
Li ba teye dermanê min
* * *
Besî min e
Gu her sibeh l' te binêrim
Wek te tune
E'l' dinê çiqa biderim
Rê û rêwan
Jiber
Min hatine girtin
Êdî ezê bi kû ve herim Dil b' te re ye))

Di dawî de mirov dikare bibêje ,ku M. Se'îd Yûsif , mîrê tenburê , karîbû
warekî ne tenê sazê , lê belê ji helbestê jî , ava bike . Herwiha , rêveçûna jiyana wî pêwistiya çêkirina pirtûkek taybet dixwaze .



# *SERHAN ÎSA*

Helbestvanê me di sala 1973 an de li gundê ( Elereş ) ê nêzî Tirbespiyê hatiye riwê dinê .
Wî di sala 1988 an de dest bi nivîsîna helbestê kiriye , û di gelek kovaran de nivîsiye mîna : Stêr – Pirs – Roj – Zanîn .
wî bi sê navan dinvîsand : Bextreş - Wanê – Rêdûr

Dîwaneke wîyî çapkirî bi navê ( Dûrbûna te Despêka Helbestê ye ) heye – 1997 .

Serhan helbesta serbest û bê kêş dinvîse , ew jî , mîna gelek hevalên xwe dixwaze helbesta nûjen ciyê xwe di toreya kurdî de bigre.

Ji helbestên mamusta Serhan me helbesta wî ( **Fîxan** ) helbijartiye , ev jî despêkeke ji bo em bikevin cîhana wîyî helbestî de .

(( Çavên te
Di
Bêdengiya dilê min de
Pîkolê dikin
Qurçikên oda min
Ker û lal mane
Kursiya te

Di
Encume şevê de
Serxweş
Û
Mest
Xwe paladaye
Diwê
Qelûna wî
Destê min
Kilît kirine
Û
Kûraniya
Canê min de
Pirsên
Bê çareyî yê
Di rayêxe
Û
Ez
Hîne
Welatekî winda me
Di
Nexweşiya temenê te de )) .

Wêneya hevdûdanî ji gelek kerpîçên hevgirtî çêdibe lê her kerpîçek jî , wêneyeke , tevlû ku ew ne serbixwe ye wekî nimûne helbeta ( **sirûda hêviyan** ) :

(( Li ser
Pişta rojeke
Payizî
Di
Malzarokek
Rizyayî de

Di
Nav komek pişkul de
Min
Hêviyên xwe
Stirehan
Di
Meşkek diriyayî de
Kildan
Û
Li ber
Bakî semûr
Min
Raxistin )) .

Gelo ev wêne ne nû ne ? nûkirin jî , weke evînê pîroz e lê her yek taybetiyên wê hene , weke ku di helbesta ( **Mexelê Ramîsanan** ) de hatiye :

(( Ramanan
Ez
Dikişandim
Dûr diketim
Nêzîk dibûm
Li ser .....
Peyvên bi tîn
Radiziyam
Hişyar dibûm
Xwe .....
Di nêv kavlan de didît
Hildikişyam
Serê girekî
Bakî hênik li min dida
Dîlbera .....

Ji rengê heyvê
Ez hingavtim
Min xwe ...... li xwe vegerand
Stêran .....
Li ber
Mirçêna ramîsanan
Dîlan girtibûn
Gerdûn ....
Di bin lêvêd
H
E
R
I
F
T
Şevê ....
Xwe li ser demê
Berûpaş siwarkir
Ji nişkave
Ramanan şûreşa bendewariyê
Meyandin
Û Çemek.....
Ji ramîsanên bi dizî
Mexelt
Pengeha )).



# *SEYDAYÊ KELEŞ*

Navê wî Hisên e,Kurê Mihemedê Keleş e , sala 1930 î li gundê Bizgûrê hatiyê dinê . Seyda ji dê û bavê xwe sêwî ma ye , gelek jar û perîşanî dîtiye . ji serxetê daketiye binxetê û feqîtî kiriye,pişt re bûye rêncber , niha ew li Qamişlo dirûne . Ji despêka damezrandina partiya kurdî li Sûriyê ew kar dike û hîna ew xebata xweyî netewî didomîne . Berhemên wî yî çapkirî ev in :

1 – Dîwana yekê – Em û Dijmin
2 – Dîwana didiwan – Rêka Gel
3 – Dîwana sisiyan – Derdê Milet
4 – Dîwana çaran – Ronahî

Seydayê Keleş dikare di helbesta xwe de nêrîn û armancên xwe bide xuyanî .

Helbesta wî ( **kelemper** ) jiyanek tund eşkere dike:

(( Bayê li me da dane ber xwe û revandin
Sed kaş û newal dûr û diêj em qulipandin
Em bûne kelem ku li ber bê diravin xeş
Pîj û keleman kincik û cilkê me qetandin
Canê me hemî xêzk û teriş sorbûn ji xwînê
Xîp û diriyan her derê laşê me çirandin
Gazî û hewar nalîn û qîr pir ji me çûne

Pêçî û nenûk ji dest û nigan tev de revandin
Noq bûne newalan ser û çogê me dibên hûr
Hîmê keviran dest û nigên me va revandin
Enya me li tehtan dikevî şingîn û şerqîn
Ev poz û diran dev û bêvil tev tê şikandin
Sed tîş û birîn va ne dilaşê me ve bûne
Vê êşê û vê janê hinavê me hilandin
Xwîna me li herder dirêjî rêz û şeripan
Zanim ku neyarê me li me ser digerandin
Taldek ji me re nîne ku em zû bidin ber xwe
Tim ba û zeber tê li me em dane gerandin
Ev ba û birûsk tev de ji bo me bi xezeb tê
Fîz fîz dikî bend û dîwar tev herifandin
Birçî ne em tazî ne hemî mane perîşan
Berê xwe didun kû deverê em ne hewandin
Bayê bi hiner em birine welatê xelkê
Destên me ne girtin û ji nav xwe qewitandin
Kurdên me li welêt ma ne perîşan
Bêbava û xwînxwara milet tev şewitandin
Qirdê me çima waye ku em bê ser û ber man
Zordar û sitemkara milet tev pelixandin
Em bûne heşa reş ketine nav dilê xelkê
Kedxwara û serdara milet vaye mirandin
Faşista welatê me kirin perçe û parî
Peymana welatê me hemî tevde çirandin
Xortên me ji xew rabin werin hevdû bibînin
Da şopa neyar ji roj hilat bête birandin
Destên xwe bidin hev û bibin yek di lû perçe
Da riknê neyar tev li welêt bê herifandin
Kabûsê mezin ketiye welatê me bi zorê
Van şêx û melan beg û axan em weitandin

Bê hiş û serî her dem li pey wan dimeşin em
Sed salî li ser me xwe bi vî rengî meşandin
Ma kengî xwedê wer gotiye divê li pêş bin
Em kurdên reben tenê bi van hatin xapandin
Ta îroj nokerin xwe ji bin bînin derandin
Mejyê me bi zîngarê genî hate veşartin
Pir sal û zeman jê re divên bê xerutandin
Kurdên me divê tevde ji vê xewê şiyar bin
Xwîna me divê li ser çiyan bête rijandin )) .

Ji bo vê rewşa dijwar ku kurd bûne kelempera liberbêketî û, seyda qîr hewar dike ( **Bese Kurdo** ) ji xew rabe :

(( Bese kurdo hey heware razan ne ma ye
Her kes bo xwe kar û bare bo çi tu maye
Dengê cenga cîhan kurdo ma na bihîzî
Li her derê biner kurdo agir dilîzî
Cenga tang û toran kurdo ma tu nabînî
Li ser çiyan tu çekdaran çima naşînî
Nema êdî xew tê kurdo nikarim razim
Şûreşgêr û xwendivanan ji te dixwazim
Heta kengî tê bimînî birçî û tazî
Milet perîşane kurdo azadixwazî
Rêça azadî bixwaze jê venegere
Van ristikan pir bi xwîne û lê venere
Ev ji te tê xwestin kurdo gelkî bixwîne
Şopa xurt û zanebûnê tê xweş bibîne
Li meydana şeref rabe bike xebatê
Şerê dimin bike kurdo têkev lebatê
Paşverûyê cîhan kurdo te vde ne dostin
Tev de dizin bo xwarina tev malpostin
Kurdo rabe rê dê bigre bo xwe bide ser

Şerê dimin bike kurdo rabe li herder
Were bo te bêjim kurdo rêya azadî
Bo welatê xwe tu negrî bibî dilşadî
Li bin destan bes bimîne va em xerabûn
Li ber dijmin dest hilîne va gel tev rabûn
Şiyar bibin kurdo rabin tev de mêr û jin
Êrîşî neyran bikin tev da bikujin
Kesî ne hêlin li ber xwe ta yek nemîne
Welatê xwe tevî bixwe û lê bimîne
Neçe derve ji xelkê re rebin xulamok
Li welatê xwe bin kurdo bibin reh kok )) .

Ji her xwendevanekî re diyar e ku paldana helbesta seydayê keleş li ser wateya wê bi tenê ye !

--------------------------------------



## *SEYDAYÊ TÎRÊJ*

Navê wî Nayifê Huso ye , sala 1923 an li gundê Nicim hatiye ser riwê zemînê , xwendina xwe li Amûdê dest pê kiriye ta sertefîka biriye , xwendina Quran û pirtûkên olî li ber destê Mele Birhîmê Golî tewaw kiriye , bûye yek ji endamên Komela Xoyibûnê , piştre ketiya ( koma ciwanê

Kurd ) de , dostaniyek xurt bi Dr . Nûredîn Zaza , Dr . Kamîran Bedir – xan , Hemze Begê Miksî û Cegerxwîn re kiriye , bêguman wana ew hîn dikir lê seydayê Tîrêj bi xwe dibêje ku ( Cegerxwîn ew hînî nivîsîna helbestê kiriye ) .

Di sala 1952 an de , di ferweriya Şîşeklî de , ketiye zindanê De , çar pirtûk ji Tîrêj re hatine çap kirin :

1 – Xalat – helbest
2 – Zozan – helbest
3 – Cûdî - helbest
4 – Serpêhatyên kurdan

Dema Cegerxwîn bi Tîrêj re diwestiya , hêviyek wî hebû ku gotinên wî li boşê naçin , loma , di dîwana xwe ( **kîme Ez** ) de ev gotin gotine :

(( Em xwendin û zana bûn ,
Nêzîk dikim serxwebûn ,
Xortên wek te pir zana ,
Gerek bêjin nezana ,
Bila destên hev bigrin ,
Di vê rê de em bimrin )) .

Tîrêj , ev daxwaza mamostayê xwe kiriye warê çalakî û bikaranînê , ta heye ew wê ji bîr nake . Ango , ew nirxê nivîsokê dizane û di ber berjewendiya gel de ew livandiye :

(( Xama Qederê
Ey can were lêvên hev û dû em bi doşin
Der lêvên şekir ava heyatê em bi noşin
Emrê me di gerdûnê çend salên bi hijmar
Ev jîna ku em têdene bi erzan ne firoşin
*            *            *
Ev jîna ku em têdene tev xwen û xeyale
Sermiyanê evîndaran tenê cam û peyale
Der çola evînê em li rewrewkê siwarin

Berpêlên li ba bê gem û hevsar em li qoşin
* * *
Cogên me duşer nayên di lîskê timî çik tên
Çawa hilddin nayên du mîr tim ker û pik tên
Goga me bi çoganê me qet nagihê serşeg
Berkên me di nerdê û şetrencê de boşin
* * *
Xama qederê ev bû li enya me nivîsî
Teşya felekê tayê kefen herdem dirêsî
Bergora reş û tarî li benda meye ey can
Daxwaza evînê ew neyê zolt û qurûşin
* * *
Qîma xwe emê bînin bi mey re şer nivistî
Nîska berkelî çandî bi kurtêlê şikistî
Maldar hewceyê malê dinê gerş û germarin
Têr nabin ji gunyayê wekî berxê li kûşin
* * *
Qurtek ji meya den li derê meyxan û kumca
Nadin bi dur û cewher , bi elmas û bi genca
Ka gencên di Qarûn û Sikender
Ew dangevê dînar û dirav paleya pûşin
* * *
Medvê em li ser şopa sîyamend û xecê bin
Şûnwarê evînê li riya Zîn û Memê bin
Wek wan da bi merdî têkevin rûpelê tarîx
Ey Tîrêj te çav û gav li serkir Tim nexoşin )) .

Gelê kurdistanê têkoşîna xwe berdewam dike , vê hişt ku nîrne lihevhatî çêbibin û ew mafê xwe qizinc bike , raperîna 1991 ê dîrokî ye ji ber vê jî , Tîrêj bang dike , da qizinc bêne parastin .

Di vê helbesta bi navê ( **Govenda Dem** ) de , Tîrêj hozanekî
pir zana tê xuyakirin :
(( Dikim pîroz û mizgînê vê kongir û civînê
Li parêzgeha Erbîlê di vê dora zemînê
Bi hêvî û omîdin gavin xurt û firehtir
Ku hûn bi pêşde bavên bi zanîn û yeqînê
Bi govenda demê re divê em pî li bakin
Pirbikin dost û yara nebes bi destê me çavnerînê
Eger ne reqsevan bin tu kes destê me nagre
Yê ku neqlê neyînî bê pişk û par dimînê
Gelo heya çi wextê emê xwînê birêjin
Bi texmîn û qiyasê bû wek çemê sefînê
Laşê gernas û mêra ji ber gulê neyara
Nemaye cî ji derdan birîn li ser birînê
Tilî nema xwe digrin li çeqmeqê tifinga
Zingirînê ser û bin tev ji germê ji tînê
Axa welat seraser çiya û deşt û hêrik
Kort û newal û mesîl toqbûne tev hêrik
Vebûne cok di riwê naz û delal û rinda
Ji hêsirên li pey hev ji ber şîn û girînê
Divê mejyê xwe bêtir em têxin ber xebatê
Belê rext û tifinga navêjin ser kulînê
Neqeb namînî vala ber êrîşên neyara
Divê em tim li karbin di kozik û kemînê
Bi aştî û tekûzî em dakevin xebatê
Dêmoqratiyê bixwazin ne bi agir û rivînê
Kurdistan dewlemen e m'edena zîv û zêr e
Komir û neft û hesin derxin ji jêr zemînê
Vî welatê xwe yî xweş ava bikin seraser
Da bên seyran û geştê ji Ewropa ji Çînê

Daxwaza dilê Tîrêj serxwebûna welate
Em jî bi serfirazî têkevin warê jînê )) .

Ev helbesta rind û ciwan bi ( 14 ) kitan hatiye nivîsîn lê yek caran kîtek yan dido bi serve bûne , li gor nêrîna me ev şaşî divegere nivîsîna wê ya bi tîpên Erebî û guhestina tîpan berev tîpên kurdî .

Helbestvanê me , Tîrêj diltenike , evîn wî dihejîne tevlû ku temenê wî bi ser heftê û pêncan ketiye . kurd dibêjin : dil pîr nabe !
Tîrêj tim xwe dibîne wek xortekî çardeh salî :

## EZ Û DEM

(( Dema min çû bi valatî mi tiştek jê ne da ser hev
Ruwa min her bi ava çû di bû tarî li min bû şev ,
Ciwaniyê dev ji min berda ji semta min gelek dûr ket ,
Çiqa min bankirê ho – veneda , Derdo , ne da bersev
Xwezî carek tenê , jaro , ciwanî ew bihata min ,
Minê derd û kul û êşê , xwe jê re tev bigota b'dev
Keç û qîzik diçin avê dibêjin roj bi xêr , Apo,
Tu kale dest bi gopale xwe bi d'alî ji rê derkev
Wekî dodê qulingvanê bi deng , naşî dibên dodo
Xwe deyne va quling hatin delava , wê bi tirisin tev
Mi dabû pey evîna dil berê , lê pa ne bû qismet,
Me çav û gav û xortanî li ser kir hê ne besbû ev
Tiyê işq û evînê bûm Şev roj û meh û salan ,
Belê çi b'kim heya vê ga ne noşî min ji kana dev
Ji ber jana evînê , dil seraser tim birîndare ,
Ezê çi b'kim birîn kûre bi derman nema tê hev

Evîn ku biba xortek bi sûnd min dê bikuşta ew ,
Li darbestê drêj bikra li ser raxistba çar çef ,
Kefen bikra ji qerpalê belengazê d'evîndara
Minê dahiştiba gora reş û tarî wekî bandev,
Li kêla bersevî danya du sê rêzên diwêta reş
(( Eve warê te bingoro gunehkaro , bese rakev )).
Ji nû tîrêj ewê qîrek bi daya dil bi mizgînê ,
Bese êdî rihet rûnê dilê xemgîn ne ma pey kev )) .

--------------------------------------



## *SILÊMANÊ AZER*

Navê wî Silêmanê Remezên e , di sala 1965 an de li gundê Beyandûr hatiye dinyayê , niha ew li Qamişlo dirûne .

Pêrtûkek çapkirî ji helbestvan Silêmanê Azer re hey e, navê wê ( Awazên kelo Girî ) ye – 1996 .
Helbestên wî serbest û bêkêş in û ji bêjeyên normal û rojane tên afirandin .

Carna wêneya hinerî pir birêk û pêk tê çêkirin , bi taybetî , di dawiya hin helbestan de ,wekî helbesta ( Û ... Tu nehatî ):

(( Mişt bûn :
Ew deşt .....
Ji bihna kelaşê ,
Bînkişandinê minî şikêrbûyî .
Min şev di Berbangê de ,
                Raxist
Û ,
Roj di êvarê de vêxist
Buhar rûtkirin
Û ,
Payîz bi pirtik kirin
Û ,
Tu nehatî
Spî bûn dehlên sînga min ,
Li bendî çêrandina ,
Aho , û
Keroşkên te .
Çermê xwe min guhert ,
Û hestiyên xwe kirne baqek ,
Û ,
Tu nehatî .
Dêmê mendala min reşkir ,
Ji girêdana hevokên xweyî rijî
Û ,
Du rondik di êvara ,
Înê de derxistin
Ji bo wê gavê
Û ,
Tu ne hatî .

Kulbûn çokê
Yezdanên min ,
Ji sira dergehê .
Ki nîşt û mizgefta
Tayê tizbiya minî ,
Not û neh xavbûye
Serê tiliya kuhbû
Ji wer gerandinê .
Û ,
Tu nehatî
Wa bajara serê xwe ,
Hinekirin ,
Di pijiqandina kefte – leftên min de .
Toz û xweliyê ,
Pencer û nerîn,
Li hemî qorziyê – endezyariyê
    Gerandin
Min lêvên xwe
Serjê kirin ,
Li ber kişandinên te ,
Ji bo nebêjin :
Tu ........ ,
Û ,
Tu nehatî ........ )) .

Bi rastî dawiya vê helbestê weke perdek reş çawa ku dipey dîtinge ...hek tiracîdî re bête danîn .

Dema mirov helbesteke weke (Xweziyeke Tewanbar ) dixwîne , mirov dizane ku helbest ne tenê bêjeyên lihevhatî yan hermonî yan wêne ye ...HTD

Lê helbest ev tev de ne :
(( Giriyekî ,

Devli ken û birîndar ,
Li ser şopa bîranînên te ,
Di hîvêzim
Xunava ,
Demên ji bîr bûyî
Li ber kêla asoyê ,
Şikêr bûyî
Ez di bêjim
Wiha
Carekê ,
Ji ser hêlana ,
Bînayiyên ,
Vemirtinên keskesorên ,
Xwe ji bîr kîrî davêjim
Çi xwezyeke
Tewanbar ,
Di gerdena erê û nabûna te de
Di guhêzim
Gunehkarim
Ber bûrîna canê kevnar
Ne sirûdek
Ne jî şînek
Di devjeniya
Bêzariya vedengên xwe de
Erê ez na rêjim
Ji cenga bextreş û dîndar
Ez vedigerim ,
(( Donkîşotim ))
Li ber çokên peyala teyî
Xwêdan dayî ji bendeweriyê
Cilika dem û gevizandinan .

Raxe .......... hîna yarê ,
Hîna ez bi dest limêjim
Dinoşim ez , berfa keziyên teyî pûk
Ser şaxên diltengiya xweziyên bê damar
Û di xepêrin ....... erê û naya te
Dilop ....... dilop
Ez dinoşim
Ez na ....... noşim )) .

-------------------------------------



***Dr. ŞÊRKO BEDIR - XAN***

Dr. Şêrko Bediexan ( Dr . Ebdil Mecît Şêxo ) ye li gor nasnama wî , ewî di 5 . 9 . 1951 ê li Efrînê çavên xwe vekirine .Û li wir tanî sala 1972 an xwedî bû ye .

Ew di vê salê de jî , diçe Berlîna Rojava , li wir pênc salan dimîne û bi Qaserî du sal û nîvan diploma zimanê almanî ji akadêmiya zimanên biyanî , di sala 1977 an de distîne .

Ew di sala 1984 an de macêstêr di rojnamevaniyê de , li lênîngradê dibe , Dîsan di vê salê de jî , Ebdil Mecît Şêxo belnameya mamosteyetiyê di zimanê Rûsî de ji zanîngeha Jdanovê werdigre .

Ebdil Mecît Şêxo di sala 1988 an de diktora di felsefa wêje ( beşê rojnamegeriyê ) de , li lênîngradê diqedîne . Piştî , ew ( 15 ) salan bêzariya biyanistanê bêhndike , vedigire cem Dîlbera xwe Efrînê , canê xwe bi stiriyên gulên kurdaxê dixurîne ,
û serê xwe bi baweşînên darên zeytonan dişo .

Berhemên wî :

1 – Rola Kovara " Dengê komkar" di bizava rizgarîxwaza gelê kurd de , bi zimanê Rûsî nama doktoriyê lêkolîn lênîngrad , 1988 ( afrandin )
2 – Bi kurtî dîroka lêgerîn li ser zimanê kurdî û zaravên wî , bi zimanê Rûsî , Prof . Q . Kurdo ( wergerandin ser zimanê Erebî ) Suriyê , 1991
3 – Kurtedîroka wêja kurdî Dr . M Xeznedar bi zimanê Rûsî , ( wergerandin ser zimamnê Erebî ) .Suriyê 1993
4 – Gurzek ji helbestên kurdî , yên hevdem, ( Wergerandin ser zimanê Erebî ) 1993
5 – ( Stranên gelêrî ) berhevkirin û pêşkêşkirina Museliyan , Lênîngrad . ( Guhaztin ji tîpên Erebî ser tîpên kurdî latînî , pêşkêşî û ronîkirina bêjeyên nenas ) destnivis Lênîngrad 1988
6 – Wêne ji filmekî pirçiyayî , hozanêd Muhsin Qoçanî - Dohok 1992 ( Veguhêzkirin ji tîpên Erebî ser tîpên latînî ( 1993 ) , destnivîs .
7 – Kovara Çiya awêna çanda kurdî li Ewropa ( 1965 – 1970 ) bi şêweya xelekan di kovara " Gelewêj" û pirsê de di bin navê Dr. P Berwarî de , çapbû ye , Lêkolîn ( 1993 – 1999 ) ( afrandin ) .
8 – Berhevokek helbestan bi navnîşana ( Sulava min digrî ) ( afrandin ) destnivîs . .

9 – Bi zimanê kurdî û Erebî lêkolîn , gotar , wergerandin û helbestan di weşanên kurdî de , bi navên karox , M . kardoxî M .Nebez , M . Botî , Robarî , Dr . Hişyar Elî , Dr . Dilşad Sindî , Dr . Şêrko Bedirxan , Dr . Pêşrew Berwarî , B. Midya , belavkirine .
Endamê komîta damezrandina mehrecana kurdî li Suriyê bû ya ku têde roja helbesta kudî li Suriyê di 22 , 10 , an hatiye li darxistin
Endamê komîta damezrandina " xelata Osman Sebrî ye .

Bi awakî giştî ev e nasnama toreyî ji Dr . Şêrko Bedir – xan re û hîna sitêra hêviyên wî geştir dibe .

Di helbesta ( **Hevalekî min** ) helbestvan rewşa jiyana hevalê xwe ji rengê hestan , tabloyek tiracîdî diafirîne :

**Hevalek min**

(( Bejin dirî
dil pişkivî
hêv gez dikir
Helbestê
ew dirût ,
minalekî
bi piytalek
giyan
zerkek
rûmet
peyvek
hêvan
li ber hilma
pajarekî pakrewan
ew şuşt .
Lê ,
li roja din

li ber dîwarekî
hilweşîyayî
li jêr sîtawekî
derewçîn
li bin dareke
kufikî
Dîsan
wî
encurên
keran
xwar
û bi ser min de
têr
vereşî
û têr

vereşî )) .
Heleb. 1996

Helbestvan evîndar e , erê ew evîndarê welatê xwe ye û çavên wî ji hezkirinê têr nabin , Ew vê yekê di helbesta ( **Di paşê kordaxê de** ) dide xuyanî :

( **Di pasê kurdaxê de** )
(( Bese !
Çavên xwe ,
Bi nêrîna çiyan ,
û giran bêşîne !
bi westîne !
Bi min re got ,
Û lêvên wê , li rex min
dilerizin –
Na ,

Ezê binêrim , bila dilopa dawiyê ,
Ji roniya çavên min
bikeve - !
Ezê binêrim ,
Ezê binêrim ,
Ezê çend dilopên roniyê ,
Ji tîrêjên çavên te
bidizim .
Pêlên porê dîlbera min ,
nazik nazik
hevdu maçdikin ,
Qermîçekên bêzariyê ,
Li ser rûyê wê ,
Wek sînorê welatê min
Nîgar bûn .....
Dîsan got , bese !
Çavên xwe bi nêrîna çiyan
û giran
biwestîne !
bêşîne !
bese !
Na ..., na ezê binêrim
Çawa " Ferhad bi evîna xwe
peykek ji " Şêrînê , re ,
li ser çiyayê " Bêkir ." çêkir
Ez jî ,
Bi nirîna xwe ,
Wênê " Berzanî" nemir
Li ser rûpelên
Van çiyan ,
û giran ,

avakim ......
Hêdî ,
Bijangên wê ,
Bi min re lîstin
kenîn,
Û ez jî ,
Hîn li çiya
û girên " kurdaxê "
Temaşe dikim ...........))

Rehên jiyanê li hev herbilîne , lê helbestvan bi dilbera xwe re di şahiyê de ye û ji nişka ve hêviyan dorpêç dike :

***1***

**Şêrîne** !
(( Wek dilopa şebnemê ,
li ser pelê ,
gulsora ,
rûçkên " Zînê" ,
di cejna " Newrozê de"
di ser lêvên Meme de
dikeve ...
şêrîne !
Şêrîne !
xweşe !
wek şêrîniyê gêlazên
te
di devê minî
ziya de ,
tî de ,
şêrîne !
û şêrîne !

***2***

Şêrîna min !
di çavên te de ,
er dê ,
hêvê
û royê
dibînim
bi rojê ,
çiya
û çemên min re
dikenin ....
Şêrîna min !
sirûştê bi xwe ,
bi min re got ,
ez ji memkên şêrîna te
çavteng dibim
bi xwe li xwana ,
bi xwe li xwana ,
û got
ez ji keskeksora
navka şêrîna te
tengezar dibim ,

***3***

Dilbera min !
dilê min ,
bi çiçkên te lêdikeve ...
porê te ,
destên te ,
gavên te ,

lîliyên te ,
zimanê te
hemî ........ !
        hemî ....... !
        yên minin .... !
û bi van jî ,
min helbesta xwe
        şêrînê !
li teşiyê xist
û hûna !
Ey cîhan !
        rast , ezê
                bimrim !! )) .

--------------------------------------



## *TENGEZARÊ MARÎNÎ*

Di awayakî tund e , dem di pûnijandina helbestvan de ber çav dibe û bêyî ti guhertin di xelekên tenahiyê de çêbibin , ew di vê mijûlbûna mest de tê pirtikandin . Ev ji helbesta ( **Vedeng** ) ê belû dibe :

(( Şev
Min bi tenê
        Nahêle
Nesaxiyê di gel min

Derbas dike
Her dipûnijim
Dikevim derya
Xeman
Tiliyan di ser
Simbêlên xwe re dibim
Dipûnijim
Ahîna ji
Kûrbûna xwe
Dihnêrim
Bi wan re
Di çim û hîn ez
Nevegeriya me )) .

Bê guman , nîşana herî giring di helbestên Tengezar de , ew helbijartina sernava ye . ku em li helbesta ( Lorandina Hêviyan ) û li hevhatina wê li gewdê helbestê bi tevayî binêrin :

(( Bi şermînî
Hozan ji min
Direvin
Payiz li ser
Delavên sawîrên min
Nivistiye
Sîtava xwe
Evîn ber bi min ve
Tîne
Eger ev .......
Sîtav bibe
Xewnek !
Ezê hêviyên xwe
Bi şadîmanî

Bilorînim
Bilorînim
Bilorînim )) .

Yek caran , helbesta Tengezar wêneyeke tenê ye , lê hevedûdanî ye.

Mirov dikare helbesta ( **sê çirûsk** ) bêne ber çavan :

(( Min sê çirûsk
Bi dest xwe girtin
Yek za
Bû
Çem û çikiya
Ya din
Hechecîkek penaber
Ya dawî
Helbestek kelogirî
Hersê gihan hev
Li ser .......
Welatekî ji bîrkirî
Girîn )) .

Hêviya Tengezar ( bê hêvî radikeve ) , lê dema hêvî ( bêgane ) be gelo rewşa wê li cem helbestvan çi ye ?

(( Şevê
Erê şevê
Ezê hestên xwe
Bi mestî tevî
Hêlîna derdên te
Yên bê semax- bikim
Te bikşînim vî axurê
Jiyana xwe
Tê çend
Bajarên li bendî hiilma dawî

Bibînî ?
Tê çend
Mindalên pêşeroj – nenas
Bibînî ?
Li min bibûrin
Ezê çend caran
Piyala te rakim
Û bêjim
N
O
Ş
Ş )) .

Tengezar , niha li Elmanyayê dirûne û em li hêviya berhemên wî yî xurtir û ciwantir in .

-------------------------------------



## *XEMGÎNÊ REMO*

Mamusta Xemgîn sala 1961 ê ji dayîka xwe re bûye ew li bajarê Derbêsiyê dirûne , ji sala 1980 î ve helbestên xwe belav dike , ta niha çar pirtûkên wî çap bûne :

1 – Axîna dil – 1992 helbest
2 – civata kulîlkan – 1994 – helbestên zaroka
3 – Keskayîyên kizirî - helbest 1996

4 - Şevên Deşta Mêrdînê - çîrok – 1998

Di helbestên xwe de , yên ji bo zarokan , helbestvan xwestiye sinc û gerdîşên pak û yên bi welêt ve girêdayî ber bi çav bike . Wî pesnê xurista kurdistanê daye,da hezkirina wê bikeve dilê zarokan . şêwazê nivîsînê ji zarokan re ne tiştekî hesane , lê dema helbestvan bi hestekî tenik û nazik karibe wan hembêz bike hinga ev nivîsîn divê bi rola xweyî perwerdeyî rabe û bê ezberkirin .

Weke vê helbesta bi navê ( **Newroz** ) :

(( Dayê cejna te pîroz
Îro cejna newroze
Rûkê tê yê geşî boz
Her sal li me pîroz

* * *

Destê te maçî dikim
Tu hêlîna me çûkan
Ey dibistana malê
Evîngeha zarokan

* * *

Îro cejn û şahiye
Di gel dost û hevalan
Emê herin seyranê
Li şax û li newalan

* * *.

Govend û çepk û sitran
Saz û awaz û dîlan
Vê buhara nû ciwan
Nêrgiz binefş û şîlan

* * *

Çol û beyar geşbûne
Bo vê roja ser salê

newroze dayê newroze
Li me pîrozke alê )) .

Helbestvanê me wek piraniya helbestvanên berî xwe , helbesta xwe bi kîtan sazdike , û gelek reng û cûr di rêveçûna xwe de , bi kar anîne :

1 – Helbesta deh kît : ew ji di helbesta **( Rêça bi Kaş)** de belû dibe :

(( Te berê min daye rêçek bi kaş
Du gav li pêşin û sisê li paş )) .

Wiha , wî gelek cûr bi kar anîne , wekî helbestên şeş kît - heşt kît û şazdeh kît ......

Ew di helbesta xwe de , ya binavê ( **Şahiya dil** ) , dibêje :

(( Tu wî te hişêm firandî
Xwe'd nêv dilê min de çandî
Kîjan bayî te'j mi'r şandî
Çav û demê min şahiye
Dipirsim ji bayê bêrîn
Ji ku hatiye ev şêrîn
Ketime nav baxê zêrîn
Bahara esman sahiye
Ligel hev du em difirin
Çol û beyaran dibirin
Yên wek me tucar namirin
Li her warî avahiye
Xewê şeva çiqas xweş be
Ku heyva te li jor geş be
Ma wê tarî çawa reş be
Bej û avî ronahiye
Herdû dêmên te pirtûk in
Çavên te rist û çîrok in
Lê dixwînim belavok in

Tev wêje û zanahiye
Ji zanînê digrim raman
Evîn bo mmin bûye derman
Yarê xwe tim bikî baran
Dilê'm beje tu lehiye
* * *
Min her divê ku şîn be dil
Ji her gulan tim tuye gul
Reha berdî nav cerg û dil
Evîndarî şênahiye )) .

Lê di pey berevoka ( Axîna dil ) re ,helbestvan barê helbesta xwe giran dike , çimkî ew dibêje xwêner ( Eger ku bi tiştekî hest nebû û pêlên dilê te tevranebûn , ez evê serbestiyê jî didime te , ku piştî te ev berevok xwend wê bişewitîne ) .

Mirov agahdar dibe ku mamusta Xemgîn ji helbesta xweyî nû raziye hemû hêvî û daxwazên xwe bi bejna wê ve kirine , û bi xurtî xwestiye yê xwêner wî nasbike , herwekî ew xwediyê deqeke ciwantir e.

Wiha ew li ser ( **keskayên** ) xweyî ( **kezirî** ) diaxife:
(( Ji keskayîya çavên te bû
Nîv – roja min
Bû keska yî .....
Rojek payîzî bû
Xunavîya gul – dêmmên te
Çemê dilê min , kir
Sibiheke buharî
Ji hingê canê
Ez balindeyekî xewndevanim
Di nav xewne – baxê te de
Hildifirim biharî ....

*   *   *

Erê canê erê canê
Ez , ne kelkvan bûm
Lê min kelek û
Kiştîyên dilê xwe
Di keske – avande berdane
Û ezê nizanibim
Ku wê bighêjin
Gir – aveke kesk
Yan jî
Li serê girde – latekê
Bi perçivin
Û xwîn bibarî .... bibarî
Cana minê
Bi vî dilê xunavdayî ,
Bi vî dilê xunavdayî ,
Ez koçerê
Keskayîyên te me ....
Şopdarê
Xaçerêkên te me ....
Min divê
Di binyada dilê te de
Melevan bim .....
De canê
Xalîçeyên gul – gulî
Di xaçerêkan de
Raxîne ....
Zêrevan û bendeyan
Ji peravê deryan
Hilîne
Lezke ..... bilezîne

Jîn kurte,
Her gavê keskayîyan
Nabarîne
Û min her divê
keskay ......keskayî )) .

Niha helbestvan Xemhînê Remo dixwaze ber bi nivîsîna çîrokê ve jî,here û di van rojên dawî de berevoka wî yî çîrokî ( şevên deşta Mêrdînê ) kete destê me de .

Em serkevtinê jê re dixwazin .

# *NAVEROK*



| | | |
|---|---|---|
| 1 | Pêşgotin | 4 |
| 2 | Abas Ismaîl | 6 |
| 3 | Alan Osman | 10 |
| 4 | Arşevê Oskan | 16 |
| 5 | Awazê Kalo | 23 |
| 6 | Bê bihar | 26 |
| 7 | Dêrsim Memo | 30 |
| 8 | Dilawerê Zengî | 35 |
| 9 | Dildarê Mîdî | 39 |
| 10 | Diya Ciwan | 43 |
| 11 | Dîlan | 47 |
| 12 | Ehmed Huseynî | 51 |
| 13 | Evîndarê Xemgîn | 60 |
| 14 | Ferhad Îçmo | 66 |
| 15 | Ferhad Çelebî | 74 |
| 16 | Fethula Huseynî | 78 |
| 17 | Heyderê Omer | 83 |
| 18 | Jan Dost | 86 |

| | | |
|---|---|---|
| 19 | Kamîran Bêkes | 90 |
| 20 | Kasî | 96 |
| 21 | Keça Kurd | 102 |
| 22 | Konê Reş | 106 |
| 23 | Kovî | 112 |
| 24 | Lawkê Hacî | 115 |
| 25 | Lewendê Dalînî | 118 |
| 26 | Mele Ehmedê palo | 122 |
| 27 | Mele Nûriyê Hesarî | 127 |
| 28 | Mihemed Hemo | 134 |
| 29 | Mihemed Şêxo | 139 |
| 30 | Mihemed bakiro | 146 |
| 31 | Namî | 149 |
| 32 | Nezîr palo | 153 |
| 33 | Nûjen | 157 |
| 34 | Qehar Silo | 162 |
| 35 | Rezo | 167 |
| 36 | Rêncber | 173 |
| 37 | Royarê Amedî | 178 |
| 38 | Rûxweşê Zîvar | 183 |
| 39 | Salihê Heydo | 187 |

| | | |
|---|---|---|
| 40 | Se'îd yûsif | 193 |
| 41 | Serhan Îsa | 198 |
| 42 | Seydayê Kelêş | 202 |
| 43 | Seydayê Tîrêj | 206 |
| 44 | Silêman Azer | 211 |
| 45 | Şêrko Bedir – xan | 215 |
| 46 | Tengezarê Marînî | 222 |
| 47 | Xemgînê Remo | 225 |


Ji berhemên nivîskar :

1. Maçek ji dil ; helbest 1998
2. ( Al neşîd al azreq ) helbest 2000 bi zimanê Erebî



Li Kurdistana îraqê, heta berî serhildana pîroz a gelê me li buhara 1991ê ji bilî çend navekên navdar mîna Cigerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can...htd, pirr kêm nivîskarên Kurd ên Sûryayê dihatin nas kirin. Lê piştî serhildanê û ji encama wê azadiya gelê me pê şabûyî, gelek navên nû ji perçeyên dî ên Kurdistanê bi riya navgînên ragehandinê hatin nas kirin û efrandinên wan jî çap û belav kirin.

Weşanxaneya Spîrêz bi weşandina vê antolojiyê pêxweşe (46) helbestvanên Kurd ên Sûryayê ji temen, serbor û şêwazên cuda cuda pêşkêşî xwendevanan bike bi hêviya ku rojekê bikare antolojiyeke seranserî a helbesta Kurdî biweşîne.

*Mueyed Teyib*

www.spirez.com Spirez Press & Publisher Kurdistan-Duhok

Qaba paşî